

**K.T.**  
**ZANÎNGEHA YÜZÜNCÜ YILÊ**  
**ENSTÎTUYA ZÎMANÊN ZINDÎ**  
**ŞAXA MAKEZANISTA ZÎMAN û ÇANDA KURDÎ**

**TezaLîsansaBilind**



**"Evîn û hezkirina jinê di Helbestên Mistefa Begê Kurdî da"**

**HONAR OMAR AHMED**

**15950001073**

**Şêwirmend**

**PROF.DR. HASAN ÇİÇEK**

**WAN 2017**

T.C.  
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ  
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi



"Mustafa Begê Kurdilimn Şiirlerinde Kadın Ve Aşk"

HONAR OMAR AHMED

15950001073

Danışman

PROF.DR. HASAN ÇİÇEK

VAN 2017

**T.C.  
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ  
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**YüksekLisansTezi**

**"Evîn û hezkirina jinê di Helbestên Mistefa Begê Kurdî da"**

**HONAR OMAR AHMED**

**15950001073**

**VAN 2017**

## NAVEROK

KURTEK:.....	IV
ÖZET .....	V
ABSTRACT .....	VI
SPASÎ:.....	VII
PÊŞKEŞÎ KIRIN: .....	VIII
PÊŞGOTIN: .....	IX
DESTPÊK .....	XI
1 JIYAN Û SERDEMA MISTEFA BEGÊ KURDÎ, BITAYBET REWŞA JIN Û EVÎN Û HESKIRINA .....	1
1.1 JIYANA MISTEFA BEGÊ KURDÎ: .....	1
1.1.1 <i>Nasnavê Mistefa Beg:</i> .....	3
1.1.2 <i>Rewşenbîriya Mistefa Begê Kurdî:</i> .....	4
1.1.3 <i>Xwandina Mistefa Begê kurdî :</i> .....	8
1.1.4 <i>Zimanzaniya Mistefa Begê kurdî:</i> .....	9
1.2 PÊGEHA JIN DI CIVAKA KURDÎ DE.....	10
1.2.1 <i>Civak:</i> .....	10
1.2.2 <i>Pêgeha jin di civakê de:</i> .....	10
1.2.3 <i>Pêgeha jin di civaka kurdî de:</i> .....	15
1.2.4 <i>Jina kurd bi rojhilatnasan ango oryantâlîst ve:</i> .....	18
1.3 NÊRÎNÊN CIVAKA KURD BO EVÎN Û HESKIRINA DI NAVBERA HER DU CINSAN DE.....	21
1.3.1 <i>Heskirin:</i> .....	21
1.3.2 <i>Di civaka kurd de evîn û heskirina di navbera herdu cinsan de :</i> .....	23
1.3.3 <i>Lênêrîna civak kurd bo evîn û heskirina di navbera herdû cinsan de :</i> ....	26
2 DÎROKA HELBESTÊN KURDÎ DETA DEMA MISTEFA BEGÊ KURDÎ , PIŞTRE EVÎN Û HESKIRINA JIN Û RENGDANA WÊ YA DI HELBESTÊN DE. ....	31
2.1 HELBESTÊN BERÎ MISTEFA BEGÊ KURDÎ:.....	31
2.1.1 <i>Helbest çiyê? :</i> .....	31
2.1.2 <i>Helbesta kurdî:</i> .....	33
2.1.3 <i>Lehce û awayên zimanê kurdî:</i> .....	35
2.1.4 <i>Destpêka qonaxên helbestê:</i> .....	35
2.2 HELBESTÊN SERDEMA MISTEFA BEGÊ KURDÎ DE: .....	45
2.2.1 <i>klasîk li ser rêya zarava ango lehce ve:</i> .....	45
2.2.2 <i>klasîka Ewropa :</i> .....	46
2.2.3 <i>Klasîka kurdî :</i> .....	48
2.2.4 <i>Mistefa begê Kurdî ji aliyê helbestvanên serdema xwe û yên pişt xwe:.</i> 55	

2.2.5	<i>Name helbestên navbera Mistefa begê kurdî û helbestvanan:</i> .....	60
2.3	EVÎN Û HESKIRINA JIN DI HELBESTÊN MISTEFA BEGÊ KURDÎ DE: .....	63
2.3.1	<i>Evîn, heskirin û xweşikiya ji di helbestên helbestvanan de:</i> .....	63
2.3.2	<i>Evîndarî û xweşikiya jin di helbestên Mistefa Begê kurdî de:</i> .....	69
3HUNERÊN HELBESTÎ Û AWAYÊ BIKARANÎNA WAN LI GEL MISTEFA BEGÊ KURDÎ ...		88
3.1	ÇEMKÊ DÛRBÛNÊ Û RENGANA WÊ DI HELBESTÊN MISTEFA BEGÊ KURDÎ DE .....	88
3.1.1	<i>Têgeha dûrbûnê:</i> .....	88
3.1.2	<i>Rengana dûrbûnê di helbestên helbestvanan de:</i> .....	89
3.1.3	<i>Dûrbûn û renganeyê wê di helbestên Mistefa Begê Kurdî de:</i> .....	92
3.1.4	<i>Helbestvanên û Dûrbûna ji niştiman:</i> .....	99
3.1.5	<i>Mistefa Beg û dûrbûna niştiman:</i> .....	100
3.2	ZIMANÊ HELBESTÎ YÊ MISTEFA BEGÊ KURDÎ.....	105
3.2.1	<i>Zimanê helbestî:</i> .....	105
3.2.2	<i>Zimanê helbestî yê Mistefa Begê Kurdî:</i> .....	110
3.2.3	<i>Taybetmendiyan zimanê helbestî yê Mistefa Begê Kurdî:</i> .....	111
3.3	REWANBÊJÎ DI HELBESTÊN MISTEFA BEGÊ KURDÎ DE .....	118
3.3.1	<i>Rewanbêjî:</i> .....	118
3.3.2	<i>Rêgez dîtin:</i> .....	119
3.3.3	<i>Teqez kirin:</i> .....	124
3.3.4	<i>Dijî yek:</i> .....	126
3.3.5	<i>Lêk dan:</i> .....	127
3.3.6	<i>Melemme:</i> .....	131
ENCAM: .....		133
ÇAVKANÎ.....		135

## Kurtek:

helbest aliyeye wêjeyî yê girîng ê hemû Cîhanê ye, vê jî wisa kiriye ku em bikarin lêkolîneke kûr û bi hêz encam bidin, ku lêkolîna me bi nave (hezkirina jin li gel Mistefa begê Kurdî ) ye ku Mistefa beg helbestvanekî berçav yê helbestên klasîkê Kurdî ye, bi şêwaza zaravaya kurmanciya jêr nivîsandiye, di navbera salên( 1782-1859 ) jîyan kiriye. Me ev lêkolîn bi şêweyeye teorî û rawe kirin û wesfî derxist aşkarebunê ku li gel behskirina jîyan û serdema helbestvan, herwaha aliyên cuda yên di nava helbestên wî û weke rewanbêjî û zimanê helbestî û kevintir jî me li ser helbestên Kurdî şîrove kirine. Bi şêweyekî gîştî û li pêş Mistefa begê Kurdî bi taybet di şêweyên cuda ku pêştir jî lêkolîneke girîng û berçav a van helbestvanan hebûye, ji bo pêşketin helbest û wêjeya Kurdî xizmeteke berçav kiriye, ji ber ku dervey lehceyê kurmanciya jêr şêwazên (Lorî û Goranî û kurmanciya jor )nivîsandiye, lêkolîna me ya sereke heskirina jin buye ji aliyê helbestvanê mezin Mistefa beg ve buye, behsa rewşa jin ji me re kiriye û me tîşk xiste ser heskirin û nêrîna civakê ji bo heskirina di nav bera herdû cinsan de. Ji ber wî jî me girîng zanî ku behsa wan aliyana bikin û me li ser helbestên Kurdî ya di serdema van helbestvanan de kiriye, ji ber ku wî helbestên xwe di serdema wî helbestvanî de bi şêwazekî kurmanciya jêrîn nivîsandiye û ber bi pêşve çû û heta astekî giring ket pêşiya lehceyên din. Helbestên wî berî her tiştên din dinava çînên civakê de cihê xwe çê dîke û di nava civaka kurdî de jî ev bi ronî tê dîtin, helbestên wî bandoreke xweya sereke hebûye di asta pêşveçûna rewşenbîriya civakê de û çemka me ya derunî dinava helbestên xwe de aşkere kir ku ev helbestvana evîneke wî ya bê hempa hebûye di dûrbun û cudahiya li heskirinê de wisa dîke ew evîne zindî bimîne û bibe xwarin ji bo rihê mirov û ev helbestvana li walat dûr jîyan kiriye lewma aliyên dûrbûnê ew bandora xwe li ser wî bi xwe û helbestên wî jî hebûye û ev mijara dibe hêvinê gelek helbestên wî.

## ÖZET

Şiir tüm dünya edebiyatına hayat veren en önemli edebiyat dallarından biridir. Bundan dolayı da bu konuda araştırma yapmamız için gerekli olan güç ve önem ortaya çıktığı gibi, araştırmamız (Mistefa Begê Kurdî'nin kadına karşı olan sevgisi ve ilgisi) adı ile yapılmıştır. Mistefa Beg oldukça önemli bir şair olduğu gibi, klasik Kürt şiirinin aşağı Kurmancca lehçesinin en önemli simalarındandır. (1782-1859 ) yılları arasında yaşamıştır. Biz bu araştırmada hem teorik, hem analiz ve gerekli izah ve analizlerle ortaya çıkardık ki şairin şiirlerin de derin bir vasıf ve methetme vardır. Ayrıca şairin yaşam ve yaşadığı döneme dair bir çok yön şiirlerine yansımış ve Kurdî'nin şiir dili olarak da gerekli birçok analiz yapılmıştır. Genel anlamda ve özellikle Mistefa Begê Kurdî'ye ilişkin farklı biçimlerde önemli araştırmalar bu şairlere ilişkin yapılmıştır, şiirin gelişimi ve Kürt edebiyatına ilişkin önemli katkı ve hizmetler de bulunmuştur. Çünkü aşağı Kurmanccanın dışında da (Lorca, Goranice ve Kurmanci) şiirleri önemli etkiler yaratmıştır. Önemli konu başlıklarımızdan biri de Mistefa Begê Kurdî'nin Kadın sevgisidir. Kendi kadın sevgisini ve kadının durumunu şiirlerine konu etmiş ve biz de onun kadın sevgisini elden geldiğince işlemeye ve toplumsal bakış açısının karşı cinslerin aşk ve ilişkilerine ilişkin olan bakışını da araştırmamızda yansıtmaya çalıştık. Bundan dolayı da bu konuları işlemeyi gerekli gördük ve Kurdî'nin şiirlerindeki yansımalarını ve ayrıca diğer şairlerin şiirlerindeki etki ve yansımalarını ele almaya çalıştık. Çünkü aşağı Kurmancca yazılan şiirlerin diline de yansımıştır. Şiirlerini aşağı Kurmancca yazdığı gibi önemli bir gelişim ve dile de katkı da bulunmuş ve bu anlamda diğer lehçeleri de aşan bir gelişim seyrî içerisine girmiştir. Şiirleri tüm toplumsal kesimler içerisinde yer edinmiş ve Kürt toplumunda oldukça açık ve sade yazılan şiirleri önemli etkiler de bulunmuştur. Ayrıca toplumsal aydınlanmada da önemli rol oynamıştır. Şairin eşsiz bir sevdası ve kendi sevdiğinde ayrı ve uzak olması o sevgisinin sürekli canlı ve ruhunun gıdası olmasını beraberinde getirmiştir. Şair ülkesinden uzak yaşamıştır ve sevdiğinden uzak olması kendisini oldukça etkilemiş ve bu konu şiirlerinin esas mayası olmuştur.

## **Abstract**

Poetry is an important literary genre in world's literature. This has lead us to be able to make a precise and professional study which is entitled 'The love in Mustafa Bagi kurdi poetry' . Mustafa Bag was a classic Kurdish poet who used Kurmanji Khwaru dialect in his poetry .He lived between ( 1782-1859). It is a ( theoretical , analytical , descriptive) study. It sheds the light on the biography , the life time of the poet and different aspects of his poetry such as (rhetoric of his poetic language).then we discussed Kurdish poetry before Mustafa Bag, particularly the different dialects of Kurdish language that played a key role in growing Kurdish poetry and literature, that is due to the role of other dialects like ( Luri , Goran , Kurmanji khwar).The study also concentrates on " Kurdish and European classism". So the main aim is to indicate (Love in Mustafa Bags Poetry), thus we focus on the condition of woman in his time. It also shows the viewpoint of the society for woman at that time, it is worth mentioning that Kurdish society in the past didn't see love as a normal case. It also presents clearly the Kurdish poetry at the lifetime of Mustafa Bag because Kurdish poetry started with Kurmanji Khwaru dialect then grow and developed rapidly more than other dialects. It is absolutely clear that Poetry emerges through the various classes of the society more than anything else. So this can be seen easily in Kurdish society that poetry played an important role in the field of social awareness. We elucidated the concept of (distance) in Mustafa Bags poetry,(distance and separation ) makes love to stay alive and become the food for man's spirit.The poet lived far from home.(homesick and distance) clearly reflected in his poetry , they become the inspiration of some of his pomes.



## **Spasî:**

Spasî û pêzanînên min bo hevjiîna min a xoşewîst re hene ji ber alîkarê min ê serekî bûye.

Spasî û pêzanînên min ê taybet bo(Bab û Daya) xo dikem

Spasî û pêzanînên min bo serpereştê birêz (P. Î. D. Hesên Çîçek) hene.

Spasî û pêzanînên min ê taybet bo rêzdarên( Dr. Ferhad Qadir ) û ( Dr. Naz ehmed) û ( M. Hejar Feqê Silêman ) heye ku alîkar û rênîşanderên min bûn di vê lêkolînê de.

Spasî û pêzanînên min bo pirtûkxaneya (Zankoya Silêmaniyê, zankoya Germiyan, fakûlteya zanistên mirovî ya Xaniqînê , pirtûkxaneya giştî ya Kellarê) hene.

Spasî û Pêzanînê min ên taybet heye bo (navenda çalakî ya ciwanên Kellarê) û xebatkarên wên ên birêz ku hemû her derfetek bo min ava kirin.

Spasî û pêzanînên min bo dost û hevalên min hene ji ber gelek çavkanî û zanyarî derbarê lêkolînê de dan min û ez dewlemend kirim.

**HONAR OMAR AHMED**

**2017**

## **Pêşkeşî kirin:**

Pêşkeşe

- hevjîna min a xoşewîst (Şehla xan)
- Bab û Daya û Bira û Xuşkên re
- wan kesên ku heskirina wan li hember xwandin û lêkolînên cuda heye
- ji xwandevanan û mamostayên hemû qonaxên xwandinê re.
- serokê beş û serpereştyar û xwandevanên zankoya Yuzincî Yilê re.

## **Pêşgotin:**

Helbest yek ji rêgezên giring ên wêjeyê ye, sedemê helbijartina min a vê babetê, ji ber vê yekê ye ku, heta naha bi vê navnîşanê ti lêkolînek nehatiya pêkanîn û herwaha Mistefa Beg helbestvanek hinekê li teniştê maye di nav nivîskar û lêkolînvanan li gor helbestvanên din ên serdema wî pir zêde nirxeke wisa nedane wî, herwaha ji ber damezrandina dibistanek helbestê bûye û gelek kes li dû xwe hiştine ye. Ji ber vê jî min di cih de dît ku lêkolînek waha pêkbînim.

Sînorê lêkolîna ku me pêkaniye di çarçoveya helbestên klasîk ên kurdî de ye, bi taybetî ew helbestvanên ku bi zimanê kurdî nivîsandine, wî helbestvanî jî helbestên xwe yên farisî hene lê em sînorê helbestên kurdî derneketine, ji ber ku şarazayiya me di derbarê zimanê farisî de kême.

Armanca lêkolînê pêktê ji hêza helbestê ya Mistefa Beg bi taybet ew helbestên wî yên ku jinê nivîsandine ye. Ji ber ew helbestvan dervey ku li teniştê maye hin tomet jî li ser hatine pêşxistin ku xwedê girawî heskirina wî li hember hemcinsê xwe hebûye. Armanca me jî ew e ku em evîndarî û heskirina Mistefa Beg a li hember jinê destnîşan bikin.

### **Rêbazê Lêkolînê**

Pirsgirêkên lêkolînê ew bû ku ev lêkolîna me jî wek hemû lêkolînên din bê pirsgirêk nebûye, bi taybet ji aliyê çavkanî li ser vê helbestvan û nebûna şarazayî li hember zimanê erebî û farisî, bi taybet jî zimanê farisî ku helbestvan gelek helbest bi wî zimanî nivîsandine.

Bernameya lêkolînê ku pêkhatiye di bin navnîşan (Evîn û heskirina jin li gel Mistefa Begê Kurdî) ye ku pêkhatiye ji pêşekî û pêşgotin û sê beş û encam û kurteyê û herî dawiyê jî ji çavkaniyan.

Di beşa yekem de me behsa aliyên teorî kiriye û me ew jî dabeş kiriye li ser sê serewanan.

Serewana yekem pêkhatiye ji aliyên jîyan û serdema Mistefa Begê kurdî ku me behsa jiyana taybet a helbestvan û aliyên rewşenbîrî û ziman zaniya wî kiriye.

Serewana duyem de me behsa pêgeha jinê kiriye di civaka kurd de, ku herwaha me tîşk xistiye ser rewşa jin di serdema berê de û herwaha jina kurd, li gel nêrîna rojhilat nasan a jina kurd kiriye.

Di serewana sêyem de me behsa nêrîna kurd kiriye, li hember evîn û heskirina di navbera her du cinsan de ku pêname û çemkê evîndariyê me ronî kiriye û behsa evîn û heskirina her du cinsan di civaka kurd de me aniye ziman.

Beşa duyem jî ji sê serewanan pêkhatiyê ku bi awayekê wesf û pêname û rawekirin me li ser kiriye û li gel helbestên kurdî di serdemên berê de, ku çend qonaxekin di helbestên (folklore, Goran, Kurmanciya jorîn û Kurmanciya jêrîn) de û me behsa hin helbestanên berî Mistefa Beg helbest nivîsandine kiriye.

Serewana duyem de me behsa helbestên klasîk ên kurdî di serdema Mistefa Begê kurdî de kiriye, li gel çemk û pênameya klasîk û klasîkên Ewropa û klasîkên kurd û çend helbestvanekî di serdema Mistefa Beg û herwaha behsa bandor Mistefa Beg a li ser helbestvanan me kiriye û behsa nameyên bi awayê helbestî yên helbestvan me anîne ziman. Li gel her du helbestvanên mezin (Nalî û Salim) wek sê kuçên Baban hatine nasîn, ji ber bi hev re jî nêzîkin, hem ji aliyê temen ve, hem jî li gelek aliyan ve li gel yek kar kirine li ser wê dibistana helbestî û herwaha hevaltî û xizmet kirin di navbera wan de hebûye.

Serewana sêyem de me behsa evîndariya jinê ya li gel Mistefa Begê Kurdî kiriye, ku behsa evîndariya jinê me kiriye, li gel helbestanên û çend helbestvanên wek nimûne me anîne ziman û behsa evîndariya Mistefa Beg a ji bo jinê me behs kiriye û wek nimûne jî hin helbestên wî me bi serde anîne û bi awayê wesfî û rawekirin me ev mijar jî ronî kiriye.

Beşa sêyem pêkhatiyê ji sê serewanan ku bi awayê pratîkî me kar li ser kiriye

Serewana yekem de me behsa çemkê dûrbûnê û rengdana wê di helbestên Mistefa Begê Kurdî de li gel pêname û çemkê dûrî û herwaha me ev babete li gel helbestvanan û çend helbestvanan wek nimûne behs kiriye û li gel helbestvanan bi rawe kirin me aniye ziman.

Serewana duyem de behsa zimanê helbestî yê Mistefa Beg me kiriye ku, bi awayeke giştî me behsa zimanê helbestê, behsa bikaranîna zimanê helbestê li gel helbestvan kiriye.

Serewana sêyem de me behsa rewanbêjiyê kiriye ku di helbestên Mistefa Begê kurdî de, pênameya rewanbêjiyê me kiriye, li gel beyan kirina çend aliyên rewanbêjî

## Destpêk

Helbest dewlemendiyêke netewî û xirmaneke teji li gewher û bi nirx bo nasnameya wêjeya hemû gelekê ye, helbest dîroka xwe ya kevin heye, her ji demeke kevin ve wek baskeke wêjeyê hatiye nasîn, di wêjeya klasîk a kurdî de helbest cîh, pêgeh û giringiya xwe heye, ku wêjeya klasîk a kurdî wek helbestê hatiye nasîn, ev rêbaze ji gelek qonax û serdemanre derbas bûye û her qonax û serdemek jî taybetmendiyan xwe hene û her serdemekê çend helbestvaneke bi navûbang tê de derketine bi taybet helbestên klasîk ên kurmanciya jêrîn (Dibistana helbestvaniya Kurmanciya jêrîn) bi sê helbestvanên mezin hatiye nasîn (Nalî, Salim û Kurdî) damezrênerên wê dibistanê bûn û ew bûn pêşengê vê rêbazê, gelek helbestvanên mezin jî ew rêbaz dan berxwe û bûn sembola helbestên kurdî. Mistefa Begê Kurdî ku yek ji wan kesan bûye ku damezrênerê dibistana helbestên Kurmanciya jêrîne û dengeke diyar ê nav helbest û wêjeya klasîk a kurdî ye, ev helbestvane helbestên cuda cuda nivîsandiye û cîhê nirx û giringî danê bûye bo min ku ew helbestên bo jin û evîndara xwe ya jin nivîsandiye ku gelek beyt helbestên xweşik bi berhem aniye. Dervey vê yekê jî Mistefa Beg kesek rewşenbîr û xwandevan û di helbestên xwe de zimanzaneke sade û ronî bikaraniye, ku di nav helbestvan û lêkolînvanan de wek (helbestvan û evîndar) yan jî (rêberê leşkerê xem) hatiye nasîn, ji ber pir evîndar û xemgîn buye, vê yekê di nav helbestên wî de reng daye.



# 1 JIYAN Ê SERDEMA MISTEFA BEGÊ KURDÎ, BITAYBET REWŞA JIN Ê EVÎN Ê HESKIRINA

## 1.1 Jiyana Mistefa Begê kurdî:

Mistefa Begê kurdî wek piranî helbestvanên kurd zanyarî di derbarê jiyana wî de pir kêr e. Eger em bixwazin dem û cîhê li dayîkbûna piranî helbestvanên klasîk diyar bikin, ev yek pir zihmete em bikarin bi hûrgilî û bi piştrastî destnîşan bikin. Ji ber piraniya helbestvanên klasîk ji ber kevinbûna dîrokî û nebûna navendeke tomarkirina zanyariyan û gelek sedemên din, dem û cîhê li dayîkbûna helbestvan û navdaran bi piştrastî nayê zanîn û nivîskar û lêkolînan bi awayekî cuda behsa dem û cîhê li dayîkbûna Mistefa Beg dikin. Helbestvan bixwe jî dervey vê pirsgerêkê nîne, nivîskar û lêkolînan li ser dem û cîhê dayîkbûna wî xwedî nêrînên cuda ne.

Marif Xeznedar di dîroka wêjeya kurdî de bi vî awayî behsa nasandin, sal û cîhê dayîkbûna Mistefa Beg kiriye: ((Mistefa Beg kurê Mehmûd begê kurê Ehmed begê Sahêbqirane ye, kurmamê Evdurehman Begê Salimî helbestvane. Di sala 1812ê li Silêmaniyê li dayîkbûye)) (Marf , 2010 C, R. 215).

Di dîwana kurdî de, (Mihemed Mistefa- Hemebor) bi vî awayî behsa li dayîkbûna wî dike ku di helbestekê de Mehmûd Begê bavê Mistefa Beg ve vergirtiye, ku ji bi boneya li dayîkbûna Mistefa yê kurê wî yê mezin ve daniye, û Hemebor bi vî awayî lêkdaye: -(( Di roja 11ê ya sêşemê meha Muharemê de(Payîzê) sala 1197ê ya koçî de (Mistefayê kurê wî li dayîkbû). Ku dike roja sêşema 17ê kanûna yekem a 1782)) (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 17).

Berevajî nêrîna wan her du nivîskarane (Elaeddîn Seccadî) nivîskarê mezin ê kurd, cuda li Marif Xeznedar û Hemebor bi vî awayî behsa dem û cîhê dayîkbûna Mistefa Beg dike û dibêje: ((Di sala 1809ê ya Mîladî li bajarê Silêmaniyê hatiye dine)) (Elaeddîn, 1395, R. 322).

Heta naha jî zelal nebûye ku ev helbestvane û piranî helbestvanên kevin derbarê wan de kîjan çavkanî û kîjan zanyarî raste.

Wek çawa helbestvanên serdema kevin sala li dayîkbûna wan bi temamî nayê zanîn û mirina wan bi temamî nayê zanîn, her lêkolînavan û nivîskarek jî behsa mirina wan dikin, Marif Xeznedar jî di dîroka wêjeya kurdî de bi vî awayî behsa mirina Mistefa Beg dike: ((Jiyana helbestvan kurt bûye, nexwaşiya derûnî cerg û hinawên wî daveşand, bela û karesatên mîr nişînê ti tiştek bo nehêla, ev yek nabe serbilindî bi netewa xwe ve bike û nasnameya kurdî bo tomara berhemên helbestî helbijêrê. Kurdî di sala 1850 di serdema avabûna Mîr nişîna Baban a li Silêmaniyê de koça dawî kiriye û li girê Seywan bi axê hatiye sipartin)) (Marf , 2010 C, R. 215). Di helbesteke Hacî Qadirê Koyî de, dema mirina Mistefa Beg aşkera dike û dibêje:

*Navê Sahêbqiran navê taybet ê wî ye.*

*Ji ber li vî erdî hespê wî bedew e. (Serdar, R. 217).*

Mabesta wî Mistefa Beg e, ( Di vê helbestê de risteya “îsmê Sahibqiran xaêy ew e” bi kevneşopî û hesaba Ebcedî û bi rênûsa kevin û tîp û wuşeyên (Asimê Sahêbqiran xaêy ew e) dike 1276. Ev dîroka sala wî ya koçê ye ku jiyana xwe ji dest daye û ew sala koçî jî dike 1859ê zayînî) (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 25).

Mistefa Beg ser bi malbata (Sahêbqiran) bûye, ew binemale yek ji binemalên navdar ên serdema Mîr nişîna Baban bûne, gelek kesên jîr û jêhatî û rewşenbîr ji wê binemaleyê derketine ku hêvinê serbilindiya serdemê xwe û piştî xwe jî bûne ((Malbata Sahêbqiran ji (Ehmed Begê) mezin ve destpê dike, Ehmed Beg yek ji wan kesan bûye ku “danzde siwarên Merîwanê” ye ciwaneke baş û siwareke baş bûye, berê xwe dabe her qadekê topa hunerî derxistiye, berê xwe dabe her dijminekê şikandiye û ji ber vê jî navê wan bûye “Sahêbqiran- xwedî dur”)) (Elaeddîn, 1395, R. 320) .

Ev malbat hem ji aliyê siyasî ve hem ji aliyê wêjeyî ve xwedî roleke giring bûne, hem Ehmed, hem Mehmûd Beg di wê serdemê de di rêvebirin welat de xwedî rol û bandor bûne, (Ehmed Begê mezin Sahêbqiran pehlevaneke jîr û cengavereke wê malbatê ye, li bajarê Sine ya Kurdistana Îranê li ser daxwaza Silêman paşa, ku serdarê wê serdemê bû,



hatiye Qelaçolanê û piştire payeya bi nirxbûnêr jê re hate dayîn û piştire jî bû şewirmendê femandariyê, Ew Ehmed beg bapîrê mezin ê sahêbqiranên Iraqê ye, wek Ehmed begê mezin navûbangê derketiye, kesekî pir dihate heskirin bûye di nav xelkê de, ji ber pir dihate heskirin wek Ehan nav lê hatiye kirin, piştire çûye Hecê û wek Hecî Ehan bi navûbang bûye, helbest nivîsandine û nasnavê helbesta wî jî Şewqî bûye, dema bajarê Silêmaniyê ji aliyê Îbrahîm paşa ve di sala 1784ê de hatiye paytext hatiye veguhestin bo Silêmaniyê, Ehmed beg jî bi malbat ve hatiye Silêmaniyê û li wê deverê niştecih bûye, nêzîk awahiya xwe mizgevtêk ava kir û heta naha jî ew taxa û mizgevt bi Hecî Ehan hatiye bi nav kirin.) (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 14).

Mehmûd Beg bavê Mistefa beg e, di serdema xwe de xwedî bandoreke giring bûye, payeya birêve birinê di destê wî de bûye, ji ber kesek pir jîr û zîrek bûye, cîhê baweriya rayedaran bûye û bavê wî jî beşdarî hikûmeta wê demê bûye, ji ber vê jî derfetên baş bo derketin pêş ku bi asanî bikeve nav karûbarên welat de ((Mehmûd Beg wezîrê berevaniya paşatiyê Baban bûye)) (Marf , 2010 C, R. 18). Mehmûd Beg xwedî 5 kur bûye, ji wan jî Mistefa beg bûye, ku helbestvaneke mezin ê kurd e, ku xwedî bandoreke giringe di wêjeya kurdî de, binemala sahêbqiran gelek kesayetên navdar ji nav wan derketine û di helbest û wêjeya kurdî de jî xwe jê dûr ne girtiye, ku bûne bingehê helbestên klasîkên kurdî, wek (Mistefa Beg, Ebdulrehman Beg "Salim", Ehmed Begê Sahêbqiran "Hemdî", Salih Zekî Beg û xanima wî Wesman paşayê Caf "Adîle xan" bûye, ku dayîka "Tahir Begê Caf û Ehmed muxtarcaf " bûye) (Cemal , 2012, R. 88) . Ev kesayetên herî navûbang ên tîn naskirin ên vê malbatê ne.

### **1.1.1 Nasnavê Mistefa Beg:**

Ew helbestvanên ku helbest nivîsandine heta naha jî navê wan zindî ye di wêjeya kurdî de, em dikarin bibêjin hemûyan jî nasnavên xwe bixwe diyar kirine û piraniya wan xwedî du nasnav bûne, yan jî nasnavêk wan hebûye û piştire gohertine, di serdema xwe û serdema piştî xwe jî bi wan nasnavan ve hatine naskirin, piranî li gel her behsekê yan her beyteke helbestên wan amaje bi nasnavê wan hatiye kirin (Mistefa Beg) jî yek ji wan helbestvanan bûye ku di helbestên xwe de du nasnav bo xwe daniye, yek ji nasnavê wî (kurdî) bûye ku ew nasnave bi nasnavê herî bi navûbang bûye ji Mistefa Beg ((Li songeya

serbilindiya bi netew û niştimana xwe ve, nasnavê (kurdî) bo xwe helbijartiye)) (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 21).

Ev helbestvane kesek niştiman perwer û netewdost bûye, ji nasnameya xwe serbilind bûye û xemên netewa wî wek xemên xwe dîtiye, ji ber evîn û heskirina netewa xwe nasnavê (kurdî) bo xwe helbijartiye, di piraniya helbestên xwe de bi wê nasnavê navê xwe aniye. Helbestvanê wê serdemê ji ber tinebûnê û aloziya rewşa Kurdistanê zêdetir hestên netewî di wan de ava dibe.

Helbestvan nasnaveke din bo xwe daniye û di helbestên xwe de her carê yek ji wan bikartîna, li gor rewşa wê demê ku helbestên xwe tê de nivîsiye (( Hin helbestên kurdî bi nasnavê (Hîcrî) ve belav kiriye, bê guman ew nasnav li gel rewşa navxweyî ya derûniya helbestvan re hemahenge û dûr nîne ji nasnava wê serdemê ya jiyana Îranî li helbestên xwe de tomar kiribe, ji ber heyamek ji koçberî û malbendiyê dûr ji welat jiyana kiriye.)) (Marf , 2010 C, R. 217) . Ji ber vê jî nasnava duyem bixwe daniye ku Hîcrî ye, Mistefa Beg ew helbestên ku dervey Silêmaniyê û li dûr welat jiyana kiriye û wê demê nivîsiye di cîhê "Kurdî" de bi nasnavê (Hîcrî) ve vegotiye, ku di yek ji helbestên xwe de bi farisî nivîsiye û dibêje: (Kurdem û Kurdî texlê, hî certem û Hîcrî re budê) wate: Kurdim û Kurdî nasnavê min e û girêdayîme bi nasnavê Hîcrî bo xwe firand, piraniya helbestên farisî ku li derve nivîsiye bi navê Hîcrî ve nivîsiye û piraniya çavkanî û destnivîs û çapên wî jî bi nasnavê Hîcrî ve hatiye belav kirin. (Di serdema Mistefa Beg de çend helbestvaneke din hebûn ku nasnavê Hîcrî bo xwe diyar kiribûn (Seyîd Feyzullah Mukrî û Hacî Şêx Mihemed Emînê Kesnezan) bun) (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 22) .

### **1.1.2 Rewşenbîriya Mistefa Begê Kurdî:**

Rewşenbîr xwediyê sermayeke mezin ê merûf e û fikrên wî û ew ezmûnên rewşenbîrî yên dewlemend û bingehên fikrî yên heyî ve dikare bi rêya wan ve sermayeyeke remz û pêgeheke rewşenbîrî û civakî di nav civakê bi giştî û di navenda rewşenbîrî bi taybetî bo xwe ava bike, rewşenbîriya rasteqî xwedî asoyê dîtina kûr û hizreke mezin e, ku dikare diyardeyên cuda û bûyerên cuda yên di nav civakê de bixwîne û rawe bike û asta metirsî û hestên xwe yên bon aha û paşerojê ji gel re ragehîne, bingehê serekî yê rewşenbîriyê tenê zanayî û zanyarî nîne, ji ber bingehê exlaqî gelek girîng bo baweriyê û

bawerî bi rewşenbîr anînê, ji ber rewşenbîr nabe îxanetê li erk û wezîfeyên xwe yê rasteqîn bike, ku ew jî pêktên ji rastgotin û gotina rastiyan bi aşkeriyê û bê tirs.

Rewşenbîr ji wî kesî re tê gotin ku asta têgeheştin û nêrîna wî ya hemû aliyên civakê berfireh be, wek peyv jî eger em rawe bikin; rewş, roşin tê wateya ronahî yan jî berfirehî û avabûn, peyva bîr jî tê wateya fikir û heş, an jî agahiyên mêtî, her du peyv dem dibin yek rewşenbîrî jê derdikeve. Ew kesê ku rewşenbîre tê wê wateyê ku têgeheştî ye û nêrînên wî cudaye ji wan kesên ku ne rewşenbîrin, kesê rewşenbîr geşbîn û rê nîşan dide, hêza wî ya gohertina bîr û nêrînên kesên derdora xwe heye, xwandin û xwandiniyê di nav civat û civakê û mirov de pêşdixe û bi wî awayî kesê rewşenbîr civaka rewşenbîr ava dike. (Rewşenbîr wek kesayeteke nimûne, kesekî bi aşkerayî nêrînên xwe dibêje û xwedî ditînin taybetin û peyamên xwe ji kesên derdora xwe û guhdarên xwe re bi aşkerayî radigehîne, herwaha rewşenbîr kesên xwedî hunereke pêşketîne, çî bi gotin be, çî bi nivîsandin be ew hêza xwe ya rewşenbîrî digehînin û li gor rewşê bandorê ava dikin li ser kesên hember xwe.) (İdward , 2006, R. 31).

Netewa kurd di hemû serdeman de kesên rewşenbîr û xwedî ezmûnên cuda cuda jê derketine ku xizmeta civaka xwe kirine, netewa kurd jî wek hemû gelên din pêwîstiya xwe bi rewşenbîrên zêdetir bikarê wan ber bi pêş de bibe hebûye, ev jî bi qonax ber bi pêşde çûnê bi xwe re derdixe, rewşenbîrê kurd bi taybet li navçeya Silêmaniyê bi rêya xwandinê ve derketine (Kurd bi awayeke giştî û rûniştvanên navçeya Silêmaniyê bi taybetî mileteke hişyar, jîr û çalakin di ava kirina bajarê Silamaniyê ve di hucre ango şaneyên feqe, mela û mizgevtan ve destpê kiriye. Ji gelek goşeyan ve pêşde çûn û bi taybet ji aliyê rewşenbîrî ve, gelek mizgevt, fêrgeh û dibistan hebûn, hindêk ji wan di dema ava kirina bajarê Silêmaniyê de, hin ji wan jî berî ava kirina Silêmaniyê bingeh avêtine, wek "Dibistana mizgevt Ebdulrehman Paşa û Dibistana Mewlana Xalidê Neqîşbendî, Dibistana mizgevt miftî li Silêmaniyê, Dibistana melkendî, Dibistana Hecî Ehan" Ev mizgevt û dibistanên malbendên rewşenbîrî û zanistî yê pêşketîbûn, teji bûne ji kesên zana û şaraza û wêjevan û rewşenbîr, ku heryek ji wan çirayeke pêkevtî bûne û mamosta û zanayên bi navûbang ders li wan deveran dane ) (Cemal , 2012, R. 188).

**Hucre ango Şane:**

(Hucre (bi kurdî şane) peyveke erebî ye, wateya wê xanî ye, bixwe jî ew xaniye ku di nav mizgevtan de bûn e, wek dibistan bikaranîna zanista şerîetê tê de hatiye xwendin, tenê çavkaniya zanist û zanyarî û binkeyê perwerde kirina rewşenbîran û zanayan bûye.) (Seyd Mistefa, 1382, R. 30) . Li Kurdistanê ew cîh wek cîheke giring û pîroz çav lê hatiye kirin û giringiyeke wan ên zêde heye di gehandin û fêkirina xelkê di serdemên berê yên zanistinên cuda cuda de.

**Feqe:**

(Peyveke erebî ye, ji peyva feqye ve hatiye wateya wê ango zana ye. Pir têgeheştîye û zanabûna di şerîetê ola îslamî de dixwîne û ew qonaxa destpêkê ye bo çûna nav zanistên olî) (Seyd Mistefa, 1382, R. 30). Di wê qonaxê de yasa û rêyên ola pîroz ên îslamê fêkirin û fêrî nivîsandin û xwandinê dikirin, ji wê derê jî eger berdewam bikirbana wek çawa qonaxên na tê tamam kirin, wê serdemê jî bi heman awayî bûye û qonaxên din li dû yek hatiye.

**Mela:**

(Piştî xwandina feqetiyê ku eger serkeftî ba, bi pêkanîna ceribandinan ve ji aliyê mamostayeke ve moleta melatîyê jê re dihate dayîn, erkên mela ew e ku pêş nimêjiya mislimanan bike û gotar û dadwerî û fetwa û ders bide.) (Seyd Mistefa, 1382, R. 197).

Helbestvan û navdarên klasîk ên kurdî, di şaneyan mizgevtan de xwandine û hin ji wan wek feqe û mela, hin ji wan bes xwandin û nivîsê fêrbûne û dest lê berdane. Şaneyan mizgevtan wek dibistan hatiye bikaranîn, wê serdemê bingehê xwandinê şaneyên mizgevtan bûye, mamosta jî her mela bûne û xwande van jî feqebûn (Dibistan, kolej û zanko) jî her şaneyan mizgevtan bûn, berhemên wan şaneyane kesên zana û jêhatî bûn di warên cuda cuda de,

Helbestvanên kurd her li wê derê dest bi xwandinê kiriye, bi wî awayî asta zanist, zanyarî û rewşenbîriya wan pêşkêtiye hin ji wan bûne feqe, hin jî wan jî bûne mela û zana. (Yek ji wan helbestvanane ku li şaneyan mizgevtan ve dest bi xwandinê kiriye û asta rewşenbîriya wî pêşkêtiye jî "Mistefa Begê kurdî" bûye. Bo wê armancê jî nexwandiye ku

bibe mela, lê nirxeke mezin daye xwandina xwe û pir hêza zanistî ya felsefe û sofîzm û pir giringî daye xwendina xwe, ji bo wî pir giring nebûye ku bi mela, ji ber vê jî li ser zanista melatîyê pir kûrbûn li gel helbestvan giring nebûye) (Marf , 2010 C, R. 215) . Li navçeya Silêmaniyê aliyê rewşenbîriyê di asteke pêşketî de bû, ji ber dibistan û kesên şaraza hebûne (Aliyê rewşenbîrî û xwendinê di serdema Mistefa Begê kurdî de li gor wan çavkaniyên dîrokî pir bal li ser nehatiye kêşandin, aliyên ramanî û aboriya olî ve çend aliyeke din jî ronî dikin ku peyrewên wê serdemê hewlên temamî dane zanist û rewşenbîriyê û ber bi pêş de bibin û rêz li mela û zanayan girtiye, mizgevt û dibistan bo vê yekê hatine vekirin û mûçe jî wan hatiye dayîn û bi destê wan kesan ve bo zêdetir giringî bidin zanist û rewşenbîriyê, di demeke kêm de gelek kesên şaraza di aliyên cuda cuda de rewşenbîr derkevtin û yek ji wan jî Mistefa Begê kurdî bûye) (Cemal , 2012, R. 136).

Li başûrê Kurdistanê ji kevin de heta naha gelek kesayetên helbestvan û nivîskarên rewşenbîr ên bi navûbang derketine û di pêşde birina asta rewşenbîriya netewî ya başûrê Kurdistanê de xwedî bandoreke giring bûne, wek çavkaniyên dîrokî û wêjeyî jî vê rastiyê aşkera dikin û radixin berçav gelek helbestvanên mezin û rewşenbîrên bi navûbang li navçeya Silêmaniyê û derdora wê serî rakirine û wek malbendeke rewşenbîriyê bûye, wê serdemê ew helbestvanên derketine tenê rengdana wan bo serdema xwe nebûye, heman demê de çend sedsalek jî derbasbûye li ser serdema wan lê dîsa jî bandora wan heta naha jî maye, rewşenbîrî û zanyariyên wan gelek berfireh bûye, di zanist û zanyarî û rewşenbîriya giştî de kêm an zêde şaraza bûne (Mistefa Begê kurdî helbestvaneke bihêz û jêhatî û paye bilind bûye. Damezrînerê dibistaneke helbestî bûye, ku sedan xwandevan tê de xwandine, ew jî dibistana helbestî ya klasîkên kurdî bûye, ku Mistefa Beg jî yek ji damezrînerê wê dibistana ku çiraxaneyekî dîrokî ya wêjeya kurdî bûye, derûniya bi sedan helbestvanên tejjî bi coş û xiroş û evîn kiriye ku piştî bûne xwandevanên (kurdî) û dibistana wî, helbestên (kurdî) ragehandina hesteke pengirawî yên tejjî coş ên derûnî û rihetkirina derûnî ya tejjî li keyf û xweşiyê ya coşa dil de ye, ku ev heman hestên netewekê bûye, ev yek jî pejiwandina helbestên wî bûye ji aliyê xwandekarên wî ve û li gel xwandekarên wî ew helbestvaneke pir zîrek û bi wêrek bûye, berdewam li piyan bûye, çî bi helbestên xwe ve be, çî bi axaftinên xwe ve be kesek pir hişyar û dizanê biaxivê bûye, ev yek jî bûye sedem ku hêvinê serbilindiyê li gel xwandekarên xwe ) (Mhemed , Mistefa Begê Kurdî, 2013, RR. 6-22) .

### 1.1.3 Xwandina Mistefa Begê kurdî :

Mistefa Beg xwandiye û xwandina wî jî, ji du qonaxan re derbas bûye, Qonaxa yekem: (Mistefa Beg di temenê (4-5) salî de li bajarê Silêmaniyê xistine wan şane ango hucreyan, ew qas zîrek û jêhatî bûye di temenê xwe (8-9) saliyê de sê cuzeyên Qur'ana pîroz xwandiye û bê ku xelet bike bi dengeke balkêş û radikşîne Qur'an xwandiye û di xwandina xwe de li gel hevalên xwe yên bi wî re dixwandin pir jîr û zîrektir bûye û xwandina wî geheştiye, ji ber hêz û zîrekiya wî ya di xwendinê de di temenê xwe yê (14-15) salî de xwendina xwe de geheştiye payeyeke bilinda musteîdî.

Qonaxa duyem: Di vê qonaxê de Mistefa Beg bi mal ve diçin Kerkûkê, bavê wî musteîdî dadimezrîne, lê dest lê berdide û ew jî nikare li dibistana wî bixwîne û ji hevalên xwe dûrdikeve û sedeme din jî li Kerkûkê xwe bi koçber û kes nenas dizane, ji ber vê jî dest lê berdide) (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, RR. 18 - 20) . Her di wî temenê xwe de dest bi helbest danînê kiribû, li Kerkûkê tenê û bê xeber bûye, ji ber vê nekariye têkelî li gel kes bike û bi helbestê keyf û xemên nav dilê xwe daye derve, êdî hêdî hêdî dibe helbestvan, helbestvan ji ber rewşa ne rêkûpêk a navçeya Silêmaniyê welatê xwe dihêlin û koçberî bajarên din dibûn, Mistefa Beg jî yek ji wan kesan bûye û helbestvanan bûye ku Kurdistan hiştiye û çûye Îranê li wê derê maye, Şahê Îranê ji ber jêhatîbûna wî helbestvanî dizane û rêdike dû wî de, helbestvan ji ber zîrekî û jêhatîbûna xwe bala şahê Îranê dikşîne serxwe (Şahê Îranê Mistefa Beg ji ber zîrekî û jêhatîbûna wî dike endamê wêjevanê Îranê) (Mîr , 2009, R. 113).

Ewqas zîrek û jêhatî bûye ku li gel ewqas kesayet û zanayên bi navûbang ên Îranê jî, Şahê Îranê (Mistefa Beg helbijartiyê bo perwerde kirina zarokên wî, wek mamostayekê di nav koşka xwe de cîhekî taybet bo wî daniye) (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 34).Ew tê wê wateyê ku Mistefa Beg kesayeteke cudaye û xwedî hêzeke mezin bûye û rewşenbîreke temam bûye û ewqas Şahê Îranê bandor kiriye ku, ew jî bi wî awayî rêz li wî bigre û nîrx bide wî, li gel vê yekê di nav civaka kurdî de cîhê nîrx dayînê bû ji aliyê rewşenbîriyê ve, ji ber ((Ew civaka ku ew helbestvan tê de jiyan kiriye, civakekî nexwandevar bûye, kesên wek kurdî pir kêmbûne ku xwandevar bin û xwedî agahî bin.)) (Eta , 2006, R. 82) .

#### 1.1.4 Zimanzaniya Mistefa Begê kurdî:

Helbestvanên klasîk ên kurdî bi awayeke giştî bi zimanê kurdî helbest honandine, lê helbestvanên xwandevan bi çend zimanên din jî helbest nivîsiye, bi zimanê farisî û erebî û hindek jî bi tirkî, zimanê erebî û farisî li şaneyan mizgevtan ve fêrdibûn (Car car wa lê hatiye ku li gel wê jî ku li şaneyan xwandine namilke û pirtûkên kêr rûpel bi zimanê kurdî û erebî û farisî û tirkî yên derbarê dîrok û ol û wêjeyê de xwandine) (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 18) .

Zimanê erebî ji ber ku zimanê Qur'ana pîroz bûye û helbestvan jî piraniya wan li ser rêbaza îslamê bûne, ji ber vê jî fêrî zimanê erebî bûne, ayetên Qur'anê û fermûnde lêkdane, zimanê farisî jî zimanê xwandina wêjeya farisî bûye ku helbestvanên kurd helbestên xwe bi du zimanan nivîsandine, wêjeya farisî bandoreke zêde ya diyar hebûye li ser helbest û wêjeya kurdî de,

Hindek li helbestvanên bi armancên cor bi cor berê xwe dane navçeyên derdora Kurdistanê, bi taybet jî Stenbolê bi zimanê tirkî û helbest hatine nivîsandin û ji ber vê ,sedemê jî helbestên xwe di asta bendevariye zêdetir pêşketî bûne. Tiştên ku cîhê têr ramanê ye piraniya helbestvanên wê serdemê bi lehceya zimanê Hewramî helbest nivîsandine, çî xwandevan be çî jî xwandekar be, ji ber zimanê wê serdemê bû ku ew helbestvanên tê de jiyan kirine piştî hêdî hêdî pelê xwe avêtine bi awayeke zimanê dine.

Mistefa Begê kurdî dervey zimanê kurdî çend zimanên din jî zaniye û helbest wan zimanan jî nivîsiye, navdarê kurd (Şêx Mihemedê xal ) di lêkdaneyek dîwana Şêx Rizayê Talabanî de bi vî awayî behsa zimanzaniya kurdî kiriye. ((Di ziman û wêjeya farisî de pir şaraza bûye, di erebî û tirkî de jî baş bûye)) (Şêx Mhemedî , 2003, R. 123) . Herwaha bêdar şarazayî li gulzarî helbestvanên kurd bi heman awayî amaje bi zimanzaniya Mistefa Beg kiriye ((Şaraza bûye di zimanê erebî û farisî de)) (Bêdar , 2013, R. 11) Helbestvan dervey helbestên kurdî bi zimanê farisî û erebî helbest gotine. Belge jî li ser zimanzaniya ew helbestvanane heye ku li dû wan de mane:

Nimûneya helbestên erebî:

*Heger wek Îsa piştî mirinê li ser mere biborê  
tecemo el ezim el remih texînê beid el edem (Gîwî , 1387, R. 3).*

Helbestvanên dibistana helbestên Baban di bin bandora wêjeya farisî de bûne û li gel wê yekê jî zimanê farisî zanîne û bi jêhatiya xwe ve di nav helbestên xwe de helbestvanên wê demê peyvên farisî bikaranîne ((Ji ber asta bilindbûna asta rewşenbîrî û bilindbûna payeya helbestvaniya xwe derbixin pêş, piştî peyvên farisî, erebî û pir kêr û nenas û neqoliyan de geriyane ku têkelî helbestên xwe bikin. Di demekî ku pir peyv wek kurdî xwedî nirx bûne li ser zimanê xelkê asayî de)) (Newşîrwan , 2012, R. 461). Mistefa Beg jî zimanê farisî zaniye hin çaran peyvên farisî têkel bi helbestên xwe kirine û li gel wê yekê jî bi zimanê farisî helbestên zêde nivîsîne, nimûneya helbesta farisî:

*Êy zêşîgûşê têhê cehanê ser şur  
Ve zênavayê tu alêmî mesrur (Gîwî , 1387, R. 69).*

## **1.2 Pêgeha jin di civaka kurdî de.**

### **1.2.1 Civak:**

Civak ji wê kombûna kesan re tê gotin ku di erdnîgariyêke sînordar de li gel yek dijîn û hemû civakek ji takekes ve destpê dibe û çend kesek dibin kombûnek û çend kom jî di derdora yek dibin civak û di nav bajar û gundan de li gel yek dijîn û wek zincîreyek bi yek ve girêdayî ne ((Civak pêktê ji wan mirovên ku pêkve dijîn û reftarên wan ji yek nêzîkin û çalakiyên wan ji ber çend mirovekê dibe sedem ku li gel yek peyvendiyan wan hebe, ev jî di xwe de tê wateyê ku wan hemû mirovane berjewendiyên wan ên hevbeş li gel yek hene.)) (Knîr & `Zîz, R. 19).

### **1.2.2 Pêgeha jin di civakê de:**

Jin nîvê civakê ye û dayîka nîvê dine, bingehê ava bûna civakêye, her di destpêka avabûna mirovatîyê ve heta serdemê naha jî jin sembola xweşikî û tam û heskirinê ye, dil û derûniya jin kangaya soz û mêhrebaniyê ye (jin çavkaniya jiyana û ava kirinê ye, jin leşkerê wînda yê jiyana mirovahiyê ye, di ti qonax û serdemekê de awûrekî wisa lê



nehatiye kirin, ku li gor nixê wê yê çerxa zêrîn a jinê bê û rêza ku mafê wê ye lê nehatiye girtin ku wî nixê û bahayan heq dike) (Sozan , 2002, R. 5).

Her jin bûye ku kariye takekes bi awayê civakî rêkbixe û piştire jî civakê ji wan takekesan ava bike (jin hebûneke bi bandore û pêgeheke giringe di nav bingehê civakê de û bingehê her civakekê jî jin e, zilam bê jin nîv e, bi nîv jî civak ava nabe û komnabe, tomarên dîrokê wê rastiye nîşan didin ku jin mijareke giring û çalakiyên civakê ne û mil bi milê zilam roleke mezin lîstine di pêşxistin û bi bingeh kirina civakê li hemû cîhanê de, jinan beşdarî li hemû çalakiyên cuda cuda yê jiyane kirine û alîkariya zilaman kirine, di kar û pişê û cora bi corayan karîne bi zilaman bidin pejirandin ku, ew jî ji zilam kêmtir nînin û hêz û bandora wan ji pir aliyên cuda cuda de pir zêde ye) (Awring , 2008, R. 5).

Jin di civakên destpêkê de birêve birina civakê di bin destê wan de bû û bi awayek hemû civak li gor daxwazên jinan birêve diçû, jin hukmê temamî di destê wan de bû (Jin di civakên destpêkê de rêberiya civakê kirine, pêxistina jiyane û bi berhemanîna aboriya civakê di dest jin de bû, hemû hewldaneke wan bo hebûna jiyane bû, pişeya karkeriyê anîn ser rûyê cîhanê, her jin bûn ku bingehê awayê jiyana destpêkê pêkanîn, di wê serdemê de jinan bi jêhatiya xwe keresteyên destpêkê bi hewl û westandina xwe ve bi dest anîn, herwaha pişesazî destê wan ve serî rakir, ji hemûyê giringtir bingehê zanistinên wek jiyanasiyê, kîmya û dermansazî yê pêşdikevin û gelek bingehên giring ên din jinan piştî xwe bi ti aliyê fêrkeriyê girênedida, ji ber hemû di zîhna wan bixwe de hebûye) (Englis, 2008, RR. 125-126).

Di qonaxa destpêkê de ku mirov bi awayeke pir sade jiyana dikir, wekî ku mirov nasan vedigerin wê serdemê hemû karên giran ji aliyê jinan ve birêve diçû û her wan xwedîderketina herî jor dikir ku bi sîstema dayîksalarî tê pênase kirin, ji ber jin pêşeng bûye û her ji ber vê jî ew nav li jinê hatiye kirin (( Jin di kedî kirina sewalan de jî xwedî roleke giring dîtiye, ji ber vê jî jin pêşengê civakê bûne, wê demê di jiyana koçerî de jina payeya civakî û aborî ya hatî pejirandin bidestxistine û berî qonaxa niştêcîhbûnê de kiştûkal û zîreetê de jî xwedî bandoreke giring bûne, herwaha piraniya çanda kevin, xwedî kirina sewalan de serpereştê çawaniya bikaranîn û firotinê de jî pêşeng bûne)) (Mehabad, 2002, R. 35).

Payeya civakî û aborî de jin hêdî hêdî wek nema û dabezî bûne, ev jî herçend sedemek bû ( Di qonaxa niştêcîhbûna mirov de karê serekî yê mirov kiştûkal û zireet bûye, nirxê sewal xwedî kirinê li gel wê kêmtir bûye û jina karên sewal xwedî kirinê birêve dibirin û ji ber kêmbûna vê pîşeyê aboriya jin kêmbûye û berhemê kiştûkalyê zêdetir bûye û aboriya zilaman bilind bûye, hêza jinan a bedenê di çiyayan de hebû bo sewal xwedî kirinê, lê ew hêza wan tinebû di deştan de zilam hêza wan a wan karane zêdetir û hêdî hêdî desthilat veguhezî bo zilam û ji wê şûnde desthilatî ket dest zilaman û hêdî hêdî li ser hevjinên xwe desthilatiya xwe ferz kirin ) (Mehabad, 2002, R. 35).

Wergirtina desthilatiya birêvebirinê ji destê jinan ji aliyê zilam ve desthilatî berevajî bû û ji ber vê jî gohertina rewşa jinan a ji pêşengiyê bo bin destiyê derket holê. Jin berdewam wek sitem û zulim lê hatî kirin bûye, lê berê (qonaxa hevbeşî xêl û civakî de jin li gel zilam wekhev bûye û ew wekhevî jî hem civakê de tiştêkî asayî bûye, hem jî zilaman jî heman demê de li gel hatina xwarê ya payeya civakê ya jinê ve cudayiya cinsî ava bû, ku jin payeya wan a civakî ji ya zilaman kêmtir kir, êdî zilam pêwîstiya wan bi damezrandina xêzan bû, ew jî bi xwedanê wê zilam bû û jin jî bo xizmetkirina malbat, hevjin û zarokan ve ketin kuncê malê) (Englis, 2008, R. 63-64).

Herçend jin ji aliyê biyolojî û çêbûna xwe ve ti tiştêkî jinê ji yê zilam kêmtir nebe jî, lê wek dûvikê zilam lê hat, ji ber ew çand û ger û rêveçûna civakê û rewşa civakî û cudayiyên cinsî rewşa jinê gehande wê astê ku divê ji zilam kêmtir be û di bin ferman û hukmê zilam de be, ji wê dema ku keç ji dayîk dibe û mezin dibe, di bin ferman û hukma bav û bira û piştê jî hevjinê xwe de ye. Ew pirose veduguhêze bo hevjinê wê yê zilam ku wek mîras radestî wî tê kirin. ev sîstem wek bendeke heta hetayî ye bo jinan, her di dema ji dayîkbûna wê ve tilî lê tê dirêj kirin ku ew yek xetere û keçe, dibêjin keçe, zeîfe ye ango lewaze, nazike, bê desthilate, kêmbaqile...hwd. Gelek nav û tiştên ne rast û ne guncaw dixin teniştê ve û bo kêmkirina nirxê pîrozê jinê hertiştî dikin û bi vî rengî hêdî hêdî civakeke paşketî ava dibe((Civak çend pêngavekan ji hemû aliyan ve ber bi pêş ve biçe, ji n jî dikare zincîrên koletiyê rizgar bibe û xwe bavêje derve, ji ber babeta jinê peywendiyê girêdayîye bi civakê ve, ev yek jî tê wateya ku pêşketin û paşketina civakê girêdayîye bi pêşketin û paşketina jinê ve.)) (Sozan , 2002, R. 17).

Jin ne ew hebûn nîne ku metirsîdar be û ji azadiya wê û maf bi destxistina wê bitirsî û dest dayne ser payeya zilam, jin heta wê astê jî kêr û bê nirx nîne ku bi awayeke xirab ji aliyekê re bê dayîn. Jin tiştêkî xwezayî ye, jinbûn nabe kot û benda civakî û ji nirxên mirovî kêmbûn nîne, jinbûn nabe rêgir li giringî û rola jin di civakê de, ji aliyê civakî ve û rewşên bîrî ve ti bahaneyek nîne ku jin ji civaka mirovahiyê ve bikeve derve, lê çend merceke dîrokî û biyolojîk bûne sedem ku jin ji civakê bikeve goşeyekê û bandor û giringiya xwe li gor serdeman jî gohertin tê de pêkhatine.

Di hin civakan de yan jî di piraniya civakan de jin xwedî çend rolekî serekiye û xwezaya diparêze, lê divê tenê di çarçoveya jinbûna xwe dernekeve û li gor wê rola xwe ew jî (zarok anîn û xwedî kirin û karûbarên mal û xizmetkirina zilam ji aliyê pêdivî û cinsî ve ye) ev yek jî rol û bandor û giringiya wê kêr dike, ji payeya civakî, siyasî, rewşên bîrî û gelek aliyên din ve dûr dixê, ji civaka mirovahiyê ji jin re hin merc û sînorên civakî hatine danîn (yek ji xeletiyên diyar û tewana mezin a derbarê jin de tê kirin sînordar kirina hêza wê û para wê ye, heyf û mixabine ku jin ji mezinbûn û nirxên cuda cuda bê kêmkirin) (Sozan C. , R. 9).

Hin ji hizrên paşketî hene ku di civakê de xwedêgirawî zilam mezine û wek nîmetekê ye, lê nizanin zilam bê piştevaniya jinê ti tiştêkî nikare bike û ji jinê çêbûye û ew kesên waha wan gotinan bê belge dibêjin (hejmara zilamên wek nîmet di dîroka mirovahiyê de, ji hejmara jinên wek nîmet zêdetire, lê ew kesên ku xwediyê wê hizrê ne nayê zimanê wan vê rastiyê bibêjin ku piraniya dem, erk û dahênan û xulqandina nîmetê eger çavkaniya wê ne jin be ew yek pêknayê û bê guman bi piştevaniya jina bi nîmetbûn bidest hatiye, ev yek ji bîra wan çûye ku her nîmetek bixwe, bi nîmetir û mezintir par girêdayî jinekê ve hatiye cihanê û di himbêza jinekê de mezin bûye û jinê ew fêrî ziman kiriye, jinê ew perwerde kiriye, êdî her bila bibêjin hejmara nîmetên zilam zêdetir e) (Sozan C. , R. 10).

Dema ku ew kesane înkara wê yekê dikin dikare bê gotin ev xedreke mezine dikin li mezinbûna jinê û ew kesane dibin paşketî mana jinê yê ji aliyên zanistî, wêjeyî û hizrî. Ji ber jin berdewam wek sotemenî û enerjîyekê bûye bo pêxistina karên zilam û dahênanên li ser hesaba jinê bi dest anîne û piştî wek şermekê ye bibêje jinek piştevanê min bûye.

Dem a ku jinek mirov bide aliyekê xêzanek diçe qalibê wê dîrxistinê, ji ber ti demekê jin bi tenê jin nîne di nav malbat û xêzanekê de, jin li hemû bajar û gundekê be, li kûderê be jiyan hebe jin jî li wê derê ye, wê demê jin eger di pirsgirêkê de be civak di pirsgirêkê de ye. (Pirsgirêkên jin pirsgirêkên civakê ye, pirsgirêkên jin tenê pirsgirêka hebûneke cuda nîne ku zulm lê tê kirin, trajediya bê deng kirinê ne dengeke ku dixwaze biaxive, pirsgirêka cinsekê nîne ku tenê li goşekê nebe cîhê wê nabe, ew pirsgirêka herî giring a civakê ye ku bo têkbirina çawaniyê ye, kole kirina jin tê wateya kole kirina civakê ye, tişt a ku bo jinê gef be sîstema baviksalarî hemû aliyên xwe ve, ji aliyê (yasa, çand, hêz û desthilat) ve li dijî jin hatiye ava kirin.) (Rêbîn , 2006, R. 115).

Heta jin meziniya wê û li ber milê zilam wekhev lê neyê nêrîn, civak dê her paşketî û vekirî ava nabe, ji ber her jinek dayîka zarokê ye û wî zarokî mezin dike, heta ku dibe takekesê civakê hêdî hêdî dibe civak, eger ew takekesê civakê di bin destê jinekê ne xwandevan û kole û ne rewşenbîr de mezin bibe, bîne berçava, ew takekese dê çawa derbikeve û bibe kesekî çawa? Bê guman ew takekes jî dê wek wê jinê derbikeve û civak jî ji kesan pêktê û civak jî wisa lê tê û hêdî hêdî civak jî paşdikevê û girtî dibe û bê deng dibe.

Ji ber vê jin xwedî roleke serekî ye di pêşdeçûna civakê de, wek dibêjin li pişt her zilamekî serkeftî, jineke serkeftî heye, jin eger hevkar û alîkarê zilam nebe, ti demekê zilam nikare bi tenê bibe kesek serkeftî. ((Demekê dagirkeran got: Eger em welatekê dagir bikin, yekem car divê em ji jinê ve destpê bikin, sîtem û zulim êmê lê bikin û wisa em dikarin desthilata xwe li ser civakê wî welatî ferz bikin. Ya duyem jî emê jinê ji xwandinê û desthilata wan bêbeş bihêlin, ji ber jin eger li xwandin û perwerdê bêbeş bibe di encamê de civakeke nefam û paşketî ava dibe, ji ber jin jêdera ava bûna hemû xêr û xweşiyekê ye, eger jin cahîl û tepeser be û mafê herî kêr ji wan re bê dayîn, di encamê de bi heman awayî takekesên civakê dibin kole û bindest, ji ber ew bi koleyî ji dayîk dibin.)) (dlêr , 2013, RR. 131-132).

Di hin qonax û netewên cuda de jin pir bi kêmî çavê hatiye kirin û pir caran wek kole hatiye bikaranîn, jinê jî nekariye berevaniyê li xwe bike, ji ber temamê derdora wê bi wî awayî reftar li gel kirine, bi derbas bûna demê re, gohertin û ber bi pêşde çûna civakê ve

hêdî hêdî ew diyardeyane pêgeheştine û nivîsên olî derfetek çêkiriye bo jinê, her olek li gor bernameya xwe nêrînên wê yên ji bo jin cuda bûye û bi awayên cuda pêgeha jin diyar kirine.

((Di ola pîroz a îslamê de jin xwedî pêgeheke taybet e û biheşt bi mezinî û firehiya xwe di asta bin piyê dayîkekê de hatiye nizim kirin)) (dlêr , 2013, R. 120).

Piştî hatina ola îslamê keç bi zindî çalkirinê hat xilas kirin, ku berî wê bi zindî dihate çal kirin, ev yek wek şerm bû bo zilamekê, ku keça bibe û hindek ji wan bi naçarî ku di civakê de şerm neke keçên xwe bi zindî çal dikirin. Lê li gel hatina ola pîroz a îslamê ve rewşa jin û keçan gohert û zindî çalkirina jinan hate qedexe kirin û keç bi awayeke azad anî nav rêza civakê, jin kete nav hemû payeyên civakê û wa lê hat ku jin beşdarî li hemû karûbarên welat birêve birinê kir û payeyên cuda jî bidest xist û ev yek jî di berjewendiya civakê û jinê de jî bû.

### **1.2.3 Pêgeha jin di civaka kurdî de:**

Pêgeh, bandor û giringiya jinê di hemû civakê de nîşaneyê hişyarî û rewşenbîriya wê civakê ye. Her civakê jinê piştçav bike ew civak pir zêde paşketiye, cîhê jinê di nav civakê de eynika rasteqîn û rastiya wê civakê nîşan dide, di nav civaka kurd de jî jin pir caran xwedî rol û bandor bûye, lê hin caran jî bê rol û bandor bûye, zihmete rewşa jina kurd di yek navnîşan de bê komkirin, ji ber li gor çîn gohertin tê de hene, cudayî pir zêde hene, di navbera jinên gund û jinên bajêr, jinên xwandevan û jinên nexwandevan, jinên kar dikin û jinên male, jinên çînê serdest û jinên çînê jêr, jinên dewlemend û jinên xizan û hejar, li gor civakê gohertin tê de hene, lê jin di dirêjayiya dîroka kurd de karîne rêveberiya gel û artêş û nivîştê fermanên zilamên mezin bûn, lê car car jî wa bûye ku jin hatiye kole û zelûl kirin, bi taybet mafên wê yên serekî jî nehatiye dayîn. (Avakirin, şaristanî û peşketin ji hemû aliyên cuda ve bi tenê zilaman ve pêknehatiye, ji ber jin jî alîkarê wan bûne di serkeftinê de û herwaha li hember astengiyên jiyane jina kurd ji kevin ve serbest bûne, ku ji hemû aliyekê ve alîkariya zilam kiriye, dervey erkê malê bixwe jî gelek rol û bandoreke mezin girtine serxwe, ji aliyê xwandinê jî gelek jinên rewşenbîr û jîr bi berhemên sûdmend ve derketine pêş û karîne karên welat birêve bibin) ('elî , 2013, RR. 5-7) .

Jin di nav kurdan de xwe pêgeheke taybet û rol û bandoreke giring bûye ((Jin di nav kurdan de xwedî payeyeke civakî ye, xwediyê mal e û mal û zarok xwedîkere, mêvan perwere, eger zilam li mal nebe pêşwaziya mêvanan dike û xizmeta wan dike, karkere, koç û bar birêvebere, mil bi milê hevjinê xwe ye, di koçkirinê de, di cot de, di pirsgirêk de, di tûtin, bax û rez de xwedîkere)) ('elaedîn , 1996, R. 12).

Dervey wan aliyên civakî jî jinên kurd qehremen û berxwedêr bûye (Aşkeraye ku dîrokê de gelek destanên berxwedan û qehremaniya jina kurd hatine tomar kirin, ku heta naha jî wek nemir û serbilindiya xwe ve mane. Jin mil bi milê zilamên xwe rol girtine ser xwe û di hemû qonaxên cuda cuda de ew destan û dîroka serbilindî ya dema borî bi bingeh kirine û ji ber vê jî cîhê serbilindiya netewa xwe ne. ew şêre jinane “Xanzad a mîra Soran, Hepsexan a Neqîb, Qedemxêr, Adîle xanim û bi dehan jinên dî jî hwd.” ku navê wan wek çirayeke geş e û berdewam jî pêketîne) ('edalet & 'umer, 2002, R. 91).

Ez dixwazim di vê derê de amaje bi vê yekê bikim ku jina kurd di destpêka pêşketin û bi destanîna gelek aliyên jiyânî ye, ev jî nayê wê wateyê ku jina kurd bi tamamî geheştiye lûtke û pêwîstiya wê bi tişteke din tineye, pêwîste berdewam di hewldana pêşde çûna asta rewşenbîrî, hişyarî û ronakbîrî ya xwe bide, ku bikare li hember astengî û zihmetiyên jiyânê bi asanî û pişt girêdana xwe ve serbikeve, ku hawara xwe nebe bo hêz û desthilata zilam, ji ber hêz û pêşketina xwe bikare derxe holê û rola xwe ya giring bigre ser xwe û hewl bide bo civakeke rewşenbîr û têgeheştî,

ku ev jî bingehê pêşdeçûna civakê ye, herwaha hewl bide bo bidest xistina mafên xwe yên taybet û bingehîn, ku kes nikare wan jibo jin bidest bîne, tenê bi hewl û xebatên xwe ve dikare bigehe tiştê ku dixwaze (Jina kurd bi zihmetiyeke zêde ya aliyên jiyânê re derbasbûye û erkeke zêde li ser milê wê bûye, karên giran ku qasê yên zilaman kiriye, lê rewşa civakî bûye sedem ku berdewam jin wek dûvikê zilam be û bi çaveke kêr lê bê nêrîn û bê desthilat û bê hêz lê bê nêrîn, vê yekê jî wisa kiriye ku jin ji aliyê karên giran ve çend ji aliyê fîzîk û bedenî ve biwestin, herwaha ji aliyê derûnî û ruhî jî hindêy din bi westin.) ('edalet & 'umer, 2002, R. 91) .

Jina kurd wek piraniya jinên cîhanê piranî caran ji ber rewşên cuda û sîtema derdorê,

bêhtir jî jina kurd xwediyê biryara xwe nebûye, bi taybet jinên li gundan niştecih bûne ji ber(Di serdemên berê yê civaka gundan de girêdana bi hin kevneşopiyên berê yê civakê berdewam jin kiriye qurbana wan kevneşopiyên û ji ber vê yekê jî jinên li gunda ji aliyê rewşenbîrî û civakî û ramiyari û aborî ve pir paş de hatine hiştin, vê yekê jî wisa kiriye ku ku civak bixwe jî pêşde neçe, paşde mana jinê zîyan gehandiye pêşketina civakê jî û tepeser kirina jinê bûye sedem ku fikirandin û reftarê wan wek ê zîlam lê were û xewn û xeyalên xwe bixin gore) ('edalet & 'umer, 2002, R. 92) .

Herçend çend sedsal li ser qonaxa koletiyê derbas jî bibin, em dibînin ((Jina kurd heta naha jî ji gelek aliyan ve di bin dest û koletiyê rizgar nebûye, wek lewaz û bêhêz û çavê kêrîq lê nêrîn heye, paşde mayîna jinê bi aliyên biyolojîk û psikolojîk ve girêdayî nîne, ji ber peywendiya xwe bi aliyên civakî, aborî û hizri ve heye.)) (Sozan M. , 2002, R. 17) .  
Yek ji sedemên serekî yê paşde mayî jina kurd li gor jinên gelên din bi sê xalan ve girêdayî ye,

ya yekem: Ne xwandina jina kurd yek ji sedemên serekî yê, ku bi awayeke giştî xwandin kêrîq bûye di nav gelê kurd de, taybet bo jin jî xwandin pir kêmbûye, ev yek jî bûye sedem ku têgeheştin û rewşenbîrî lewaz be û bi çavê kêrîq lê bê nêrîn.

Sedema duyem: Nebûna çavkaniyeke aborî ya serbixwe bo jin e. her demekê çavê wê li destê berîka hevjinê wê, yan jî bavê wê û birayê wê bûye, ev yek jî jin girêdaye bi biryara wî kesî ve ku aliyê aborî pê ve girêdayî ye, ev yek jî nîşaneyê paşde mayîna jina kurd nîşan daye.

Sedema sêyem jî; Tund û tujî li hember jinan û kêrîq zanîna jinê di qonaxên cuda yê civakê de, ku zîlam xwe wek xwediyê jinê zaniye û li gor daxwazên zîlam reftar kiriye, ku ev yek jî rêgir bûye di pêşde çûna jina kurd de, li gel wan hemûyan jî hîn jina kurd li gor gelek netewan serkeftî û pêşketî bûye û pêgeh û cîhekê wê taybet hebûye.

#### 1.2.4 Jina kurd bi rojhilatnasan ango oryantalîst ve:

rojhilatnas tê wateya ku kesayeta cuda ji rojhilat û kesên ku ne xelkê rojhilatîn û rojavayî ne. di serdemên cuda û bi armancên cuda serdanên rojhilat kirine û ji rewş û aliyên cuda yê jiyane lêkolîn kirine, her yek ji wan xwedî nêrînên cuda bûne li ser civaka rojhilat (Rojhilatnas an jî ew lêkolînan û kesayetên cuda ku armanca wan lêkolîn bûye li ser şaristaniyeta rojhilat û wan lêkolînanan xwe mijûl kirine bi lêkolînan li ser gelên rojhilat û ji aliyên "niştiman, ziman û dîrokî ve efsane, wêje, kevneşopî, jiyana civakî û erdnîgarî û ji aliyên zanistî ve giringî dane folklore, dîrok, erdnîgarî, huner, wêje, ziman û resam û destnivîs jî di heman demê de dane yek. Ev yek jî herçend destkevt bû bo rojhilatnasan, giringiyeke zêde hebû bo kurdan, eger sefername û pirtûkên wan rojhilatnasan neba derbarê dîroka siyasî û civakî ya kurd û Kurdistanê de ev qas şarazayiya me nedibû, bi sedan destnivîsên giring û amûr bi sayeya wan li berdest mane) (Ferhad , 2009, R. 12) .

Civaka kurd yek ji civakên rojhilata navîn a ji aliyê rojhilatnasan ve civakeke herî balkêş û nîrx ji lêkolîn kirina wê re hatiye dayîn e.

Rojhilatnasan ji gelek aliyên ve lêkolîn li ser dikir û li ser rewşa kurd û Kurdistanê hêlengandin pêktanîn (Ew tiştên ku rojhilatnas û rêvî û gerînde û rewendan li seferên xwe de tomar dikirin, ew tişt bûn ku didîtin û li ser lêkolîn dikirin û tomar dikirin bûn.

Ew rojhilatnasane bîranînan xwe li cîhên cuda cuda tomar kirine û aliyên cuda lêkolîn kirine û yê herî giring jî aliyên civakî yê kurd bûye li ser aliyên jiyana û kevneşopî, pîşe û navçeyan lêkolîne) (Bedirxan , 2008, R. 173) .

Herwaha li ser rewşa jina kurd piraniya wan axaftin kirine û giringî bi kar û nîrxên civakî yê jina kurd dane, her yek ji wan bi awayên cuda behs kirine, herwaha pir ji jina kurd bandor bûne, bi taybet jî ji aliyê reftar de wisa behs kirine ku ji ber li ber zîlamê kurd rawestayê, lê bi kêmî behsa pîrsgirêkên jina kurd kirine, ji ber hemûyan amaje bi wê yekê kiriye ku jina kurd cuda li gor jinên netewên cuda yê cîranên xwe û gotine jinên kurd azad in.



Demekê li başûrê Kurdistanê ti giringî û nîrxê wê tinebû li gel netewên rojava ve, ji ber ti cîhek û pêgehekî taybet li gel wan çênedikir.

Demekê jî rojhilatnasan lêkolîn li rojhilat û netewên rojhilat dikirin, di vê navendê de kurd li kêlekekê û goşeyekê dima, yan jî giringiyekî temamî nedidan kurd (Di pirtûkên rojhilatnasan ku taybetin bi behs û lêkolîn li ser netewên rojhilat û heta sedsala nozdemîn rasterast behsa kurdan nekirine û pirtûkên wan ê taybet li ser kurd nebûye, ji ber beşek pir kêma cuda kirine bo kurdan, berevajî wê netewên din ji ber berdewam xwedî dewletekê bûn, an jî kurd ji ber xwedî pêgeheke serbixwe ya siyasî nebûn) (Ferhad , 2009, R. 11).

Lê êdî hêdî hêdî piştî sedsala nozdemîn pê de başûrê Kurdistanê bû xwedî cîh û rojhilatnasan serdanên navçeyên kurd kirin û ji aliyê jiyana kurdan de lêkolîn hatin kirin û giringiyeke mezin hat dayîn û wa lê hat ku pirtûkên taybet hebûn ku li ser kurdan hin vegote dikirin û bi zimanên din kurd û Kurdistan didane nasandin. Rojhilatnasan axaftin li ser gelek aliyên kurd kirine, lê armanca min di vê derê de tişta ku ez dixwazim bikim behsa jina kurd e û bi dîtina rojhilatnasan ve ku her yek ji wan bi awayekê behs kiriye û pir ecêb mane li jêhatî û şidyayî bûna jina kurd.

Yek ji wan rojhilatnasan jî (Rech) bûye ku xelkê Fransayê û bi armanca geştîkirinê berê xwe daye Kurdistanê û nivîsên taybet li ser Kurdistanê nivîsiye. (Rech di heyama geştê xwe ya Kurdistanê de hemû ew bîranên xwe nivîsiye, ku rojane jiyan kiriye yan jî li ser zimanê kesên wan navçeyên ku geriyaye dibîhîst, an jî serdanên ku kiribûn de lêkolînên kiriye, herwaha ji aliyên cuda û peywendiyên civakî û pile û payeya jina kurd û sewal û hwd... lêkolî ye.

Bîranînên bi trajedî jî tomar kiriye û behsa wê yekê kiriye ku kurd çend mêvan perwerin, dema Kurdistan bicîh hiştiye xemginiya xwe bi giriya xwe ve daye derve û bi dil tengî ve xatir xwastiye û peyman û soz daye xwe ku heta li jiyane be başiyên vê netewê ji bîr neke) (Klawdîws , 2012, RR. 12-13) .

Rech heyama ku li Kurdistanê bûye di nav xelkê de geriya ye û ji jina kurd ecêb maye (Azadî û serbestiya jina kurd pêşketîbûna wê ya ji civak û netewên din ên cîran bi aşkerayî

nîşan dide û behsa vê yekê kiriye, derbarê dawetên ku dîtiye de dibêje; pile û payeya jina kurd cudaye, zilamên wan bi çaveke wekhev lê dinêrin û zarokên wan aramin û govend gerandin xebateke mezin a jina kurde, bê ku bên vexwandin bixwe diçin beşdarî govendê dibin, cil û bergê jinan li Kurdistanê, pêktê ji kiraseke mezin û kiraseke pan û navtenga xwe bi şûtik û piştêneke mezin a kemerî ya zîv an jî zêr ve girêdidin û poşiyekê li ser cilên xwe de berdidin.) (Bedirxan , 2008, RR. 142-143) .

Rech ev yek zelal û ronî diyar kiriye ku ji aliyê şaristaniyetê û ronakbîrî ve jiyana jina kurd pêşketiye. Herwaha mûkir vê yekê tê ku yek ji rojekê li Kurdistanê behsa çûna dayîka Mehmûd paşa dike ku serdarê wê demê bûye û ji parêzger û waliyê Bexdayê re dibêje ((Bi armanca gotûbêj li gel Davûd paşayê waliyê Bexdayê bixwe jî belgeyeke mezine bo wê desthilat û payeya jina kurd, ku guh li gotinên wê hatiye girtin û encama wê gotûbêjê jî bi awayeke serkeftî vedigere Silêmaniyê)) (Klawdîws , 2012, R. 13) .

Ev yek mezinbûna jina kurde ku berî du sedsal xwedî pêgehekê bûye di nav civakê de û karên giring de pêşengî kiriye. Li gor Rech jin xwedî rol û bandoreke girînge, ji ber nahêlin alozî di navbera zilaman de pêkbê, eger tiştêk xirab hebe jin wî agirî di temirînin. Yek ji wan rojhilatnasan jî ku serdana Kurdistanê kiriye û rewşa Kurdistanê hêlsengandiye (Mînersiki) ye û bi xwe xelkê Rûsyayê ye û di destpêka sedsalên bîstem de hatiye Kurdistanê, armanca Mînersiki di serdana xwe de (Lêkolîn kirin bûye di derbarê çanda netewî ya kurd û komkirina zanyariyane li ser aliyên cuda yên kurdan û bi taybet jî armanca wî destnivîsên kurdî bidest bixe û bidest jî xistiye ku di heyama geşta xwe de ev yek pir bi nirx dîtiye.) (Vladîmîr , 2002, R. 13) . Ev rojhilatnase behsa jina kurd kiriye ku ew jî di vê derbarê de nêrîna wî ya derbarê jina kurd de li gor netewên cîran cudayiya wê dîtiye û pir ecêb maya li xwe westandina jina kurd û dibêje ((Jin û keçên kurdan karên nerihet ên nav malê dikin. Ji kaniyê avê tînin, sewalan didoşin, dar komdikin û tînin, diçin ser çiyayên bilind, li gel vê yekê jî bi awayeke berdewam zarokên xwe yên biçûk radikin û bi pişta xwe ve girêdidin)) (Vladîmîr , 2002, R. 159) .Ew rojhilatnase tiştên ku bi çavê xwe dîtiye, li gel wî pir ecêb bûye û tiştên waha ne dîtiye, ji ber vê jî pir jê bandor bûye û ji ber vê jî li ser vê bi awayekî wisa nivîsiye.

(Heey) yekî din ji wan rojhilatnasan bûye ku serdana Kurdistanê kiriye, bi awayekê behsa Kurdistanê û jina kurd kiriye ku di hemû karûbarên xwe de kêrhatî û hêjayî tiştên mezin dibîne û herwaha dibêje ((Jina kurd dikare serdar û fermandarê xelkê be. Bi taybet li gund de dikare bibe pêşengê eşîrê, bi taybet dema ku zîlamê wê bemire û kurê wê yê mezin nebe)) (Bedirxan , 2008, R. 143) Herwaha yekedin ji wan rojhilatnasan jî ku hatiye Kurdistanê (Mecer Son) bûye li rewşa kurdan lêkolîn kiriye û giringî bi aliyên civakî ya netewa kurd daye û bi heman awayê rojhilatnasên din ên hatine Kurdistanê behsa jina kurd kiriye û nirxekî mezin ve pênasê kiriye

jî Garek (Mecer Son) serdana Helebçe kiriye û diçe mala Teyar beg ku kurê Osman paşayê Caf bûye û çavê wî bi Adîle xanimê dikeve, ku hevjinê Osman paşayê. Wê demê Osman Paşa, paşayê Helebçê bûye, dema paşa li Helebçê namîne, karên xwe radestî hevjinê xwe dike (Son) dibêje (Adîle Xanimê li mala Teyar beg odeyek bo min cuda kiribû û gelek rêz li min girt, Son di nav bîranên xwe de navê Adîle Xanimê tîne û wek xanima mezin pênasê dike. Son behsa vê yekê dike ku yekem hevdîtina wî li gel Adîle Xanimê yek demjimêr ajotiyê. Son reftarên Adîle Xanimê pir di ecibîne û li gor dilê wî ye û pir jê ecêb dimîne ku gelek zîrek û jêhatiye û jineke qehreman e) (Bedirxan , 2008, R. 358) . Ev rêzbendiya ku hatî kirin û nav anîna wan rojhilatnasan wateya payeya jina kurd pênasê dike û radigehîne ku heta hetayî navê jina kurd hatiye tomar kirin û ew kesên ku geriyane bi zindî tiştên jiyan kirine û bi lêv kirine û ev yek jî dê her zindî bimîne û ev yek hêvinê şadî û serbilindiyê ye.

### **1.3 Nêrînên civaka kurd bo evîn û heskirina di navbera her du cinsan de**

#### **1.3.1 Heskirin:**

Heskirin ango evîn hestekî ji dil û hindirê mirov ve serî radike û du kesan bi yek ve girêdide, ne dem ne jî sedemek heye bo ava bûna peywendiyê waha û di bin kontrola kesekî de nîne, heskirin core bi coreye, wek heskirin û evîna xwedê, heskirina dayîk û bav û zarok û heskirina niştiman û heskirina heval û heskirina cinsê beramber hin ji wan e.

Tiştê ku armanca min e û li ser biaxivim, heskirin û evîna di navbera du cinsan de ye ku peywendiyek li gel avabûna mirovahiyê ve peyda bûye, ji ber ev yek cudayê ji heskirinê din, ev heskirin û evîn bandoreke mezin li ser kesan çêdike, heskirin û evîn ((Pêktê ji hesteke bihêz a heskirinê, soz, peroşî û hesta yekem a li hember cinsê beramber e)) (Leyla , 2011, R. 16).

Ev peyvendiye her li gel avabûnê ve û dikare bê gotin her di destpêkê de dil û bedena mirov box we biriye û bi awayeke zû de têkelî nav dilê mirov dibe û mirov hest pê nake (Heskirin û evîn bi borîna demê re hêdî hêdî pêşdikeve û bihêz dibe, dil û hindirê mirov bi yekcarî dagir dike û bi bingeh dibe û îlhameke ava dike, demekê wê yê diyar nîne, ti pêşekiyek û destpêkirinekî wê tineye, lê hema dizanî ku hindirê mirov dagir kiriye) (Zekerya , 2013, R. 291).

Hestên heskirin û evînê hesteke ku ne di desthilata mirov de nîne û mirov nikare veşêre, bi awayekê bixwe zimanê wê yê amaje kirinê heye, di desthilata wan kesan de nîne ku bikarê wî zimanê amajê di bin kontrola xwe de bigre û bi bédengî di dilê xwe de veşêre. ((Dema heskirin û evîna dil û hinav û ruh dadigre, êdî kiryar û reftarên me bêhna heskirin û evînê jê tê û ruh û derûnî de sîmayê heskirin û evînê xwe dide derve)) (Fazl , R. 30) .

Di heskirin û evînê de hestek bi bandor heye ku ser reftar û rabûn û rûniştinên cuda cuda yên jiyana rojane ya mirov xwe dide derve û dema ku ew kes hest bi hebûna evînê dike di nav dilê xwe de, carekê hest dike ku ew evîn pêgeheştî ango kamil bûye. Ji ber ew hest girêdayîye bi nav dil û hizrên mirovan ve, berdewam heskirina paqij û tamam ew e ku her çî hebe ji bo wê dibexşê û bê ku li benda xelatekê yê hember xwe ve, heskirin û evîn wisa li mirov dike ku hest bi aramiyeke zêde bike, hêza berxwedanê bihêz dike û berdewam bê dawî ye, tirsê wê ji aşkerabûn û derketinê tineye, ti demekê dîl nayê girtin û wêrebûneke zêde ava dike, xwe bawerbûn di mirov de zêde dike ((Hêza heskirin û evînê fêr dibe ku hêz û çalak û bihêzeke zêde ya çalakbûnê di vê rêyê de pêngav bavêje)) (Mhmid , 2012, R. 156) . Heskirin û evîn ewqas bihêz û bi bandore di dilê mirov de ava dibe û bandoreke tamam li ser mirov çêdike û mirov geş dike, ji ber vê bi wê rêyê ve mirov dikare bextewer be û demên nexweş û dijwar bigohere bi hesteke aram û piştrast.

Heskirin ((Çareseriyê bo piraniya dil tengî û pirsgerêkan, hin caran bijîşk wek çareseriyê amaje pê dikin û wek çareseriyê derûnî rastî xemgîniyan tê dîtin û bê ceribandin, ji ber heskirina dil ve hest bi geşbûnê tê kirin û dûr dixê ji bê taqetiyê û bê hêvîbûn û nîgeraniyê)) (îwsif , 2006, R. 20) .

Aliyên derûnî yên mirov hemû demê dibe ku rihet nebe û hin caran ji ber sedemên cuda jî mirov bê taqet bibe û ji rewşa xwe bêzar bibe, ev yek bandorê li ser bedena mirov bike û tembelî çêbike, bêhêziyê ava bike û ji bo kar û tevgerên asayî jî nahêle, geryan û karên rojane jî nake, herwaha hin caran xwarin xwarinê jî kêr dike, êdî hêdî hêdî bandoreke xirab dike, hin caran ew mirovane jî ji ber evîndarin yan di navbera evîndara wî de nexwaşî ji ber heye bê hêz û quwet dibin ( Hin caran evîn li mirov dike ku hest li êşên derûnî û hesteke cuda bike, yan jî tişteke ku tu bixwe jî nezanî çiyê? ew hest wisa dike ku li benda heskirin û evînê be ji yê hember xwe, dema ku hest bi evîn û heskirinê kir wê demê dest radibe dest bi tevgerê dike, derûn ser hestên nexweş de dibe desthilat û ev yek jî evîn û heskirin e) (Tarq & Alnîmî , 2013, R. 421).

Heskirin û evîn li gel derûniya mirov bi bandore, ji aliyê civakî ve jî bi bandore li ser mirov û wa li mirov dike ku ji xwe û ji derdora xwe zêdetir evîna xwe hesbike, ji ber êdî bi dîtina wan kesan ve jiyan pir xweşiktir tê berçav û hest dike ku cîhan digohere û hest bi giringiya xwe dike û mirov zêdetir civakî dibe li gel û li gel derdora xwe hêza wî ya têkelbûnê zêde dibe, ev yek jî bi heskirin û evînê pêktê (Heskirin û evîn ji aliyê derûnî ve reftarên pir bi tenduristî pêktên û aliyên civakî bihêz dike, heskirin û evîn tenê ji hestan pêknayê, ji ber pêktê ji helwêst û xwe aşkera kirinê jî, destpêkê de ji hesteke bê zanayî û agahî pêktê, lê piştê pêgeheştîbûn û kamilbûneke zêdetir derdikeve pêş, heskirin û evîna di navbera jin û zilam ji çend qonaxan re derbas dibe) (Runak , 2011, R. 77).

Ji bo nimûne yekem car bi dîtîna balkêşana ser hev pêktê û hest bi heskirina yek dikin û piştê yek dibînin, dema ku di xwe de dizanin ku ji hev hesdikin, êdî peyman û soz didin hev û wê rêya xwe berdewam dikin. (Heskirin û evîn li ser rêya jiyanê geheştina du kesane, ji ber ku di nav civakê de pir tiştêkî tê pejirandin nîne, ji ber vê jî bi awayeke veşartî di navbera jin û zilamekê de yan jî di navbera keç û kurekê de hesteke wisa ji mirov re dibexşe ku ew ê din an jî ya din nivê jiyana wê yan jî wî ye, her bi rêya wê heskirinê ve xweşikiyên jiyanê dibînin û li paşeroja xwe dinêrin) (Nasr, 2004, R. 15) .

### **1.3.2 Di civaka kurd de evîn û heskirina di navbera herdu cinsan de :**

Heskirin û evîn di navbera du cinsên di nav civakê de gor cîh ji yek cuda ne, di civakên rojava de wek tiştêkî pir asayî lê tê nêrandin û ti qedexeyek tê de nabînin, ev jî vedigere

bo bilindbûna asta rewşenbîrî û têgeheştina aliyan a jiyânê û azad kirin mirov ji wan tiştan ve girêdayî û taybet bi wan ve girêdayiye, lê di civakên rojhilat de ev yek berevajiyê û bi hemû awayekê hebûna peyvendiyeke waha li gel xwe karesatek mezin tîne û bi her awayekê qedexeye, ev yek jî vedigere bo kêmbûna asta rewşenbîrî û mana di kevnepereştiyê de ye, ku divê her du cins ji yek dûrbîn, di civakên paşde mayî de heskirin û evîn wek tiştê ku bê pejirandin nîne, ew ne şîrînî jî zêdetir jinê digre navxwe û ew qedexê zêdetir jinê digre navxwe û wê bandor dike, bo zilaman ji hin aliyan ve wek tişteke asayî ye, lê bo jinê tişteke nefretî ye, ji ber ew civakane jinê wek şerefa binemalê dibînin, di vê derê de emê behsa civaka kurdî bikin û nêrîna wan a ji bo heskirin û evîna di navbera her du cinsan çawaye emê lê binêrin.

Civaka kurdî girtiye û ji aliyê hizrî ve civakeke paşde mayî ye ((Civaka kurdî zêdetir wek civakê kîştûkal hatiye nasîn û xwedî çandê berfirehe, di vê çandê de bedena jinê milkê malbat ango binemalê ye û xêzane. Ew milkdariye û dest li ser de girtina bi bingehe ji çanda hizrî ya civakî ve û bi yek ve girêdana civakê ye, ew bingehe û desthilat gelek awayan di bin navên cuda de hatiye pênase kirin û di bin navên wek şerefê ew desthilatî hatiye bihêz kirin.)) (Rûnak , 2003, R. 401) .Eger jinek an jî keçek di civakeke wek kurd de xwedî heskirin û evîn be, yan jî tiştê di vê babetê de pêkbê, divê berdewam di tirsê li xwe û jiyana xwe bike, bi taybet li wan cîhê ku di çarçoveya eşîret de mane, ev yek hîn zêdetir û girantire li gor wan cîhên din, di vê civakê de divê jin ji sîber ango siya xwe jî bitirsin, di dema pêkanîna heskirin û hebûna peyvendî de.

Ji ber ew eşîret hemû tiştên jiyânê box we birine û ji çarçoveya zilam jî dernakevin. (Her demekê ku reftarên jin li gel destûra eşîretê hemaheng nebe, yan jî ji aliyê jinekê ve dest bo babeteke wek heskirinê bê birin, wê demê xwîna wê jinê helale bê rêjandin û parastina babetên wek heskirin û evînê ji aliyê zilamên eşîr û malbatê ve tê kirin. eger sistî bê dîtî wê demê çarenivîsa wê malbatê ber bi xirabiyê diçe û gelek gotegot û rexne dê ji aliyê xelkê ve lê bîn kirin) (Rûnak , 2003, R. 401) .Pir mixabin ku di civakê de di piraniya aliyên jiyânê zêdetir dijî peyvendiyan di navbera her du cinsan de radiweste, ev jî vedigere bo çanda civakî ve û bi başî tenegeheştina wê babetê ve girêdayiye (Hin fikirindin û hizrên civakî di peyvendiyan heskirin û evînê de dibin rêgir li pêş azadiya mirov û her ji kevin heta naha civaka kurdî bi tundî dijî peyvendiyan heskirina di navbera her du cinsan de ye, evîn

û heskirin ji ciwanan re hatiye qedexe kirin û heram kirin, peyvendiye keç û kur wek peyvendiye şeytan û ferîşte hatiye pêname kirin, wek kufir lê hatiye mêzandin. Lê heskirin û evîn bixwe xerîzeyek giring a ruh û dilê mirove. di civakeke girtî ya wek civaka kurdî de, tişteke nayê pejirandin û qedexe ye, ku em dibînin bi awayek veşartî û bi tirs ve behsa heskirinê tê kirin, ew peyvendiye wek peyvendiyeke xelet tê pêname kirin, di encam de takekesek ava dibe ku jê re tê gotin ciwan û ew ciwane tiştê herî xweşik û paqij ê heskirinê tê dîrxistin û jê re tê qedexe kirin û heram kirin. ev jî wa lê dike ku jiyana wî teji be ji tiştên veşartî û baş dizane ku eger bi aşkerayî behsa wî tiştî bike, dê rastî çi encamekê bibe.) (Aştî , 2012, R. 29) .

Civakeke wek civakeke kurd de her ji destpêka avabûna malbatekê ve ku zarok çêdibe çi kur be çi keç be êdî dê bermilê wê jinê be, ew jin jî ji ber bermilê jineke wekî xwe mezin bûye, hewl nedane ku tiştan ber bi gohertinê ve bibin, ku civak jî ber bi pêş de biçê. Bi taybet ji aliyên civakî ve ew takekese wekî ku bibêjî berdewam di tewan de ye, di bin çavdêriyên teji û leşkerî de ne ku êdî wa li wan tê ku hêza wan peyvendiye ava kirinê namîne li gel takekesên derdora xwe, ca eger ew takekese eger keç be babet hîn tundtir dibe ((Mirovê me di rastiyê de peyvendiyeke xwezayî ya li gel xwe bixwe jî nîne, her ji zarokiyê heta mezin dibe, berdewam balkêşî û nêrînên wî ber bi dervey xwe ye ji aliyê civakî ve û tiştên dervey xwe ye, ne wekî ku xwe wek mirovekê danûstandineke xwezayî li gel xwe bixwe bike, ji ber vê jî hest, aqil û pêdiviyên xwe nikare bi cîh bîne, ji ber vê jî nikare peyvendiyeke xwezayî li gel yeke din ava bike.)) (ARî , 2004, R. 10) .

Pir caran peyvendiya heskirinê di civaka kurd de li ser bingeheke teji nayê damezrandin, ji ber vê jî pir caran em dibînin peyvendiyeke bi cudabûnê ve bi dawî dibe û yek ji wan dibe qurban.

Ev jî sedemê wê ew e ku peyvendiyeke ne hişyarî hebûye di navbera kesan de, hin mijar hene wekî ku dibêjin ji yekem dîtinê ve evîn û heskirin ava dibe, yan jî dibêjin her di yekem dîtinê ve ketiye nav dilê min, ev hemû bê wateyiya heskirinê ye, ji ber heskirin tenê bi wê dîtinê ve nayê hêlengandin, heskirinên waha tenê bo teji kirina valatiya hatiye diyar kirine, bi vê yekê ve peyvendiya ruhî ava nabe, tenê betal kirina xerîzeyê demiye, ji vê re jî nayê gotin heskirin, coreya avakirina peyveniyê heye û tê dîtin di bin perdeya heskirinê de yan jî di bin navê heskirinê de bo ava kirina peyvendiyeke qedexe kirî di bin

navê evîn û heskirinê de ku kesê hember bi asanî qebûl bike tê kirin, ev jî heta wê demê ye ku kesê beramber bikevê dav û xefikê û piştî ji ber sedemên cuda cuda ev yek tê bikaranîn, di vê derê de kesê yekem ê zerer dike keç e û ev yek dibe xaleke reş di navçavên wê de û nav mirovên derdora wê û civakê de, di vê derê de jî ne hişyariya heskirin û evînê sedemê serekiye û ji wê şûnde jî dikarin bibêjin karesat e.

### **1.3.3 Lênêrîna civak kurd bo evîn û heskirina di navbera herdû cinsan de :**

ji ber sedemên paşde mana hizra heskirin û evînê di nav civaka kurdî de, ango wateya seks hema wek peyv jî heskirin bê bihîstin, êdî hemû hiş û fikir bo seksê diçe û wisa dizanin ku her keç û kurek peyvendiye pêkbînin, di navbera xwe de seks dikin, ev jî fikir de tengbûne û ji sitûyê civakê venabe û wek bibêjî bûye mîrasek û maye (Heta naha jî civaka kurd bi temamî ji wateya heskirin û evînê tenegeheştiye, bi berdewamî tenê bi gotin agahî li ser heskirin û evînê dane û vê yekê jî hiştiye ku di civaka me de heskirin û evîn xeyaleke xweşik be lê ne rastî û waqîî yeke xweşik ê jiyanê be. Heta naha civakeke wek civaka kurdî tenegeheştiye ku jiyan bê evîn û heskirin bê wateye, di vê civakê de nêrîna li hember heskirinê rûkêşaneyê, dûre ji nirxên hestî û dûr bûye ji ava kirina peyvendiye wekhev û bê cudayî di navbera her du cinsan de) (Serwer , 2005, R. 130).

Ev yek jî wisa dike ku takekes bi taybet jî cinsê jin ji heskirinê bitirsin û wek tişteki metirsîdar bibînin, sedemê wê jî tenê nêrîna civakê bixwe ye, ji ber pirsgerêkek wah çarenivîsê diyar dike eger ew takekese bizane piştî aşkerabûna vê peyvendiye dê li gel xwe gelek pirsgerêkên jiyanî derbixe holê, ji ber vê jî newêre dest bavêje evînê ((Ji ber civaka kurd di bin gelek êş, metirsî û zihmetî û hatiye perçiqandin li hember evîn û heskirinê ew civak di dirêjayiya dîrokê de wek civakeke girtî xwedî hizreke baviksalar bûye, ev jî bûye çand û di psîkolojiya takekesan de cîh girtiye, ew çand jî berdewam takekes fêrkirine ku dijî heskirinê bin, bi wî awayî civaka xwedî hizir û çanda olî û baviksalarî pêk hatiye. Bi wî awayî jî berdewam takekesê dil req û tund û tujî bixwe re derxistiye holê û ew civak li ser bingehê hizra baviksalar ku bi bingeh bibe û her tişteki wek mafê nêr ango zilam bizane, bi piştrastî wuzeya evîn û heskirinê tê de lewaz dibe û rê ji geşbîn û pêşketinê re nayê dayîn)) (Serwer , 2005, R. 118) .



Dema ku civakeke waha bi wî awayî li evîn û heskirinê binêre hêza wê ya heskirinê namîne û lewaz dibe, ji tirs mezinan kur û keç ên civakê hestên xwe ditepisînin û tepeser dikin, an jî bi awayeke veşartî hestên xwe tenê di xwe de jiyan dikin, ji ber vê tiştê veşartî jî nikarin baweriyê bi ti kesekê binin, ku jê piştrast bin û di dema pirsgirêkan de jî ew peyvendî bi encamên baş ve bi dawî nabe (Di civaka kurd de em dibînin ku ew kesên ku pehlevanên heskirinê ne bi pirsgirêkek herî biçûk de bi yek geheştinê ve dest li yek berdidin û li gel êşên mezin jî ji yek cuda dibin.) (Kurdistan , 1999, R. 24) .Sedemeke din ê vê yekê jî heye ku takekesên vê civakê ji ber ku babeta evîn û heskirinê wek xeta sor e û behskirina wê bi awayê veşartiyê, hişyarî nîne û gelek car li ser vê babetê herkesek bi heskirin û daxwaz ve çav lê tê kirin, bi taybet ji aliyê cins nêr ango zilam ve bo teji kirina demên xwe yê betal tê bikaranîn û di heman demê de dikare li gel çend keçekan peyvendiye ava bike û li ser bingeheke bê bername ew peyvendî tîne pêkanîn, dema bi awayekê aşkera dibe aliyê kur ango zilam xwe wek xwediyê wê babetê nabîne û xwedî lê dernakeve û hemû giranî ji bo keçê dihêle û di vê derê de keç dibe qurbanî,

Hin caran jî kur keçan ditirsînin û ji keçê re dibêjin ku eger karê ne rewa li gel neke, wê demê dê ji kesûkarê keçê re bibêjin û di vê peyvendiye de keç dikeve nav dav û xefikeke giran, di rewşeke waha de yan keç xwe radestî daxwazên kur dike, yan jî gelek caran tê bihîstin ku xwe dikujin, dizane ku eger aşkera bibe, tiştê bê serê wê ji wê baştir nabe, ji ber wan sedemane piraniya keçan ji peyvendiye evîn û heskirinê ditirsin. Dema ku ew kur an jî zilam dibe xwedî xwişk an jî xwedî keç em dibînin bi çavê xwe ve li heskirinê dinêre û wisa dizane ku her keç û kurek ku xwedî evîn û heskirinê be bi wê armanc û niyetê ve ji hev hesdikin, ji ber vê jî bi tundî li dijî peyvendiye heskirinê radiweste.

Hin caran jî peyvendiye heskirinê di navbera du kesan de wan bi hev re girêdide û bi hevsergiriye ango dawetê ve bi dawî dibe, gelek car ji ber ku hişyariya wan li ser babetên wek berjewendiye madî, xweşikî, servet û saman û hêz û daxwaz li ber çav hatiye girtin, dema ku çav têr dibe ji gelek tiştan dema têr dibin jiyan li wan dibe dojeh û ji ber vê jî gelek car bi cudabûnê dawî li wê peyvendiye tê.

Dem a civaka kurd hinekê vebû bo gohertinên cîhana derve, ji gelek aliyên de tişt wek berê neman, gohertin tê de pêkhatin û ew gohertin li ser aliyên civakî jî reng da û ew gohertin heta asteke kêr jî li gor sûdê jinan e, bi taybet jî di peyvendiyan civakî de û çûna derve û vekirbûn û ji aliyên civakî ve hêdî hêdî mafên jinan li ber çav hate girtin, piştê ((Mafê jinan de hin gohertin derketin pêş, ev yek jî bi pêşketina aliyê rewşenbîriya kurd ve pêşket û hin ji wan nêrîna wan ya ji bo jiyane û heskirinê de gohertin tê de pêkhat, herwaha hin ji rewşenbîrên me jî ji ber bandora evîn û heskirina xwe nekarîne bitepîsînîn û li hember hestên xwe nekarîne bêdeng bin û ji ber vê jî ew tepisandin û êşa derûnî bûye çavkaniya nivîsên wan û bi aşkerayî û bê perde bi rêya nivîsandinê ve hestên xwe aşkera kirine û berevanî li azadiya evîn û heskirin û hevsergiriye kirine, herwaha di gelek nivîsên xwe jî bi dîtineke rexnegirî ve li hember çanda civakê pêşxistine û nivîsandine ku ew çemkê evîn û heskirinê wek guneh û haram pênase dikin bi awayeke bi bandor rexne kirine.)) (Serwer , 2005, R. 119) .

Em dibînin di nivîsên nivîskar û helbestvanên kurd de hemû behsa evîn û heskirin û heramiyê dikin û bê tirs li gel bejna heskiriya xwe pesnan rêzdkin û hin ji wan bi aşkerayî navê heskiriye xwe bilêv dikin, mirov nizane bi tişteke ecêb em lê binêrin, an jî wek tiştêkî asayî em lê binêrin, ji ber di vê civakê de ew tişt qedexeye, Ez dixwazim vê yekê bibêjim eger ew xweşikiya jinê, heskirin û evîndarî neba, wê demê ew helbestvan û nivîskaran ma dikarî wan berheman derxin holê, bê guman nexêr, ji ber heskirin û evîn ((Peyvendiyeke mirovahiyê ye (însanî ye) ku bi rêya heskirin û evîna ji dil ve dibe û kilîl ango mifteya wî deriyê heskirin û evîndariyê di dest evîndaran û ewên ku xweşikî û heskirina jinê li gel wan ji hertiştêkî bi nirxtir û bi bandortire ye, ji ber li gel helbestvan ti awazek bi êcgar xweş be, lê berdewam wek awaza heskirin û evîndariyê dil venake wek)) (Foad , R. 258).

Herçend gohertin li gor berê hinekê cuda jî be, lê belê li gel vê jî heskirin û evîn bi takekes û têr bi aşkerayî tê behs kirin û tê bi encam kirin, ji aliyê din ve di nav malbat û navçeyên cuda de bandora wê hizra kevneperest maye û rê nadin keç û kur peyvendiya wan a heskirin û evînê li gel yek hebe û wek şerm û guheh lê dinêrin. Ew core kesane wisa dizanin ku dibin rêgir li pêş takekesan di helbijartina hevserê pêşeroja xwe de, ku li ser bingehê heskirin û evînê hevdu helbijartine, hin ji wan rê nadin ew hevserî pêkbê, tenê ji ber heskiriye wê bûye (Li gel pêşketina civaka kurdî li hin aliyên ve heta naha jî jin û

takekes girêdayî bi fermana malbata xwe ne û di piraniya navçeyan de jî kur û keç bêbeşin ji helbijartina jiyana xwe ya pêşerojê de, ku ji hevdu heskiribin û nexşe bo paşerojê danîbin jî astengiyên wan her hene) (Hana , R. 10) .

Di civaka kurdî de peyvendi di navbera keç û kur de ji hemû aliyekê ve û nêrandina piraniya kesan wek tişteke kêr û şerm lê tê nêrîn, eger keçek di peyvendiyeke heskirinê şikest bîne û babeta wê aşkera be, wê demê egerê ji destdana gelek tişteki heye di jiyana xwe de, dibe ku ji aliyê hevseriyê ve kêmbîne, ji ber ku di civakê de çemkê evîn û heskirinê wek mijareke exlaqî tê dest girtin û kur ne amadene li gel keçekê bizewicin ku berê peyvendiya wî li gel kesek din hebe. Erê başe her kur nîne ma peyvendi li gel keç ava dike û piştê ji ber sedemên cuda cuda dest lê berdide, na fikire gelo ew keça çarenivîsa dê bigehe kûderê, heman demê de bixwe jî amade nîne li gel keçek wisa hevsergeriyê pêkbîne, ew keçe ji ber hebûna peyvendiya evîn û heskirina wê îtirazên bav, bira, kes û karên wê pêşdikeve, êdî ew jî ji ber vê tirsê û ji ber têgeheştina xwe vê peyvendiyeke wek qedexe çav lê dikin.

(hebûna peyvendiyeke evîn û heskirinê di civaka kurdî de rewşeke qedexe ye û heta naha jî peyvendiyeke keç û kur li gel yek pirsyar li ser rewş û aliyên civakî ava dike û bo mijara mê ango jin kuştinê û cezayên tund li gel xwe tîne, ev jî tenê kevneşopiyên civakî vê yekê ava dike, êdî ew civake bi guman ve çav li wî kesî dike, hêdî hêdî takekes lewaz û tîn awayeke hilweşîn û tirsê wan ji derdora xwe dibe, ev yek jî bandoreke nerênî li ser aliyên derûnî û jiyana civakî ava dike û bandorê li ser civakê çêdike û ber bi aliyê xirab ve diçe, ji ber her takekese civakê birêve dibe) (Rêbwar , 2004, R. 213) .

Hebûna peyvendiyeke evîn û heskirinê di civakeke berfireh a wek civaka kurdî de wek kareke giran û dûr ji nixirên mirovahiyê çav lê tê kirin û bi taybet jî bo cinsê mê, ji ber evîn û heskirinê girêdayî hatiye kirin bi şeref û serbilindiyê ve, eger keçek an jî jinek çîroka heskirinê û evîna wê aşkera bibe û kesûkarên wê pê bihesin wê demê dê nefret lê bê kirin ji ber heskiriyeke wê ((di vê civakê de wek dizî kirin, xiyane kirin û xiyanete li niştiman jî)) (Hana , R. 8) . Ev jî tê wateya ku babeta heskirinê ji dizî kirinê, xiyaneke û xiyane kirina ji niştiman jî girantir e. Ewqas aliyên kevneşopî û nerîteyên civakî desthilatin ku, bawerî bi xwe jî nakin, babetek waha hezar gohertinan ve jî nikare wê hizrê ji mêjiyê civakê de gohertinê pêkbînin, ew kesane jî ku berevaniyê ji pirseke wî awayî dikin, ew jî ji dil ve

bixwe jî dijî wê peyvendiye ne û razî nabin kesûkarên xwe peyvendiye evîn û heskirina wa hebin û bi taybet jî cinsê mê (Raste naha li civaka kurdî de gelek gohertin pêkhatine, lê nirxê wê yekê tineye, ku evîn û heskirin pê bê pênase kirin, pir ecêbe em bibêjin civaka me de jin ji ber hebûna peyvendiya evîn û heskirinê ya li gel zilamekê tê kuştinê) (Serwer , 2005, R. 130) .

Li gel aliyên kevneşopî û civakî aliyên olî jî rêgire di peyvendiya evîn û heskirina di navbera her du cinsa de. Di civakên rojhilat de peyrewa ola îslamê desthilate li ser hemû bingeş û yasayên resen,

Civaka kurd jî yek ji civakên rojhilata û ola îslamê pejirandiyê û di piraniya navçeyan ji kevin ve heta naha peyrewa wê olê li gor bernameya ola îslamê karûbarên xwe birêve dibin (Netewa kurd yek ji wan netewane ku ji demeke kevin ve giringiyê bi ol û çemkê qenaeta olî daye û bernameyên xwe li gor wê peyrew kirine û ol bi bandore li ser aliyên civakî jî) (Bwar , 2005, R. 39) .

Li gor bernameyên ola îslamê evîn û heskirin di navbera her du cinsa de berî piroseya hevsergiriye rê jê re nayê dayîn ((Evîn û heskirin di îslamê de ji wê giştî û berfirehtire ku ji evîn û heskirina di navbera jin û zilam de bê kurt kirin, ji ber navend û aliyeke hemûyê digre navxwe û bilindtir heye, wek evîn û heskirina xwedê ya bilind û pêxemberê wî û hevalên birêz û heskirina kesên xêrxwaz û baş û heskirina ol û serxistina wê, heskirin û evîna şehîdên di rêya xwedê de coreyên heskirinê yê bilindtir ên waha hene û pir metirsîdare ku wateya berfireh a heskirina kurt em vekiin ji vê heskirinê de)) (Îwsif , 2006, R. 35) .

Di vê derê de armanc ji heskirin û evînen din, evîna di navbera her du cinsan de ye ku di ola îslamê de rê ji wê heskirinê re nayê dayîn, ji ber vê jî civaka kurdî civakeke ku piraniya wê ola wan ola pîroz a îslamê ye, ji ber vê jî ji aliyê peyvendiye wisa re li hember radiwestin û wek heram çav lê dikiin û rê ji keç û kur û bira û xwîşk re nadin ku heskirineke waha pêkbînin û sedemê wê jî tirsê ji xwedê û olê ye. Di piraniya olên din de ku li Kurdistanê jî hene, rê li pêş pêkanîna peyvendiye heskirin û evîna kesek ji ola din û ola xwe jî na pejirînin û ev yek jî wek xeteke sor e.

## **2 Dîroka helbestên kurdî deta dema Mistefa Begê kurdî , piştire evîn û heskirina jin û rengdana wê ya di helbestên de.**

### **2.1 Helbestên berî Mistefa Begê kurdî:**

#### **2.1.1 Helbest çiyê? :**

Helbest îlhameke ji dil û derûna kesekê derdikeve, piştire jî ew kesê ku wan hevokên ji dil rêz dike re tê gotin helbestvan, wateya wê nivîskarê helbestvanan, helbest li nav dil derdikeve û ji pêênûsa nivîskar ve dirje ser rûpelên kaxez, helbest agahiya rewş, xeyal, nav dil û derûn û hizra wî kesî dide ku ew helbest nivîsandiye, di her rewş û serdemekê de ew kesên ku jê re tê gotin helbestvan dikare rewşa xwe û derdora xwe bi çend hevok û beytên helbestê ve beyan bike, piştire rasterast bandore li wan kesa dike ku wê parçeya helbestê dixwîne û wisa hest dike ku taybet ew helbest bow î hatiye nivîsandin, ji wî kesî re tê gotin xwandekar, hin caran bi rêya kesek din ve ew parçe helbesta tê xwandin kesek guhdar dike, bandoreke temam li ser hest û soza wî pêktê, xwe di heman rewşa helbestvan de dibîne û dikeve bin bandora helbestvan de, ji wî kesî re jî tê gotin guhdar.

Helbestê cîheke mezin di dîroka wêjeya cîhanê de dagir kiriye, di vê derbarê de gelek helbestvan û nivîskarê helbestê rabûne û bûne nîmeteke mezin di helbest nivîsandinê de, hin caran helbest di serdemeke pir kevin de hatiye nivîsandin, lê piştî çend sedsalan û derbasbûna rewşên cuda cuda jî, dema ku ew helbeste tê xwandin, wisa hest dikî ku di dema naha de hatiye nivîsandin, ev jî wateya mezinî û zindîbûna helbestê dide. Adonisê helbestvan di vê derbarê de dibêje ((Ez temamkerê kêmasiyên ku li cîhanê û mirov de heye me)) ('ebdulmutelîb, 2008, R. 70). Helbest wate û nêrîna xwe ya taybet heye, nikare di lêkdanekê de bê kurt kirin û yek core rawekirin bo bê kirin, zêde wateyî û berfirehbûna helbestê di wê derêde ye ku wate û lêkdan û tefsîrekê zêdetir di xwe de digre, lêkdan û tefsîra cuda rastî cudayî yên helbestê ronî dike, rûbirûbûna cuda giringiya pir wateyiya helbestê ye. ((Helbest efsûneke berê xwe dide her tiştêkê û ti tiştêk nikare berê xwe bide wê)) (Mhmid K. , 2006, R. 59).

Nivîsandina helbestê erkeke wisa asan nîne, hemû dest bavêjê û herwaha nivîsandina helbestê pêwîstî bi dem û cîhê taybete ku helbestvan dikeve nav cîhan xeyalen û heta astekê li cîhana derve qut dibe, ji rewşa taybet a xwe de xwe dibîne. ((Helbestvan di nav cîhana xeyalan ve tiştan heldiqûlin, eger nimûneyekê em bînin di rêya vê behsê de ew e

ku her di navbera riste û wêne bi helbesta ku ji aliyê helbestvanan ve hatiye ava kirin, kolane li nêrînê û bi çavê zarokî ve vejîn dikin û dibin sedemê xulqandinê û çîrokbûn, bi wî awayê ku li cîhanbîniya helbestvan ve fezayê nivîsê derdikeve holê)) (Rehîm , 2015, R. 239).

Helbest ew saman û serwet tenê ye ku wek xwe dimîne û eger bibe stran eger na gohertin tê de pêknayê, ew babeta helbestê dimîne xwedî tameke taybete û berdewam zindî dimîne. (helbest beşek ji nivîsa bi bandor û giring, babeteke rasteqîne û cîheke berfireh di xwe de digre, helbestên ku mîrateya netewî ye, destan, efsane, karesat, bûyer û nameyên evînê û heskirinê û nameyên serxweşî, dostyatî, raz û niyaz, gilî û gazind di piraniya serdem û qonaxan de zimanê helbestî bikaranîne wek helbest mane) (Cemal H. , 2013, RR. 16-17). Helbest tameke taybet digehîne xwandevarên xwe, ku xwandevar di nav helbestê de xwe dibîne, perperoka xeyalî difirîne û digehîne lûtkeya tam girtinê (Helbest rêxistina nasnameya rêgezên civakî gelek car helbesta nexşe kêşîya paşerojê ye, hin caran jî li xweşî û nexwaşiyên borî bilêv dike, helbesta jiyanê li pêş pirsgerêkan datîne û giyana rikberiyê dike, eger waha nebe wê demê erkê xwe bicîh neaniye, helbest mirov li êş û nerihetiyên jiyanê dûr dixê digehîne asta herî bihêz û daxwazên wî mirovê ku di ponijandina xeyala ruhî de dijî, berdewam di nêrîna pêşbîniyên paşerojê de ye û li benda wan tiştên de ye ku pêknehatine, helbest wek miqnatêsêye ku mirov li cîhana xeyalan ve ber bi rastî dîtîne ve dikşîne, wêrekî dide ruh, hindêk din nirxên mirovahiyê ber bi asteke bilind ve dibe.) (Azad , 2005, R. 22).

Raborî helbesta raboriya gele, helbest çend kevin be dîroka wî gelî jî ew qasê kevine (Kevinbûna helbestê kevinbûna ziman jî ewqas cîhan gîre, helbesta gelên destpêka mirovahiyê anîne ser cîhanê û herwaha gelên şaristaniyet pêşxistine û ber bi pêş ve birine, nirxeke mezin dane helbestê û di hemû serdem û qonaxekê de di nav gel û welatekê de helbestên nivîskî hatine gotin, herwaha civak jî bi hemû çîn ên cuda ve û pile û payeyên cuda cuda bi keyfxweşî û giringiyek mezin dane helbestên bi gotin û guh danê, bi hemû çîn û tebeqan ve li hemû serdemên borî de naha jî xwandevar û rewşenbîr û lêkolînavan û kesên bi hest xwe bi helbestê ve mijûl kirine,

paye û pileya helbestê li gel wan bilind bûye, piraniya wan li gor taybetiya xwe helbest tomar kirine, ji ber wê ku helbest tam û xweşiyêke taybet ji dil û derûna mirov de dixulqîne, helbest di hemû serdemekê de bi nirx bûye) (Loranis , şî'ri çîye, 2008, R. 7).

Helbest di hemû qonaxekê de valatiyêke mezin di nav dil û hizir de dagir kiriye û xwedî dîrokeke di bin nehatî ye, berdewam kevin nabe, bi sozeke germ û gur ve herdemê jî dimîne, ji ber taybet bi jiyana mirov ve girêdayîye. ((Helbest çend cîhekan dike cîhê xwezaya xwe, wek dîtin, bihîstin, wate vergirtin û peyvendiyan zêde û pir bi wate bûnê. Dema ku helbest wek parçeyek nivîsê em bigrin dest, di dema coşa xwendinê de tenê em rastî xwandinê nabin. Çirke, êş û muzîk û wêne her yek ji wan cîhekî xwe yê serbixwe û taybet bi xwe ve girêdayî pêşkeş dike û di parçeyek nivîs de, ku tê xwandinê cuda dibe. Pêşbirkê jî li gel rêgezên din dike)) (Sebah , 2013, R. 199) .

### **2.1.2 Helbesta kurdî:**

Yek ji bingehên şaristaniyeta her gelekê nivîs û aliyên wêjeyî yên wî gelî ye, êdî ew nivîs helbest be yan her babeteke din be di serdem û rewşên cuda cuda de hatibin nivîsandin, ew agahiyên dîroka şaristaniyê ya wî gelî diyar dike, herwaha şaristaniyeta netewa kurd jî wek hemû netewên din di dîroka wêjeyî ve ronî dibe, gelek nivîsên kevin hatine hiştin, ku di serdemên kevin de heta serdema me ya îro mane û wek dewlemendî û samaneke netewî lê tê nêrîn,

wêjeya netewî ya kurd pir e, bi taybet qonaxên dijwar û giran de derbasbûne û pir caran bi rêya nivîsan ve agahî li wê rewşê hatiye dayîn, helbestvan û nivîskaran xwe dane nivîsandinê û di rojame ya îro jî wek çavkaniya dîrokê sûd ji wan tê girtin. Di be ku ew nivîsane dîr û dirêj nebin, ji çend beytek an jî yek beyt zêdetir nebin, lê wateyekî xwe yê berfireh û pêkhateyêke giring li xwe digre, hin caran bi amajeyek rasterast nîşan nadin lê xwandevan bi asanî ji armanca helbestvan an jî nivîskar têdigehe, ev yek jî vedigere bo jêhatîbûna wî helbestvan an jî nivîskarî,

wêjeya kurdî jî ji wê nivîsên pir wateyiyên kevin û nû bêbeş nîne, tiştê di vê derê de armanca ku ez bi awayêke bihêz behs bikim helbesta kurdî ye ku xwedî dîrokeke kevin û tejî wateyên rasteqîn li xwe digre,

helbest û wêjeya kurdî di heman demê de goşeyeke taybet di nav netewa kurdî de bo xwe dagir kiriye û gelek helbestvanên pir mezin rabûne û bûne serdarên wêjeya kurdî û destpê kirin û ber bi pêş de birin û pêşketin bi wêjeya kurdî dan kirin û gehandin asteke bilind. Helbest di nav civaka kurdî de wek hemû civakên din cîheke berfireh dagir kiriye û bandorek bi temamî li ser takekesên civakê ava kiriye, helbestvan êş û zihmetiyên rojê bi helbestê anîne ziman û ew helbest jî ji xwandevanan re xwandine. Wek em dibînin piraniya bûyer û karesat û ne rihetiyên nav civakê bi helbestê agahdar kirine û bûne bingeh û pênaseya wan bûyeran. (Li hember aliyêke din ê wêje û hunera kurdî de em dibînin helbest ji hemûyan zêdetir berfirehe û em dikarin bibêjin bi bandortire jî, bê guhdarî kirinê jî formên wêjeyî pir caran jî helbest di nav hunerên din de xwe pêşkeş dike û ev jî wateya berfirehbûna helbestê ye, hest wisa dike ku helbest cîheke rewşenbîrî yê giring di kurdî de dagir kiriye) (Aram , 2009, R. 51) .

Di serdema kevin de malbendeke wisa nebûye bo gehandina amûrên hişyarkirina civakê, ji ber vê jî berê xwe dane aliyên wêjeyî û ji hemûyan jî taybetir helbest û helbestvanan jî roleke serekî lîstiyê di wê piroseyê de ((Di wan qonaxên ku helbestvanên kurd tê de jiyan kirine, helbest wek amûrekî ragehandin hatiye bikaranîn bo hişyar kirina civakê. Bi taybetî di civakên paşketî yê wek civaka kurd )) (Azad , 2005, R. 190) . Her bi rêya helbestê ve asta rewşenbîrî ya civakê hate pêş û gohertinên mezin hatin xulqandin di nav takekesên civakê de. ((Helbest hunereke ku bandoreke diyar li ser kesayeta kurdî de heye û di destpêka dîrokê de peydabûna rêbaza klasîk ve pênase li tevgera civakî û gohertinên civakî yê kurdî pêkanîne.)) (Azad , 2005, R. 191).

Helbest û wêjeya kurdî dewlemende, ji aliyên pir babet û pir wateyî û bi hemû awayên lehceyan ve helbest hatine nivîsandin û her yek ji wan tameke xwe ya taybet heye û li gel rewş û serdema xwe jî guncawe, li gel her yek ji wan ji yê din jî baştire, lê di rastiye de her yek ji wan, xwedî qalibeke cudaye, ev yek jî wisa li xwandevan, lêkolînavan û wêje nasane kurd dike û bi taybet jî ji aliyê wate û babetan ji hev du cuda kirina di navbera helbestên serdemên cuda de.



### **2.1.3 Lehce û awayên zimanê kurdî:**

Zimanê kurdî wek piraniya zimanên cîhanê ji çend lehceyên cuda pêkhatiye, ku her yek ji wan xwedî taybetmendiyên xwe yê taybet pêkhatiye, lehceyên kurdî pêktên ji (Lor, Goran, Kurmanciya Jor û Kurmanciya Jêr) ew her çar lehceyane, lehceyên serekî yê zimanê kurdî ne û her yek ji wan di navçeyên cuda de tên bikaranîn û her lehceyekê de hin helbestvanên giring derketine.

### **2.1.4 Destpêka qonaxên helbestê:**

Helbest di serdemên kevin de bi gelek awayann hatine nivîsandin, her yek ji wan li gor serdem û rewşên navçeyî, dîrokî, siyasî, aborî û civakî yê cuda bûye, herwaha her yek ji wan agahiyek bûye li ser serdema xwe. Helbest jî wek hemû aliyên din ên jiyana û hemû aliyên din ên wêje bi qonax pêşketine, her qonaxek jî taybetmendiyên xwe yê taybet hene, dikare qonaxên heyî bi awayên cuda cuda bîna dabeş kirin.

#### **2.1.4.1 Helbestên folklorî:**

Eger tu bixwazî di asta wêjeya her gel û civakekê bizanî di çî astekê de ye, wê demê divê mirov berê xwe bide dîroka wêjeya folklorî ya wî gelî û çav li folklorê wan binêre, piştê jibo mirov aşkera dibê ka di çî astekê de ye. Folklore penagaheke bo aşîna kirina me bi dîrok, kevneşopî û wêjeya her gelekê, folklor mîrasiya netewî ya herî kevine bo me maye, berî hezaran sala ku awayê jiyana gelê me aşkera dike, ku netewa Kurd jî wek netewên din xwedî civakeke nîrxên pîroze û naha jî pira xwe gehandina di navbera îro û kevin de ye. (Armanç ji peyva folklor, ew paşmayiyê kevneşopiyên ku bi sedsalan berî naha dest bi dest hatine geheştine rojame ya îro) (Mhmid M. , 2009, R. 8) .

Folklor ji babetên din cudaye, ji ber ((Xwediyê folklorê wêjeyî nîne, ev jî tê wê wateyê ku xwediyê wê civak bixwe ye)) (Kemal, 2003, R. 17) . Bingehê wêjeya hemû civak û gelekê girêdayî ye bi wêjeya folklorê ku ji bo wî mayîye, çî bo wî mabe ji aliyên folklorî ew pênasîya wêjeya wî ya demboriya wêjeyî dike. ( Tiştê ku nayê înkâr kirin ew e ku ferhengî pêşketî li gelekê de wek di bin axê de ye û xwedî bîngehekê ye, ku di serdema naha de jê re dibêjin folklor, bi wateyê ku di jî zanist bi hûrgilî û kevin derbarê raboriya wî gelê me de dibêjin ku, ew zanyariyane xwedî pêşîneyeke kevnarin û vedigere bo bi hezaran salan û

dikare bê gotin ku wêjeya folklorîne û bo hemû gelan xwedî nirxeke destnîşankirina şaristaniyetê ye û zanîna pêgeha civakî ya gel e û sûd jê tê vergirtin) (Sdîq , Mêjuy Wêjey Kurdî, 1375 A, RR. 28-29) .

Folklor mîrasê gele bo nivşên li dû xwe ((Ew berhemên ku hatine xulqandin li dû yek ango dest bo dest kur ji bav, zarok ji dayîkê dibihîse û dimîne û mayînde dibe. Her ji ber vê ye ku wêjeya folklor bi berhemên takekesekê ve nayê danîn û ji hemû gel re tê dayîn û wek berhemên xulqandinên gel tê nasîn û ji aliyê ruhî ve aşkeraye û pêktê ji sadeyî yê, çî ji aliyê ziman ve, çî ji aliyê pênasekirinê ve be, awayê taybet ê wî gel û miletiye û ziman û bandora xwe li ser diyare, herwaha wêne û nêrînên wî gelî jî li gel e)) (Îzedîn , 2010, R. 12). Di serdema berê de pir zêde nirxeke wisa bi folklorê re nehatiye dayîn û bi çaveke giring lê nehatiye nêrîn, êdî ji ber çî sedemekê be hêdî hêdî bo nivîskaran derket bo aşîna bûna nifşê nû bi zanyariyên kevin ên derbarê gelê xwe û têkneçûna wî saman û dewlemendiyên netewî pêwîstiya wan bi çavkanî û belgeyên berdest heye, ji ber vê jî ji aliyê ketine dû komkirin û nivîsandina wan, ji aliyê din ve bo nîşandana dîroka amûr û keleporên hemû netewên din ên derbarê jiyana civakî û şaristaniyeta li ser netewên wan kar kirine.

Gelê kurd jî bi heman awayî heta serdemek nêzîk nivîsên wisa li ser folklorê tinebûn, lê piştî nivîskar geheştin hewara wê dewlemendiyê û li dû wan nixê gel ketin. (Ji naha ve piraniya gelan wêjeya folklorê nivîsandine, di nav gelê kurd de jî hin ji nivîskaran wêjeya folklorîk nivîsandine, ji ber vê jî dest bi dest û zêde û kêr li ser hatine zêde kirin, li gor awayê ziman û navçeyên cuda gohertin li ser hatiye, hin caran zêdebûn û kêmbûn tê de hatiye kirin.) (Mhmid M. , 2009, R. 8) .

Folklor beşek girîng di wêjeya kurdî de, babetên cuda cuda ye. Wêjeya folklorê di nav gelên ne xwandevan de zêdetir û destpêkê de ew derketiyê û pêkhatiyê, ji ber hêza nivîsandin û nivîsandinê nebûye û wek em dizanin wêjeya folklorê bi ziman ango dewkî ye, piştî bi pêşketina civakê ve xwandin û nivîsandin derkete pêş, wêjeya dewkî a bi ziman dihate gotin hate nivîsandin ku ji têkçûn bê parastin û ji nifşên nû re bê gehandin. Lê em dikarin bibêjin bi xwandin û nivîsandinê ve heta astekê tama kevin kêmbûye, sedemê wê jî ew e ji ber ku ew wêjeyanên ku bi dewkî vegote dikirin her vebêjînek li gor

têgeheştina xwe dikirin û berjewendiyên navçeyî, dem û cîhê xwe yê diyar vegote dikirin, hin caran jî ji ber jibîrkirinê û têkelkirina li gel babetên din jî pêkdihat.

Heta naha ew tişta ku ronî nebûye ew e ku nayê zanîn ew babetên cuda ên folklorîk bi çi armancekê ve hatine nivîsandin, ew nebe folklornas û lêkolînavan û kesên şareza gelek lêkdan û lêkolîn li ser kirin, lê ew lêkdan û lêkolîn gelek cuda ne ji hevdû. Li gel vê yekê jî babetên folklore tameke xwe taybet hene bo hemû gelekê, ji ber babetên folklorîk danisqene, kevnarin û cuda ne ji nivîsên din ên serdema piştî folklorîk.

Helbestên folklorîk jî wek babetên din ên wêjeya folklorê xwediyê wan diyar nîne, li dû yek dest bo dest ji me re mane, dîrokeke wan a diyar tineye, heta naha jî nayê zanîn di çi serdemekê de hatine nivîsandin û kê nivîsandiye û bi çi armancekê nivîsandine, tenê em vê dizanin ku hunereke kevine bo me maye. Zanyariyên zêde jî di wê derbarê de nayê zanîn.

*Nimûneyek ji helbesta folklorîk a kurdî:*

*Henar henar henare*

*derd û dermanim yare*

*Em cejnem be bê tu kird*

*talle wek jehrî mare*

*Yan jî:*

*Name denusim be xwênî dillim*

*Ey dem be şemal bîba bo gulim*

*Naydem be şemal pêç û penaye*

*bo xom boy debem daxim le dilaye('îzedîn , 2010, RR. 74-75).*

#### **2.1.4.2 helbesta Lor:**

Wek lehce yek ji lehceyên zimanê kurdî ye, ku bi lehceyê kurdî yê lorî axaftinê dikin, wek malbend, navçe û ax li wan cîhên ku tê de jiyan dikin jî jê re tê gotin Loristan. (Lorî yek ji tîreyên netewa kurd e, ku beşek giring ê netewa kurd in û ji serdemeke kevin ve li Loristanê dijîn û ji aliyê erdnîgarî jî Loristan, dikeve bakûrê Kirmaşanê û aliyê wê yê rojhilat jî çiyayên Birocerd û Malayare yên aliyê başûrê Xuzistanê hene, aliyê rojava jî dirêj

dibe heta navbera Iraqê û Îranê û ji Xaniqînê ve hata Kendavê) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 B, R. 513).

Di serdemên berê de guman dihate kirin ku (Lor) kurd bin, lê ew yek hate zelal kirin ku kurd in (Lor di serdemên naha de ji aliyê piraniya kurdnas û zana û pisporên kurd û rojhilatnasan ve hatiye lêkolîn kirin û piştrastin ku kurd in û herwaha piraniya xalên kurd ên koçberiyê di wan de jî hene û hêdî hêdî dest li koçberiyê berdan û niştecih bûne.) ('ebas , 2008, R. 130).Di awayê lehce û zimanê Lorî de çend helbestvanek rabûne ku dîroka wêjeya kurdî de serbilindî bi wan tê kirin, herçend ew helbestvanane pir zêde nebûne jî, li gor pêkhatiya kurd di wê serdemê de û li navçeya Loristan de ji aliyê rewşenbîrî û xwendin û fikrî ve ew derfetên pêwîst bo wan jî pêknehatiye ku bi nivîskî ewqas amar bicîh bimîne ku bi awayek be di serdema rojame ya îro de berhemek baş be li berdest mabe, lê li gel vê jî li navçeya Loristan helbestvanek bi navdar û ziman parast rabûne ku buye serdarê helbestên serdema xwe, ew helbestvan jî (Baba Tahîrê Hemedanî ye)

#### **Baba Tahîrê:**

ku helbestvaneke Lor bûye û helbestên xwe jî bi lehceyê kurdî ve nivîsandiyê. ((Baba Tahîr helbestvaneke resen ê sedsala sêyem a hîcrî ye)) (Razî, 1979, R. 9) .Helbestvanên kevin ên serdemên berî zanyariyên temam li ser jiyana û li dayîkbûna wan tineye, lê Maruf Xeznedar li dîroka wêjeya kurdî de bi wî awayî behsa wî dike. ((Baba Tahîr di heyama navbera nivê duyem û nivê yekem a sedsala yazdemîn a mesîhî de jiyana kiriye, ji dayîkbûn û koça wî ya dawiyê di navber salên (937-1010) de ye)) (Marf x. , 2010 A, R. 205).

Ew helbestvane ewqas zanyarî li ser jiyana wî kême ku bi taybet dikare bê gotin bi temamî piştrast nebûye ku navê wî yê temam çiyê, tenê çend tiştê nebe (Navê wî Tahîr e û Baba jî jê re hatiye gotin, ji ber yek ji ferîşte û kesên herî baş ê Ehlî Heqê Yarsan bûye, (Baba) bo rêberên ola Yarsan tê bikaranîn, herwaha (Uryan) jê re gotine, ew jî ne diyare bo wî hatiye diyar kirin an bixwe helbijartiyê, herwaha jêre gotine Hemedanî, ji ber li Hemedan jiyana kiriye û her li wê derê jî koça dawiyê kiriye, di helbestên xwe de jî navê rasteqîn ê xwe bikaraniye di cîhê nasnav de) (Marf x. , 2010 A, RR. 205-209) .

Wî helbestvanê Lor helbest di serdemên xwe de bo asteke baş bilind kiriye. ((Baba Tahîrê Hemedanî wek dahênerê çar rêziyê yê serdema xwe tê pênase kirin, çar rêzî ango çar beytî bi lehceyê lorî pêktê ji (387) çar rêzî û şeş xezelên dirêj)) (Razî, 1979, R. 5) . Baba Tahîr çar rêziyên xwe bi lehceyê lorî nivîsiye, ji ber zimanê fermî yê wî bixwe bûye, di çar rêziyên xwe de dibêje:

*Dilî dîrim zi eşqit gîc û wîce*

*muje berhem zenem xunabe rîce*

*Dilî aşiq be sanî çub ter bî*

*serî sûce, serî xunabe rice. (Elaeddîn, 1395, R. 181).*

Wate: Min dilek heye ji ber evîna te gêj û mêje û serê wî bê çareye, ez ewqas bo te giriyame ku dema çavê xwe digrim, mijûlankên min de xwîn tên xwarê, dilê evîndar, ê min wek tişteke ter û şil e, çawa dema agir berdidî li yek serî ve bo serê din kef û gilîz tê xwarê, ewqas dilê wî bi evîne ve birîndar e.

Baba Tahîr bi xwe ser bi ola Yarsan bûye, wê serdemê li navçeya Loristanê ew ol hatiye pejirandin, bernameya ola Yarsan bi lehceyê (Goran) hatiye nivîsandin, lê di bin bandora (Lorî ) de bûye, Loristan malbenda Yarsan bûye, Baba Tahîr diyalektîka Goranî zanîbûye û du beytên xwe bi diyalektîka Goranî ve nivîsandiye, şarazayiya wî di gelek diyalektîkan de hebûye û bi diyalektîka Goranî ve sirûd ango marş nivîsandine, Yarsaniyan wek marş nivîsên wî dixwandin. Ji ber Loristan nêzîkbûye ji Îranê bandora zimanê farisî li ser pir bûye. ((Lorî lehceyek li zimanê Kurdî, li hemû awayên din ên Kurdî zêdetir nêzîke ji farisî re)) (Kemelê Nuser, 2004, R. 173).

Çar rêziyên Baba Tahîr pir hatine nivîsandin, di dema nivîsandinê de gohertin li ser de pêkhatine, kêmtir ji nivîsên rasteqîn ên morikên Lorî tê de diyare (Herçend zimanê axaftinê û nivîsîna Baba Tahîr bi taybet di çar rêzên wî Lorî pir bi awayek ronî û bihêz diyare, lê ji ber ku zimanê farisî li ser bi bandor bûye, piştî derbasbûna demê re, gelek nivîsên wî gohertin li ser wan çar beyt û çar rêzên wî de hatine û wisa lê hatiye ku hin ji çar rêzên wî tama ziman û lehceya lorî ku bi zimanê Baba Tahîr bixwe nemaye û bêhn û tama farisî têde diyare ) (Fehmî, 2003, R. 31).

Baba Tahîr wek piraniya helbestvanên kurd zimanê helbestên wî pir ronî bûye, bi awayekî helbestên nivîsandine dikare bi asanî li wateya peyvên wî yên nav helbestê bê têgeheştin(Helbestên wî helbestvanî bi zimanê xelkê hatine gotin û behsa girê û pirsgirêkên civakê dike, di helbestên wî de zimanê sade û aşkera hebûye û bi awayekî helbestên xwe dariştîye ku di dilê xwandevan de cîhê xwe çêdike û helbestên wî têkelî helbestvanên berî xwe kiriye.) (Kelsum , 2011, R. 83).

#### **2.1.4.3 Helbestên Goranî:**

Diyalektîka Goran jî yek ji diyalektîka zimanê kurdî ya navçeyêke diyar a başûrê Kurdistanê ye, ku bi vê diyalektîkê ve helbest hatine nivîsandin. (Goran wek lehce kom û civakek, eşîret û yekgirtina eşîran bikartînin, ku kom civakeke li qirax û binarên çiyayên Zagrosê belav bûne û li çiyayên aliyê bakûr ên rêya Bexda-Kirmaşan dijîn. Li navçeyên Goran lê niştêcîhin, xelkên wan deveran hin ji wan koçberin û hin ji wan jî niştêcîhin û li ser rubar û çemê Sîrwan û navçeyên cuda ên her du Hewramanan dijîn. Armanca me ya gotina du Hewraman, Hewremana Lihon, ku li rojavayê zincîre çiyayên Zagrosê ye, Hewramanê Text jî li rojhilatê zincîrên çiyayê Zagrosê ne, Hewramanê Lihon û Hewramanê Text gel û eşîretên mezin û berfireh tê de niştêcîhin û bi diyalektîkê Goran axaftinê dikin.) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 B, R. 18).

Diyalektîka Goran diyalektîkeke giring ê zimanê kurdî bûye û pir berfireh bûye, lê wek tê xwastin giringî jê re nehatiye dayîn. (Giringiya diyalektîka Goran di zimanê kurdî de di asteke bilind de ye, lê ji ber bê derfetiyên gel û netewa kurd, giringiya wê ya di zimanê kurdî de jî kêmbûye, diyalektîka Goran jî ber wê şepolê ketiye û ji diyalektîkên din kêmtir nirx jê re hatiye dayîn, herçend bo heyama çend sedsalan zimanê wêjeyî yê mîr nîşînî Erdelanî bûye jî, li gel wê yekê jî dîsa ew nirxê pêwîst jê re nehatiye dayîn.

Ev diyalektîk wek zimanê wêjeyî beşek zêde başûrê Kurdistanê dagir kiriye û xwedî dewlemendiyeke wêjeyî ye, li gor diyalektîkên din helbestên herî kevin bi diyalektîka Goraniye, xwedî berhemên olî ye ku bi diyalektîka Goranî ve hatine nivîsandin "Helbestên ola Yarsan" ku oleke mezin ê serdemê kevin bûye û xwedî alîgirên zêde ye) (şêx 'abdulmumînî , 2007, R. 11).

Maruf Xeznedar nivîskar û lêkolînavanê helbest û wêjeya kurdî ye, bi vî awayî behsa giringiya helbestên Goranî yên ola Yarsan dike: ((Kakeyî diyalektîka Goran zimanê wan ê

olî bûye, ji ber kakeyîyan Şarezor kiriye zemînê xwe yê erdê pîroz û di wê serdemê de ziman li Şarezor Goranî bûye û di wêjeya olî ya kakeyîyan jî bi helbestê destpê kiribû û heta naha jî maye)) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 B, R. 20).

Ola kakeyî wateya wî Ola (Ehlî Heq e) ku ser bi ola Yarsan e. Diyalektîka Goran ji diyalektîkên din zêdetir helbest tê de derketine û pêşkete, em dikarin bibêjin destpêka helbestên klasîk ji vê diyalektîkê ve navbang derxistiye (Ew navçe û erdnîgariyên ku Goranan tê de jîyan kirine di dîrokê de, di wan serdeman de diyalektîka ziman ava dibû, gelek berfireh bû, gelek mezin bû ji destpêka wêjeya kurdî, ku wek tê naskirin wateya helbesta klasîkî bi diyalektîka Goranî bû. Di diyalektîka Goranî de babeta diyalektîka biçûk rengdana wê di wêjeyê de ronîtir û aşkeratir dikeve berçav, ew jî tê wateya ku helbesta kurdî bi diyalektîka biçûkên diyalektîka Goranî dibînin.)) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 B, R. 21).

Li gor diyalektîka Goran dewlemend bû di bikaranîn de û berfireh bû ew derfete jî bo avabû ku bibe landik û dergûşa helbest û wêjeyê û em dibînin gelek helbestvan û rewşenbîr derketine, bi vê yekê jî helbest û wêjeya kurdî dewlemend kiribû û bû mîrasek bi rûmet bo netewa kurd pê serbilind bibe û dengvedana wan di dîroka wêjeya kurdî de heye û navê wan jî zindî ye. (Ewên ku bi Hewramî helbest honandine li navçeyeke berfireh tîn dîtin li Kirmaşan, Hewraman, Sine, Silêmaniyê, Germiyan, Kerkûk û Tîreyên Caf, Zengene, Hemewend, Cebârî. Ew helbestvanene gelek in ku bi awayê lehceya Goranî helbest honandine û navê wan berdewam zindî ne, di helbest û wêjeya kurdî de. Nimûneya wan jî "Bêsarani, Mela Perîşan, Mewlewî....Hwd" Herçend hin ji wan helbestvanên ku bi wî lehceyî nivîsandine hin ji wan cîhê rûniştina wan ew navçeyane nebûn ku zimanê wan ê axaftinê wek lehceya Goranî be, herwaha wêjeya Goranî babetên wê cor bi corin, wek aliyê fikir, felsefe û ol, lê ew ji hemûyê giringtîre ku hemû ew nivîsandinane bi helbest hatine honandin.) (Newşîrwan , 2012, RR. 238-239).

#### **Bêsarani:**

Helbestvaneke kevin ê kurd e, bi diyalektîka Goranî helbest nivîsîne, xelkê gundê Bêsarane, (Ev helbestvane payebilinde, yek ji stêrkên navdar ên helbesta kurdî ye ku navê

wî (Mistefayê kurê Qugib Didîn)e, di navbera salên (1053-1114 z) jiyana kiriye) (Sdîq , Mêjuy Wêjey Kurdî, 1375 A, R. 422).

Helbestên wî helbestvanê kurd cor bi corin, di hemû babetekê de helbest nivîsandine, aliyên olî û civakî û evîndarî û xweşikiya xwezayê. Di helbestên wî de rengdanek girîng hebûye. Yek ji nimûneyên helbestên Bêsarani:

*Hay rehmet ew qebir sewdayî kamil*

*Ser meşq meynet Bêsarani menzil:*

*Yane wêrani her wemin aman*

*Metaw û girtey ke sêwî daman . (Sdîq , Dîwanî Bêsarani, 1392, R. 9).*

#### **2.1.4.4 Helbestên Kurmanciya Jorîn:**

Kurmanciya jorîn yek ji diyalektîka zimanê kurdî ya ku çend navçeyek di nav axa Tirkiyê de bi vê diyalektîkê axaftinê dikan, herwaha çend navçeyek jî li parêzgeha Duhokê bi wî lehceyê axaftin dikan. Ji aliyê wêjeyî ve Kurmanciya jorîn heta bêjî dewlemende û helbestvanên pir mezin û payebilind derketine û bi sedsalan piştî wan jî heman rêya wan ji aliyê gelek kesan ve hatiye girtin û gelek destanên girîng û mezin li wan navçeyan bi berhem hatine, ku her zindî dê bimînin û bandoreke wan a girîng jî li ser diyalektîkên din hebûye, Ev yek wateya mezinî û nirxê vê diyalektîkê nîşan dide. Nimûneyên wan helbestvanan jî (Ehmedê Xani, Melayê Cizîrî, Melayê Batê) (Bajarê Cizîrê xwedî bingeh û pêşketin û wêjeyê bûye, û bi lehceya Kurmanciya jorîn de gelek helbestvanan bi wî lehceyî helbest nivîsandine, bi taybet em dibînin helbestvan hebûye xelkê wan navçeyan jî nebûye, lê bi vî diyalektîkê helbest nivîsandiye û ji ber vê jî vê lehceyê heta asteke girîng pêşketibû, ku ewqas bi bandor bû ku wan helbestvanan bi vî lehceyî helbest nivîsandin û bandoreke mezin li ser wan ava kiribû.) (Lêjneyek le Wezaretî Perwerde, 2014, R. 138). Nimûneya wan helbestvanên ku dengê diyar ê wan hebûye di helbestên Kurmanciya jorîn de helbestvanê mezin (Melayê Cizîrî) ye.

#### **Melayê Cizîrî:**



Helbestvaneke mezin û xwedî payeyeke bilind ê din jî bi navê (Ehmedê kurê Mihemed e, û di sala 1567 li bajarê Cizîrê li dayîkbûye û di sala 1640 de koça dawiyê kiriye.) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 B, R. 289).

Nimûneyek ji helbestên Melayê Cizîrî:

*Çîn çîn kirin zulfên siya kesk atlasa dîba qeba*

*Êdî nîşan nabin xuya têkel kirin lazim seba*

*Min dî seba dayê seher madarê bedrê kir du ker*

*Qews û qezeh jê hate der dîsa bi zulfanra teba. (Mamosta Hejar, 2014, R. 33)*

#### **2.1.4.5 Kurmanciya jêrîn:**

Yek ji diyalektîkên zimanê kurdî û beşek girînge, li navçeyên başûr de ev lehceye tê axaftin û ji aliyê wêjeyî ve dewlemende, lê berî salên 1800ê ji aliyê wêjeyî ve pir lewaz bûye, bi taybet jî ji aliyê helbestê ve, ew jî ji ber hin sedemên xwe yê taybet hebûne ku wek em dizanin helbest di nav xelkê de di salên 1800an de li nav zaravayê Kurmanciya jêrîn de nehatiye bikaranîn. Zimanê zaravaya Lor û Goran bi têkelî zimanê bav bûne zêdetir ew zaravayane hatine bikaranîn, bi taybet di helbestê de, li gore w çavkaniyên dîrokî ku li berdestin, helbestên bi zaravayê Kurmanciya jêrîn berî dibistana helbestî ya (Nalî û Salim û Kurdî) helbestên bi zaravayê Kurmanciya jêrîn tineye, yê hebin jî bi awayê mîliye. ((Wêjeya mîlî ew wêjeye ku bi awayê asan hatiye amade kirin, jê têgeheştin ji piraniya xelkê re nêzîke û dikeve ser ziman, an jî nivîs û xwediyê wê û roj û serdema wê diyare, bi formê cor bi cor agahiyên li ser pêwîstiyên civakê dide.)) (Îdrîs , 2014, R. 93).

Helbest yek ji babetên wêjeya mîlî, ku xwediyê wê diyar û ronî ye, zêdetir babetê çîna ne xwandekarane, piraniya wan peyvan jî ku babetên cuda ên wêjeya mîlî ku tên bikaranîn bi zimaneke pir sade û ronî û aşkera ye, ku zimanê xelkê asayî ne tê darijandin, wêjeya mîlî ya kurdî jî di serdemên berê de xwedî nirxeke mezin bûye û bi hemû zaravayan helbestvanên me hebûne ku awayê mîlî nivîsandine (Elî Berdeşanî) yek ji wan helbestvanane ku bi awayê mîlî helbest nivîsandiye.

### **Elî Berdeşanî:**

Helbestvaneke mîlî ya nave (Elî Berdeşanî navê wî Elî yê kurê Ebdula ye, bi Elî Berdeşanî hatiye nasîn û di sala (1185) de li gundê Berdeşan ji dayîkbûye, her di zaroktiya xwe de feqetî xwandiye, li bajarê Silêmaniyê xwendina xwe tamam kiriye, bû helbestvanek taybet (Osman paşayê Baban û Ebdurehman Paşayê Baban) Wê serdemê de desthilatdar bûne, jiyaneke pir bi xweşî birêve biriye, di sala (1228)ê de koça dawî kiriye) (Sdîq, Mêjuy Wêjey kurdî, 1375 B, R. 465). Elî Berdeşanî xwedî dest û payeyeke bilind bûye di helbest nivîsandinê de, li ser gelek aliyên jiyana civakê helbest nivîsandine, bi taybet aliyên evîndarî, civakî, olî û bi awayê mîlî helbest nivîsandine, ev jî nimuneyek helbestên wî ye:

*Bo wa tement dawete bada  
xo em cwanî ye xwa be kes nada  
Were giyanekem xo berdeşanî  
dûr kewtey toye le gişt xoyşanî . (Sdîq, Mêjuy Wêjey kurdî, 1375 B, R. 467).*

Ew helbestvanane rûniştavanên wan cîha bûn ku ziman û zaravayê Kurmanciya jêrîn zimanê wan ê serekî bûye, lê bi awayê Goranî helbestên xwe nivîsandine, ji ber wê demê zimanê Goranî zimanê pir belav û zimanê nivîsandinê bûye. ((Piştî ava kirina bajarê Silêmaniyê ew bajar bû malbenda herî giring a rewşenbîriya kurd, ji bo zimanê wêjeyî yê yekgirtî derkeve hole û bibe bingehê zaravayê Kurmanciya başûr ango jêrîn)) (Umêd , 2001, R. 105).

Êdî ji wê demê û şûnde, helbest di Kurmanciya jêrîn de gohertinên mezin tê de pêkhatin û ber bi pêşketinek mezin ve çû û giringiyeke zêdetir jê re hat dayîn û li gor diyalektîkên din (Helbest nivîsandin li ser awayê diyalektîka Kurmanciya jêrîn, li gor diyalektîkên din ên zimanê kurdî awayek nû bû, ku di hemû diyalektîkên din zêdetir ket nav pêşketinê, ew jî dibe ku sedemên xwe girêdayî be bi rewşa siyasî ve, ku zêdetir li navçeyên Kurmanciya jêrîn nermbûnek hebûye. Vê diyalektîkê xizmeteke mezin kiriye û li gor wan belgeyên ku li ber dest hene, ku pirtûk, kovar û rojname bi vê diyalektîkê hatine çap kirin û belav kirin û ferhenga taybet bo hatiye nivîsandin.) (şêx 'abdulmumînî , 2007, R. 12).

## 2.2 Helbestên serdema Mistefa Begê Kurdî de:

### 2.2.1 klasîk li ser rêya zarava anglo lehce ve:

Em dikarin di hemû zaravayan de kurteya peyvên klasîk bibînin, lê belê cudabuneka kêma ya pêyvê dibînin, di hemû şewazan de jî heman wateye. (Ev pêyve bi çar şeweyan di wêjeyên cuda de dikevin ber çav ( kılâsî, kılâsîk, klasîkiyet, klasîzim) ev peyvana her yek ji wan li şeweyekî de hatine. Li gel Ewropîyan(klasîzm)e, li ser binemaya peyva Yûnanî hatiye çêkirin ku peyva( klas) eve mijareke sade ya paşgirtina(îzm) a xirikiye ser mebestê di vê peyva nivî de li rêzimanê latînî de herdukan bi hev re dibine Kılâsîzim. Di zimanê kurdî de (Klasî) jêre tê gotin, di zimanê Îngilîsî de jêre (klasîk) tê gotin ) (îdrîs ' . M., 2006, R. 15).

Nivîskar û akademîsyenên Ewropî bi hemû wêje û hunerên sedeyên navendî û heta sedsala nuzdehemîn jî dibêjin klasîk, mînak ji berhemên kevin yên serdema destpêkê re dibêjin. Ev zaravaya ve bi şevazekî din jî hatiye gutubêj kirin ku ew jî (textîd kireye) ye ( Arîsto ku damezrînerê tewriyên wêjeya klasîk ya Yûnane ev Fîlozofê navdar ji bo wî wisaye ku wêje textîda vekirinêye, Herwaha Horas fîlozofê Romanî ku binemayên xwe karê wêjeyê ya dariştî li serdema xwe de, ev fîlozof ji nivîskarên walatê xwe daxwaz dikir ku bi berdewamî textîda karên pir biha û dahênanê Yûnaniyan bikin, ev fîlozof dayenîşandan re Yûnaniyên kevin ku nimunene û bala fîlozofên walatên din ji aliyê xwe de dikşandin) (îdrîs ' . M., 2006, R. 16).

Klasîk yek ji rêbazên wêjeyî ye di bingeha peyva Yûnanî de pir can bi wateya kevin tê, weku(nav) ji bo vê rêbazê bi kar tê, ev rêbaza armanceke wê ya ku hatiye diyar kirin heye li çar çeveya sînorekî diyarkirî de, bi wata ser nivîsa hemû berhemên wêjeyî ne li dîrokeke diyarkirî de kar pê hatiye kirin li ser yasa û berhemên Yûnanî û Romanî yên kevin.

Klasî berhemên netewî yên hemû gel û miletekiye, pênaseye ji bo giraniya wêjeyî ya raburiyê ya wî miletiye. (( klasîk bi wan hemû berhema re tê gotin ku mînaka wêjeya niştîmaniye k udi hejmêrin û hêjayî serbilidiya wêjeya netewî ya wî walat û niştîmanêye.)) (Reza, 2006, R. 17). Klasîk ji berhemên kevin re tê gotin, yek ji rêbazên destpêkê yên wêjeya Cîhanê ye, ku pêşengê hemû rêbazên wêjeyê ye ev jî di dawiya vê rêbazê de hatiye dewama klasîkan girîye. Destpêka destpêkirina rêbazê klasîk ji bo serdema şanzde

ya mîladî digre em dikarin bêjin ew dema serdema (Ronesans) ê buye, serdema serhildan û pêxistineke wêjeyê bu.

### 2.2.2 klasîka Ewropa :

Klasîka Ewropa rêbaza herî kevin ya wêjeyî ye ku li Ewropa derketibê, ku di serdema hivdeh û hîjdeh û nîviya sedsala nozdeh de serî hildaye li ser bingeha klasîka Yûnanî û romanî de. Serhildana wêjeya klasîk li walatên Ewropî de dema serhildana wan cudabuna wê tede ye her yek ji wan li dem û serdema cuda de peyde bune( klasîk di wêjeya Fransevî de li naverasta sedsala şazkeh de destpê dike(1630-1660), klasîk li Îtalya de li sedsala hejdeh de(1700-1803) gihîşte lûtkeyê, klasîka Brîtanya de di sala(1600-1700) serî hildane, wêjeya klasîka Elmanya di sedsala şanzkehemîn de nekarî li serdema Rênosansê de tu berhemeke wê ya klasîkî hebe ji ber wê di berhemê de guhertineke mezinde bû lê belê di sedsala hivdemîn de kariye bigêje bi klasîka Fransa û Îtalya bi şeweya texlîd kirimê, bi vê jî qonaxa wêjeya li Elmanya yê di sedsala hejdemîn de destpê dike (1729-1781) Ji me re ev derdikeve ku serhildanên klasîk di nav gelan de cudaye.) (Ferhad , Rêbaze Edebîyekan, 2006, R. 43). Dîroka wêjeyê jî 39; rêya klasîkê di serdemên cuda de bi pir qonaxên cur be cur de têper buye, klasîka Ewropa yê di serbinçîneyeke felsefeya girîng damezrandibu û nivskarên klasîk yên Ewropî pêrevî ya destûrên Yûnaniyan yên kevin dikirin û çend çavkaniyên tewrî û metodî ango mebde û felsefî hebû di serî de dirawîştin.

Klasîka Ewropa hejmareke zêde ji aliyên wêjeyî li xwe gitibû, weku (şanoname, gotar, çîrok,roman, û mijarên tirajîk û komêdî... Hwd), (pir caran ew berhemên wêjeyî yên kevin û derûn bi taybet ewên ku mane di her walat û dinava her miletekî de bibin xwedî binema û rêya qebulkirinê ewna bi sifeta klasîk diyar dikin berhemên wêjeyên xwe ye klasîk di wê berhemê de.Divê ku bi dibistana klasîk ve pêywîstin û kar bi vê binemayê rênîşan dikin ku klasîk jêra ecibandiye) (Mus'eb, 2012, R. 105).

Rêbaza kilasî ya Ewropayê rêbaza herî kevin ya wêjeyî ye ku li Ewropayê derketibe, wêjeya kilasîk çend taybetmendiyeke xwe heye ku di rêbazên din re cuda dikeve.

Wêjeya klasîk çend taybetmendiyeke wê hene ku di rêbazên din cuda dibe ew jî texlîdkirina wêjeya kevin ya Yûnan û Romaniyane ku bi baweriya wan pêşekî bune û hêjayî texlîd kirinê buye û taybetmendiyeke din ya klasîk ew buye ku li pey eqil karên xwe derbas

kirine, eqil ji aliyê klasîkan bingehê serekî buye bi taybet ji bo aliyên wêjeyî, herwaha nêzîkê babetan li rastiye de yeke din di binemayên klasîk, ji wan re waha buye ewên li ser helbestvan pêwîste bi rastiyanê helbestên xwe darijîne û runîtiyê lê derbirîne de û bi şewazeke sade û berçav, û herwaha klasîk agahî bu li behaya xweşikiyên rewşê de, ev rêbaz babetên wê gîştî bûn neku hemû nivîskar û rêberên klasîk ji bo bingehê wê dizanin ku babetên klasîk divê gîştîgir bin û ji bo xizmeta gîştî be, li gel wan jî kurt û binemayeke girîng ya klasîk bun, û babetên klasîk li pey aliyên jiyana mirov de bê. Bi pey belgeyan wan ferz dikin ku bingeha taybetî jî klasîk (textîd kirina wêjeya kevin, dahênan ji ber runahiya eqil, di rastî de çawa, peyambar bûn, rewş parêzî, girîngî dana bi mirov, wêjeya gîştîye neku kesî, rûnî, Mesîhiyet, parastina sê yekitiya di şanoyan de (dem û cîh û mijar), kurt birî, jiyana li raboriyê) (Îdrîs ' . M., 2006, RR. 25-33). Rêbaza klasîk ya şoreşgerî mezin bu di wêjeya Ewropayê de hat ji bo gerdunê ji cemê çend sedsal bi şeweyekî cuda li walatan de pêwî dikin ev rêbaz dirêje anîbu çend qonaxekî din bo pişt xwe de anî weku rêbaza wêjeyî peyrewî dikir.

Di nava vê rêbazê de çendîn kesayetên wêjevan û helbestvan û nivîskar bûn ji bo rêberên rêbazên li pişt xwe de, rêbaza klasîk bû sedema geşekirina eqil û hêza fikir û guhertina di nava gelên cudade (klasîk di Ewropa de çendîn sedsal dirêj kiriye heya wê dema şaristanyeta Ewropa geşe kir û gohertin li ser de hat li gel wan guhertinan jî bîr û baweriyên civakên mirovahiyê kêmkê berbi guhertin diçû, nivîskar û rewşenbîr û pêşengên rêbazên klasîk êdî bêzar bun ji nivîsa bi vî rêbazê heya ku waha lê hat nivîskar giheştine wê baweriyê ku klasîk berhema eqle, eqil jî sînor bo hestên din dide ku eva azadiyê ji nivîsê dagir dike, klasîk ji wê tê gihiştin ku ev rêbaz li gel eqliyeta mirovê serdema taze guncav nabe êdî hêdî hêdî hewldan di sînorê vê rêazê eqliyeta xwe derbaz bikin, şewazeke din ji bo nivîsên xwe peyde bikin û rê û rêbaza klasîk biguherin) (Ferhad , Rêbaze Edebîyekan, 2006, R. 45). Rêbaza klasîk girîngiyê wêya temam hebû berbi pêşveçûna asta rewşenbîriya gelên gelên Ewropa û Cîhan bu ji ber dahatin û serhildanên çendîn rêbazên din li davîya xwe de, rêbazên pey vê qonaxa klasîkya xwe bi samana netevî dizanîn waha li pêşengên rêbazên pêy xwe kir ku fikir û nêrîn û şîroveyên xwe bi şewazekî din be ji bo hemû aliyên cuda yên di nava civakê.

### 2.2.3 Klasîka kurdî :

Eger em bikarin behsa helbestên klasîk yên kurdî bikin divê vegerin serdema helbestvanên şêwe zarên Lurî û goranî û kurmanciya jorîn, ji ber ku ew li serdemekî kevintir de destê xwe birine bo helbest û wêje roleke wan ya mezin jî hebûye li wan rojgaran de. Lê belê ewa li vir de mebesta meye helbesta klasîka kurdî bi şêweya zarî ya kurmancî ya jêr ya navçeya Silêmaniyê ye, helbesta bi vê şêwazê nebu ye û ew jî hebe bi şêwazê netewî lewra, ji ber wêya (Mistefa begê Kurdî) helbestvanê şêwezarê kurmanciya jêr bi xwe jî yek ji damezrînerê helbesta klasîk a kurmanciya jêr ya navçeya Silêmaniyê.

Her li gel bi bingeha bajarê Slêmanî û bûna paytexta Mîrnişînê (cihê mîran) Baban êdî Slêmanî vejiya ye û rewşenbîrên mezin tê de derketin çendîn mizgeft ji bo xwendinê hatin ava kirin gelê wî bajarî jî zarokên xwe dixistin ber xwendinê û zêdetir di wê demê de xwendina Feqiyetiyê li pêş buye, her di wê rêkê ve fêrî xwendin û nivêse dibun û herwaha fêrî zimanê Erebî û Farsî dibun hêdî hêdî çîneke xwedekar hate pêş. helbest di wan navçeyan de bi şêwaza sitran pir bû gihiştine lûtkeya helbestê klasîka kurdî di geşekirineke pir de bû lê li gel hatina vê qonaxa helbestiyê Kurmanciya jêr êdî hêdî hêdî helbestên şêwezarên Goran sitêrka bexta xwe ber bi lewaztiyê ve çû. ( herçend li navçeya Slêmaniyê de zimanê Goran ewqas pêş nebu ye, lê helbestên Goran hemû navçe girtibûn li navçeya Slêmanî yê de şêwezara kurmancî ya jêr zimanê fermî yê gelê navçeya Slêmaniyê bû herdû diyalektîkên ( dûalî) Goran û kurmanciya jêr bandora xwe li ser hev dû hebû li gel wê jî herdû diyalektîkan parêzvaniya nirxên xwe dikirin, ku çî li gel hatine Mîrnişîna Babana û ava kirina bajarê Slêmaniyê û dest çuniya wê malbatê wisa kir ew navçe geşeyeke berçav ji xwe ve bibîne, bi vê jî zemînek ango bingehek li ber raxist ji bo diyalektîka kurmanciya jêr ta ku bi şêweyekî berbelav kirî xwe bşke êdî haya wisa lê hat diyalektîka Goran kete lêjiyeyê li gel wê da jî diyalektîka kurmanciya jêr hemû navçeyên diyalektîkên Goran dagir nekiriye) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 C, R. 47).

Navçeya Slêmaniyê li ser helbest û wêjeyê ve çirûska xwe pêşerojê geş lê dihat dîtîn. Çendîn helbesvan peyda bûn di dîrokeke diyarkirî de. (( piştî çêbûna bajarê Slêmanîdi sedsala nozde de li ser destê (Nalî) û (Salim) û (Kurdî) derket. Zaravayê nivîsa kurmanciya jêr taybet bu ( şêweya Slêmaniyê), ev qonax heta daviya şerê cîhanê ya yekem berdewam bû)) (îdrîs ' . M., 2006, R. 41). Şêwaza helbesta kurmanciya jêr palneriya

xwe li piştê ve bûye ji ber xweve nehatiye bingeh û rêbaza pêşandana xwe girtine (rêxistina helbestên kurmanciya jêr li ser binçîneya helestvanên pêşiya xwe bi şeweyeke zaravayên din peyde bû.

Helbestvan damezrîner yên vê qonaxa helbestiyê xwendewariyeke wan ya baş hebû. Şarezabun di zanistên wê serdemê pir baş li helbestên klasîk yên navçeyên dewruberên xwe ghiştibun li ser rê û cihê ceribandînan helbestên klasîkên navçeyên dewruberên xwe ev rêbaza danî ku bi şeweyekî be wêneya civaka Kurdî tede reng bide. (Nalî û Salim û Kurdî) ev sê helbestvan bi wê tînan nasîn ku damezrînerên vê mektebê bûn, ev hereketa helbestiyê jî ji ber berhemên wan ve ava bûn) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 C, R. 54).

Ev helbestvan pir bi bandor bûn li ser civaka navçeya Slêmaniyê li hemû rêyekî ve di serdema wan de zanist û wêje vejîya ye, berhemên wan hêjayî balkêşiya civakê bûn. (berhemên Nalî û Salim û Kurdî di nava takekesên civakê û mela û rewşenbîrên kurd li Kurdistanê belav buye çendîn kes bi rêya wan ketin nava helbestên nivîsî) (îdrîs ' . M., 2006, R. 40). helbestên nivîskî bi diyalektîka kurmanciya jêr diyardeyeke nû bû, ji ber ku pêştir bi vê diyalektê helbest nehatiye nivîsandin ( serhildana helbestên kurdî di nîviya sedsala nozdan de li navçeya Slêmaniyê teqîye, ev geşekirin û ber bi pêş çûn ji ber dahênan pir behayên helbestên çend bû bi vê diyalektîkê ew jî ( Nalî û Salim û Kurdî) bûn) (Nêçîrwan , 2016, R. 69).

Ev sê helbestvan di nava kurd de bi (sê koşeyên Baban) bi navbang, nikolî li wê nayê kirin ku ev sê koşeyên Babana rêber û damezrînerên vê qonaxa helbestiyê bûn. Ev şewaza helbestan aniyê kayê û helbestên kurmanciya xwe ya jêr jî aniyê rêza pêş de û xwe jî kirin ser nivîsa vê rêbazê, bûne rêşikênên vê rêbaza helbestê nivîsîn ji bo helbestvanên serdemên xwe û yên pêştir xwe, ev sê sitêrkên asimaniya helbesta klasîka kurdî geş kirine, helbestvanên kurmanciya jêr navçeya Slêmaniyê bandora zimanê ( Farsî û Erebi û Tirkî) hebû li ser wan, Bi sedema nêzîkî sînorê Kurdistanê li Tirkiye û Îranê û navçe niştecihên nava Iraqê. ( ji ber cihê erdnîgariya navçeya Slêmaniyê li rojhilat re hev sînor buye li gel Îranê li aliyê bakurê walatê Tirkiye bu ye, û herwaha peywendiya bazirganî li navbera Slêmanî û Kirmanşan û Bexdad hebu ye, û zêdetirî helbestvanan serdana walatê Tirkiyê kirine û li gel wan de jî mizgeft û medrese bi zimanê Erebi û Qoran ê dixwand û

komek pirtûkên farsî dixwandin bandora wan hebu ye li ser çenda navçeya Slêmaniyê) (Newşîrwan , 2012, R. 444).

Li cihê bandora devre ev sê helbestvan bandora wan li ser hevdû hebu ye, ji ber ku bi hev re mekteba xwe ya helbestê damezrandine û di yek serdemê de jiyan kirine û bi hemû rewşekî de derbas bûne û li ser heman rêbazê helbest nivîsî ne û temenê wan jî li yektir nêzik bu ye, demekî navê yek ji wan dehênrêt navê wan duyên din jî tene ser ziman, ku behsa helbestên klasîka kurdî jî tê kirin rasterast fikir û bala me li aliyê van sê helbestvanên nivîskar ve diçe, nêzîkiya wan li yektir e xebata ber bi pêşve çûna helbesta ya navçeya Slêmaniyê buye, Salim û Kurdî pismamên hev bûne û ji (Nalî ) ve nêzîk bûne (( hevaltiya di navbera ( Nalî ) û ( Salim) û ( kurdî) û ji heman cihî niştecih bûn hevdû bi renekî bi hevgoherînekî têgihiştî û nêrînên hevdû li hev bigre û ji bo xwe bingehê girîng ya pêkhatiya mekteba helbestên wan buye)) (Avan , 2013, R. 44).serîde nêzkbûna wan ji hevdure fikir û nêrînên wan yê weke hev hebûne û xwe weke kurdekî resen zanîne û şanazî ji kurdbûna xwe kirine (( şanazî kirin bi ziman û rê û resm û çanda neteweyî, bûne xebat û bingeha xolqandinê û serhildan û rêzîkên wan rêbazekî Erebî nû û pêşketî, milbi milê fikir û felsefe û huner û wêjeya gelên rojhilaa dever û bera kurd li Ereb û Rom û Ecem.Helbestvanê Baban ( Nalî, Salim, Kurdî) bi zimanê kurdî ew huner û wêjeya xwe xistin rê, eve li ser rêya wêrekî û hişyariyê re buye. )) ('usman , 2009, RR. 29-30).ev jî di helbestên wan de piştrast bû ku pir şanazî bi zimanê xwe kirine.

#### **Nalî :**

yek ji sitêrkên geş yê helbesta klasîka kurdî, û herwaha kesekê ji damezrînerên mekteba helbesta klasîka kurmanciya jêr, nasnavê ( Nalî ) di helbestên wî de ji bo xwe daniye. Nalî navê wî ( Xidir kurê Ehmedê Şaweyşî Elî Mikayîlî ye li sala 1797 zayînî li dayîk buye û herweha li sala 1855 zayînî çûye ser dilovaniya xwe) (Elaeddîn, 1395, R. 243) di helbesteke ku şanazî bi kurd bûna xwe kiriye û dibêje:

*Tebî şeker barî min, kurdî eger însa deka,*

*Îmtîhanî xoye meqsûdî, le emden wa deka .(Mela 'ebdulkerîmî ,Dîwanî Nalî, 1391, R. 102).*



Wate: hêza şîrîn dixweze bi zimanê kurdî helbest binivsîne, nek ji ber ku zimanê kurdî zimanê mine û bi hêsanî dikarim bi kat bînîm û helbestê pê binivsînîm û nikarim bizimanê din helbest binivsînîm ji ber wê ku dixwazim tiştekî nû bikim zimanê xwe ji ber ku zimanê min tiştekî wê kêmtir nîne ji zimanên din.

**Salim :**

Helbesvanekî binavbang yê helbestên klasîk ya kurdiye di kurmanciya jêr de, kesek buye ji desteya damezrînerên mekteba helbestên klasîka kurdî, nasnavê (Salim) ji bo xwe hîlbijartîye. Navê Salim Ebdulrehman begê kurê Mihemed begê Qere Cehenem ê kurê Ehmed bege, ji malbata Sahêb Qirane û pismamê Mistefa begê Kurdî ye, li sala 1805 ê zayînî li Slêmaniyê ji dayîk buye û li sala 1865 ê zayînî her li Slêmaniyê çûye ser dilovaniya xwe).(Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 C, R. 155). Salim jî di helbestekî de şanazî bi zimanê kurdî re kiriye û dibêje:

*((mepars zbanim gift : Salim, şîrh halt gu ))*

*wutim : Cana ! Belled nîm yêgîlahî êwe ,min kurdim.(Mela 'ebdulkerîmî , Dîwanî Salm, 2015 A, R. 435).*

wate: yara min ya Fars ji min re got Salim bi zimanê Farsî behsa hal û rewşa min bike, çawayî başî?? Min jî got cana min ez zimanê we re şaraza nînim û ez Fars nînim kurdim û zimanê min kurdiye. Salim zimanê Farsî zanîbuye lê ji bo wî bi zimanê xwe ku zimanê wî kurdiye xwaştir buye ku biaxive ji ber ku şanazî pê kiriye û ji bo wî rewşa nebuye ku bi zimanekî din biaxive waha gotiye.

Herwaha Mistefa begê helbestvan jî wek şêweya wan şanazî kirina bi zimanê xwe li helbestekî de dibêje:

*Melên (hîcrî), le ( zîd) a, (kurdî) ye, bîlla le heşrîşa*

*(bi kurdî), (kurdî),de waçî heqî kurde û her eysênê .(Mhemed ,Dîwanî Kurdî,2010 B, R. 251).*

wate: helbestvan berê xwe dide hemûyan û dibêje nebêjin hîcrî mebest ew bi xwe ye, tenê ew dema ku dûr be li walatê xwe ku Kurdistane zimanê kurdî ji bîre û xema Kurd û

Kurdistan dixwe û tenê di wan deman de cihê wê li bîrêye ji ber ku hemû dem û li hemû cihêkî bi kurdî diaxivim û zimanê mine û li roja daviyê de jî li wê dinya yê dîsa bi kurdî li ser xwe û dîne xwe dikim ji ber ku ez kurdim û bi kurdî diaxivim her bi zimanê xwe mafê neteva xwe werdigrim. Ev li şanazî kirinê tê bi zimanê xwe ve ku zimanê kurdiye.

Ev herdû helbestvan ( Nalî û Salim) weke ku me got bandora wan li ser kurdî hebuye û heval û hevkarên hev bûn( şopdarê helbest û wêje di serdema ( Nalî û Salim û Kurdî ) giyan û rurê kurdîtiyê nû kir, ew zimanê ku wan bi helbestên xwe dinivsiye bi sedema wê bi kar anîne lêhatinên wan ve bû zimanekî wêjeyî û hêja û resmî heta hêdî hêdî hemû navçeyên Kurdistana Başûr dagir kir) ('usman , 2009, R. 31). ev giyana yekgirtî û nêzîkatiyên wan wisa kir ku asta wêjeyê bigihêje payê.Ev sê helbestvan ew qas bi hev re nêzîk bûne ku weku dibînin li çend cihan de nivîskar û lêkolînerên helbesta klasîka kurdî helbesta van helbestvanan li gel wî guheriyê û ya wan bi ya vê zaniye, ya van bi ya wî zaniye taku naha jî yekalî nebuye ya kîjan ji wane, lêkonerên kevin nînin li ser kiriye hindêk bi ya Nalî dizanin û hindêk bi ya Mistefa beg dizanin heya dema çapkirin ango tomar kirin û li hevdana dîwana Nalî ji aliyê ( Mela Ebdal Kerîm Muderrîs) ve û kurên wî bi helbestên Mistefa begê kurdî zanîne lê belê evana rabun bi rêxistina vê dîwanê dibînin ev helbestana daye pişt Nalî, bê guman wan jî li pey nivîsên kevin evana darijandine.

Lê belê dema ( Mihemed Mistefa – Hemebor) divana Mistefa begê Kurdî Sahêb Qran nivîsiye û li hev daye, ev helbest daye pal Mistefa begê Kurdî, bêguman ev jî belgeya xwe hebu ye û ewa ku run û aşkeraye vana hest bi rêxistina vê dîwanê dibînin ev helbestana daye pal Nalî, bêgoman wan jî li pey temamiya wê pişt rast nebuye, ji ber ku belgeya yekalîya me ya vekirî li ber dest nîne. (( Em kurd, ji ber ku arşîva wêjeya nivîskiya me li wê çend destnivîsa kevin û nivîsa me têper nake, ku bi rênûsa Erebi û xêzika farsî, di hindêk kevin û lêkolî nênin ku ji bo me mane û heya naha jî ev arşîva hejar û bermahiyên me çawa hetibe ber dest, herwaha bê lêkolîn û jimartin, me yek ser wergirtiye û nivîsa wî çawa bûbe, li gel me jî her waha bê sê û dû, çûye.)) (Mhemed H. , 1998, R. 53).yek ji wan helbestên ku yek alî nebuye ewe ku di dîwana ( Nalî û Kurdî ) de hatiye ( şeva Yelda) ye ( Hemebor) di lihevdana dîwana Kurdî de bi ya ( Mistefa beg) vê helbestê dizane (( hêjayê pirsgirêkeke pir û dirêj dinava gelek çevkaniyên destnivîs û yê hatine çap kirin û

rewşenbîrên mene ku waha hindek bi yên ( Kurdî ) zindî buye. ))(Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 484).Li pey wê belgê kesên ku lê bawer kirine ( Heme Bor ) xistiye ber dest ji bo me runî dibe ku ev helbeste ya ( Miatefa begê Kurdî ) ye. Herwaha helbest bi dû şêwazê cuda li dîwanan de hatiye, li dîwana ( Nalî ) de li ( heft)beytî pêkhatiye.Kuçilidîwana(Kurdî)de(no)beytûvegohertinênbeytdinavaherdûhelbestandeheye. HelbestjialiyêNalîve:

*Şewî yelldaye, ya deycure emşew*

*ke dîdem dur le to bê nure emşew ? !*

*Dlim wek hakmî me zule, qurban !*

*Xelatî weslî toy menvure emşew*

*dllîş mayl be dîdey toye, boye*

*le min wehşî û remîde û dure emşew*

*ke toy şay keç kulahî dîde mestan ,*

*çi bakim qeyêer û fexfure emşew ?!*

*le xew helsawe, ya alloze çawt ?*

*Hemîşe waye, ya mexmure, emşew ?*

*Suruşkim neqşî çawî to dekêşê*

*cêgem ser darekey (menêwr ) e emşew*

*musulmanan deprisn halî ((Nalî))*

*le kuncî bê kesê mehçure emşew. (Mela 'ebdulkerîmî , Dîwanî Nalî, 1391, RR. 397-400).*

*Helbest ji aliyê ( Mistefa begê Kurdî ) ve bi vê şêwaziye:*

*şewî yeldaye , ya deycûre emşew ,*

*ke dîdem dûr le tobê nûre emşew*

*dllim wek hakmî mezûle qurban*

*xellatî weêllî toy menvûre emşew*

*ke toy şay keç kulahî dîde mestan*

*çi bakim qeyêer û fexfûre emşew*

*sruşkim nexşî nawî to dekêşê ,*

*ke cêm serdarîyekey menêwure emşew*

*dllîş maîl be dîdey toye boye*  
*le min wehşî û remîde û dû re emşew*  
*e xew hellsawî ? . Ya alloze çawt ?*  
*Hemîşe waye ? Ya mexmûre emşew ??*  
*Le dûrît , min weku bulbul denallm ,*  
*be weslit alemê mesrûre emşew*  
*sepay mujgan, be tîxî ebirwant*  
*şkistey fîrçe û gabûre emşew*  
*eger yaran deprisn hallî (kurdî)*  
*le kuncî bê kesîmehcûre emşew. (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 483).*

Helbestên van sê helbestvanan bi mekteba helbesta klasîk bi nav dike û şêwaza helbesta nivîsên xwe bi çend şêweyî di nav çevkaniyên wêjeyan de tê dîtin ( mekteba Baban, mekteba Nalî, medreseya wêjeya Baban, ezmûna helbestên Baban, mekteba helbestên kurmanciya jêr, tevgera helestên kurmanciya jêr, mekteba helbestên Nalî û Salim û Kurdî ) (Nêçîrwan , 2016, R. 70). Ev mekteba helbestên kurmanciya jêr ( Nalî û Salim û Kurdî ) bûn bi bingeh danîna helbesta klasîka Kurdî berhemên wan weku kaniyê de teqîner bûn cih û fêrkarî, xwestine vê mekteba helbestê û helbesta klasîk ya Kurdî hev miliya wêjeya klasîka gelan bikin, ( Mistefa beg) dengê diyarî vê qonaxa helbestê buye.

Li gel wê jî de çend nivîskarekan bi vê şêvazê helbest nivîsî ye ( Nalî û Salim û Kurdî ) dibistana helbesta nîne belku şêwaz di helbest nivîsîna wan hersêkan de bi heman şêwazî pêşengtî jêre kirine û helestvanên li dû wan re jî li ser heman rêyê çûne. ( di rastî de ew şêwaza helest nivîsandina wan sê helbestvanan ku di serî çûn nekarîn wî navî bînin dibistanê yan jî rêbaza wêjeyê ji ber ku taybetmendiyan dibistanê û rêbazê tê de nîne ) (Nêçîrwan , 2016, R. 71).

Taybetmendiyan rêbaza wêjeyî û dibistana helbestî çend bingehên wê hene divê bê pêyrevî kirin, rêbaza wêjeyî(( li çend bingehên estetîkî ango xweşikî û fikra hev beş ku bihev re li ser rêve biçin û piyade bikin yan jî bînin xwarê )) (Ferhad , Rêbaze Edebîyekan, 2006, R. 8). li gel nêrînê de jî helbesta klasîka kurdî em dikarin bi dibistana helbesta bi

nav bikim herçend li ser wê rênakeftin yan biryara wê nedane ku bi bernameya taybet ya helbestê binivse lê belê ew giyana taybet û yekgirtin û nêzîkê xwe û babetên xwe li yetire kariye şêwaza nivîsên xwe bixe çarçoveya dibistan û wêjeyê de, li gel wê jî hewil didan ku rêşikandinekî bikin û helbestvanê mezin û bi hêz bîne rêza nivîskar ku ev jî taybetmendiye dibistana helbestê ye û lêhatina van helbestvanan di wêdeye bi bê zanîna bernama dibêstana helbestî wê neteva saman bi cîh bihêlin û bibin simbila neteviya li dîroka wêjeya kurdî de.

#### **2.2.4 Mistefa begê Kurdî ji aliyê helbestvanên serdema xwe û yên pişt xwe:**

pirin ew helbestvanên ku navê helbestvanên berî xwe û serdema xwe de li helbestên xwe de tînin, eve jî hêjayî bandorbunê ye bi wan helbestvanan. ( Mistefa beg ) jî yek ji wan helbestvana buye ku ji helbestvanên serdema xwe û yên pişt xwe de bi nav kiriye, û hindêk ji wan bi pênc rêzî û hindêkên din jî di nava helbestên kurt û yên dirêjde navê wî helbestvanî anîne û bi bilind û mezin temaşe kirine û ecêb bune bi helbestan û wesif ango pênasê kiriye, ji wan ( Nalî, Salim, Hemdî, Hacî Qadir, Selam, Şêx Rezayê Talebanî, Fayeq bê Kes, Qani )

##### **1-Nalî:**

Mistefa beg ( di runiştinekî de li gel ( Nalî ) helbestek li ser parçeyek qaxes pêşkêş kiriye ji kesê ku nêrînên wê bizane li ser nivîsa helbestê Nalî jî li pişt qaxezê bersiva daye bi helbestekî ) diêje:

*((eger çî zahîra nezmit le eşqî çawt mexmûre*

*heqîqet coy rewan û rûte şu le menbe nûre)).(Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 30).*

##### **2- Salm:**

*Le yek la "nalî" î û "meşuy", le layê "Salm" û "kurdî"*

*le hengamey hunergermî, tkaco bûn le "Mewlana" (Mela 'abdulkerîmî , Dîwanî Salm, 2015 A, R. 131).*

Wate : Nalî û Mehuyî û Salim û Kurdî bi hev re runiştine û li ser helbestan leyîstok dikin û helbestê dixwînin û şerê helbestî dikin, ji Mewlana rica dikin ku helbestên wan ji

bo wan hewsengîne, ku Mewlana pîrekî mezin yê ser bi rêbaza Neqîşbendiye û birêz û payedar buye ji aliyê wan ve ji wî daxwaz kirine helbestên wan hewsengîne ango binirxîne. Ev jî hêjayî jêhatî û lihev hatina van helbestvanane ku kesekî weke Mevlana helbestên wan hewsengîne.

### 3- Hemdî:

Navê wî ( Ehmedê kurê Fetah begê Eraziye, ser bi malbata Sahêb Qirane birazayê Mistefa begê Kurdî ye di nava salên ( 1878-1936 z) jiya ye) (Elaeddîn, 1395, R. 460). ev helbestvan ewqas ji Mistefa beg bandor buye li çend cihande binav kiriye û herwaha sê pênc rêzekî li ser sê xezelê Mistefa beg nivîsiye û çariyekî jî li ser xezelekî nivîsandiye. Li çar rêza xwe de dibêje:

*Xermanî lefzî Kurdî, ( kurdî ) ke kirdî pêwan  
Nalî ke Nalî kaseyekî da be ew lêwan  
taracî kird ke Mehuy ye fendî be lutfî xoy  
uşrîşî da be hemdî wtî bîbere dîwan (Cemal M. M., 1984, R. 169).*

Mebesta helbestvan Hemdî ew buye ku Mistefa beg zimanê kurdî xiste nav helbestê û bi amadekirî daye destê Nalî de. Ji ber wê ( Hemdî) li ser malbata Sahêb Qiran buye şanazî bi wê kiriye ku ji malbata wan van sê helbestvanan rabuye û navê xwe li gel Salim û Kurdî de tîne, dibêje:

*mellê mensubî ( Kurdî ) û ( Salm ) ( Hemdî ) le bê fezlî  
ke ecdadî fezîleti mend gelê mehcûbî ewlade (Cemal M. M., 1984, R. 356).*

Hemdî beg mebesta wî eve ye di vê helbestê de ku ( Salim û Kurdî û Hemdî ) ku hersêk ji yek malbatin û xizmên hevdune bi vî şeweyî binav bang û hatine nasîn û sê kesên ku di nava malbatekîde ne û cihê şanaziyê ye ji bo neteva Kurd.

Ev helbestvana wek me got sê pênc rêzên li ser helbestên Mistefa beg nivîsiye û dibêje:

*Tuxuwa ( Hemdî ) be xeyrî meykede bo kwê çuîy ?*

*aşqî mey xware nabê kirdbêtî bedxuîy*  
*kfir û îman bas ekey net mawe meylî, kem duîy*  
*pêm delê (kurdî) xo to aqil bûy ewsa şêt buîy*  
*sîhrî çawî xot nedîwe, heqte lomem key le rê (Cemal M. M., 1984, R. 153).*

#### **4-Hacî Qadirê Koyî:**

Helbestvanekî navdarê kurd e navê wî ( Hacî Qadirê kurê Mela Ehmedî kurê mela Salihê kurê mela Ehmedê mezine, li sala 1816 yê z ji dayîk buye li sala 1897 zayînî çûye ser dilovaniya xwe ) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 D, R. 131).

ev helbestvana li çend cihande navê Mistefa begê Kurdî aniye bi şewaza cuda, di helbestekî de dibêje:

*şehiswarî belaxetî kurdan*  
*yekke tazî fesahetî ((Baban ))*  
*Mistefaye texelusî ((kurdî))*  
*xezelî kirde berbutî kurdî*  
*nawî (( Sahêb Qiran )) î xasî ewe*  
*çunke lem erse espî ew be dewe (Serdar, R. 217).*

Hacî Qadir Mistefa beg bi şaswarî rewanbêjê helbesta kurdî daniye û kesekî ku herî rabuyî di Babanan de zaniye, û bi darijandina helbesta kurdî dizane mebesta wî ji (Sahêb Qiran ) malbata wî Mistefa bege ku eve ya herî baş dizanîn ji ber ku di wê demê de ew dewre hebuye. Hacî Qadir bi şeweyekî din navê Mistefa beg tîne û dibêje:

*Zahîren beytim le ((Nalî )) û (( Kurdî)) zor kemptir nîye*  
*talmi bergeştaye, bedbexte bextim nustuwe(Serdar, R. 137).*

Ber çave ku helberstên min ji helbestên ( Nalî û Kurdî ) kêmtir nîne tenê ewe ku bext û navçavên min nîne lewma min girîngî nedayê. Helbestvan di vir de xwe li gel wan de beravurd miqayese kiriye ku tu tiştêkî wî ji wan kêmtir nîne, ev tê wê wateyê ku Mistefa beg mezin zaniye ji ber wê jî weke hev milê xwe dizane.

## 5- Selam:

Helbestvanekî klasîkê kurde navê wî ( Selam kurê şêx Ehmed kurê Abdul Kerîm ji malbata Şêxana Azebana navçeya Warmaweya Helepçe ye, di nava salên ( 1892-1959 ê zayînî ) jiyayî kiriye) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 F, R. 283). ev helbestvan kesek buye ji wan helbestvanan ku pênc rêzekî li ser helbesta Mistefa beg nivîsiye ku di dîwana wî de hatiye:

*çawekem cewr û cefa û azar û zulmit tabekey  
tozê gwê bigre le min ta em tkayem tê egey  
bendeyî dergaketim boçî leberçî dermekey  
(kuştimt emma le paşana peşîmanî ebey  
ya hbîbî bidî qitlî la hswl fî alindim ) (Umêd K. , 1990, R. 51).*

## 6- Şêx Reza yê Talebanî:

Helbestvanê mezinê kurd ( Şêx Reza kurê Şêx Abdul Rehman kurê Şêx Ehmed Talebanî kurê mela Mehmudê Zengene ye, li sala 1837 za li dayîk buye, li sala 1910 za çûye ser dilovaniya xwe) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 D, R. 297). ji Mistefa beg pir bandor buye, çarek ji Şêx Reza dipirsin di helbestên serdema pêşîde kîjan ji wan li gel te baştir buye, ew jî di bersiv danê de dibêje (( eger helbestên kevin hemû zindî buna, heryek rojê carekî serê min dê didan, lê (( Kurdî)) rojê pênc car)) (Ahmed, 2010, R. 116). ev jî hêjayî girigî û pîrozî û payedariya Mistefa beg digihîne li cem Şêx Rezayê Talebanî, eger li vê qasê pir giranpihaye ku li ser vî helbestvanî gotiye, pêç rêzeyekî de jî li ser helbesteke Mistefa beg nivîsiye. Dibêje:

*wtim wek surmeye bo çawî aşq xakekey jêr pêt  
le ulkey husinda...ger lafî şahî lê bidey lêt dêt  
wutî meyxane bê daym, be yadî çawî mestim, cêt  
( Seba yaranî meclîs ger hewalî min biprisn lêt  
bllê kêşawye meyxane dû çawî bêçuwe eyyarê) (şêx Mhemedî , 2003, R. 99).*



## 7- Fayeq Bêkes:

Helbesvanekî payebilindê kurde navê wî ( Fayeq Bêkes kurê Ebdula begê kurê Kake Hemeye, li salên (1905-1948 za) jiyan kiriye) (Elaeddîn, 1395, R. 538). weke ku di wê dîwanê de hatiye pênc rêzeyekî li ser xezeleke Mistefa beg nivîsiye wê dide fêhm kirin ku bi bandor baye ji Mistefa beg û ji helbestên wî heskiriye ku dibêje:

*sefa dûre le însanî edîb û aşq û şaîr  
beşî her derd û zuxawe , derunî keylî pir agir  
çi dil sextêke tûşî bûm necatim dey xuday qadir  
( ( le neza pê elêm qurban cefa bese, elê kafir  
erê çît dîwe to seg mergî karim mage pêt carê ))(Hemey, R. 87).*

## 8- Qani :

Helbesvanekî kevin yê kurde, navê wî ( Mihemedê Şêx Ebdul Qadi re li salên (1898-1965 za) jiyan kiriye ) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 F, R. 461) . Ev helbesvana bi helbesvanên serdema xwe û yên pey xwe bandor buye, li helbestekî de ku şîna mirina helbestvanekî kurd dike di nav wê helbestê de hewarê ji bo ji dest dana ( Mistefa beg ) jî dike û dibêje:

*kwa Nalî û Narî û Kurdî û Mewlewî?  
Kwanê Bêtûşê melayê Mesnewî? (Burhan , R. 381).*

## 9- Koşkî:

Ev helbestvana navê wî pir kêmin di nava çavkaniyên dîrokandê tê dîtin êdî nayê zanîn ji ber sedema kîjan mijarên wîne ku lêkolînavan nixê xwe nedane, di derbarê jiyan û helbestên wî de zanyarî pir kêmin.

Helbestvan navê wî( Şeweys buye li gundî Koşk ku gundeke li dewrubera Slêmaniyê ye nasnavê wî jî bi navê gundê wî hatiye xwendin, sala ji dayîkbuna wî nehatiye zanîn, lê bes ewa ku li ber dest be ewe ku li sala 1882 ya zayînê çûye ser dilovaniya xwe lê êdî nayê zanîn ku çend sal jiyan kiriye. ) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 D, R. 623). ev helbestvan li helbesteke xwe de navê Mistefa beg tîne û dibêje:

*( Nalî ) û zulfî dulberî ( Kurdî ) gerdî enberî*

*( Hacî ) û Kakolî serî ( Koşkî ) û meyla xwe rû dike (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 D, R. 624).*

Wate: Nalî hewara zilfa dîlbera xwe dike û Kurdî jî axa xwe ber pêya wan de bêh xweş û dibêjin Emberê Hacî jî bi kehkula xwe ya serî ve tê naskirin û Koşkî jî hertim li fikira wê de ye ku rûyê hezkiriya xwe bibîne. Ev jî wê derdixe ku ev helbestvan ê nediyar ew qas bi Mistefa beg bandor buye ku li nav helbestekî de bi vî şêweya xweşik wesif bike.

## **2.2.5 Name helbestên navbera Mistefa begê kurdî û helbestvanan:**

### **Nameyê Şêirî :**

keseke ji aliyên wêje di nava helbestvanên hemû cîhanê de tiştekî waha buye li serdemên pêşîde ((sedem ji sedemên derbaz tiş kirin li dil û pêwîstiya serdemên mirov ew nivîskarên ku ji kesekîve ji bo kesekî din dişîne, bi şêwe helbesta ku pêwîstî bi bersivdanê hebe yan jî na, naran sedemên wî pêwendî kirin û guhestin weku naha hêsan û bi lez nebû, mirov name bi kar dinî ji bo hal pirsîn û bi hev guhertina hest û sozên dilê xwe li gel kesên li dûr xwe . )) (Naz , 2017, R. 77).

Helbestvanên Kurdî jî dema li hevalên xwe yên helbestvan dûr bûne û hevkarên cur be cur li devre bûne û bi nameya Şêirî halê hevdû pirsîye û helbestên xwe ji bo hev şandine, ya herî binav bang nameya ( Nalî û Salim ) û nameya ( Salim û Kurdî ) ye. Ku dema ji hev dûrin ji bo hevdû nivîsine û yek ji wan li derve buye û derbarê rewşa navçeyên xwe ji hev pirs kirine û hest û sozên xwe û xizmatiya xwe ji bo hev dupat kirine. Mistefa beg jî ji wan helbestvanan ku Nameyên helbestî guheriye, bi taybet di nava xwe û Salim de zêdetir bu ye (( di derbarê babetên Name bi helbest ji bo hevdû şandina helbestvanên me de ( Kurdî ) û Salim ) çendîn nameyên wan bi şîroveyî ji hevdû re şandine )) (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 303).

### ***Nameya Mistefa beg ji bo Salim:***

*Refîqî kuncî mîhnet, aczin her şew le nalînim*

*gurêzanin le ber lêşawî mewcî behrî esrînim*

*egerçî roj û şew meşxulî nexmey mugrîbim emma  
 le (tem ) xalî nîye satê dilêy meftûn û xemgînim  
 ne her derdî mine tenya, eme derdî hemû laye,  
 be carê fulkî şêwawe, le negbet mae û peruyinim  
 hezar xozgem be xot dûrî le şarî pir bella û mîhnet  
 le firsetda mnîş helldêm le telxîy şarî şîrînim  
 tebîb dênin deway derdim bika , xo min zerdey dûrîm  
 bebê daruîy wesilî to , nîye aram û teskînim (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 338).*

**bersiva Salim ji bo Mistefa begê Kurdî:**

*refîqî goşeyî xurbet herasanin le nalînim  
 le eşkî dîde emşew –baz – le xwêna mewce balînim  
 urûcî send le senan wesfî ehwalim le rêy îşqa  
 meger ustadî tersaye be xeslet yarî bê dînim ?!  
 Çi cayî dil? Le şewqa xwên be çaw dênê , eger carê  
 xîzabî pêy segîkot bê henayî eşkî rengînim  
 le xem êstem debînin, way dezanin ewelî derdime  
 demêke bêxudim yaran, be yadî yarî dêrînim (Mela 'ebdulkerîmî , Dîwanî Salm, 2015 A, R.  
 452).*

Mistefa beg nameya helbesta xwe li gel Seidî, ku helbestvanekî navdar yê kurde bi şêwezara ango lehca Hewramî hesbest nivîsiye, navê wî (Mihemed Silêman kurê Hacî Seyîd Mehmude li sala 1784 ji dayîk bu ye, li sala 1854 çûye ser dilovaniya xwe ) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 C, R. 329).

**Nameya Kurdî ji bo Seydî:**

*( Seidî ) mezanan, ( Seidî ) mezanan  
 Me bo bizanan. Komenden canan  
 yeqîn ce eşqî yaran rem kerdey  
 werne, çîn îlet lêwenî herdey?  
 Azîzm heyfen yadit kem bîyen .*

*Meger derd êşq ceyadit şîyen  
min ce dlî zar, ey çend ferdewe.*

*Yad, dêrînem nojen kerdewe. (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 309).*

### **Nameya Seidî ji bo Kurdî:**

*Hîcrî nezanan, Hîcrî nezanan  
to behalî derdî imet nezanan .  
min (Seidî) serdar supay dîwanan  
kuştay derdî êşq zedey hîcranan  
tawanam (kitab) dersî êşqim wend  
morî dil be secnabî eşqim kend  
ce mektebxanan, taqe meşqim kerd  
alem mezanan meşqî eşqim kerd. (Mhmid A. & Karduxî, 1392, R. 206).*

Li pey wêya ku ( Heme Bor ) li dîwana Kurdî de behs li wê kiriye ku Mistefa beg li gel helbestvanekî serdema xwe nameya helbestên xwe guhertiye ku navê ( Hesretî ) bu ye vî helbestvanî nama xwe ji bo Mistefa beg şandiye li pey belgeyên Heme Bor eve

### **Nama Hesretî ji bo Kurdî:**

*(( tarî kakollt le ser sefhey roxt tatarîye ? ))  
Ya le ser gencîneyî lêwit ke meşqî (mar)ye  
yadî reng û deng û kirdart, derûnim coş eda,  
dil wrêney weslekey par û lîqay pêrarîye .  
heyfe wabê bakî, carê yadî min nakeyewe ??  
Her le tom dîwe ezîzm em le dost bêzarîye.  
Dil brîndare le dûrît toş ewende bê wefay,  
hanê, fermû giwê le dengî bigre çon hawarîye .  
qafley kallay ( îtab) û ( lome) diyarîy destme  
bo delîlî xoşewîstî hatnim ser yarîy ye .*

*Xozge detzanî ke çend muştaqî dîdarm welê,*

*to nehatî, min ewa hatim, bellê : naçarîye .*

*Resmî xoyane ke aşiq tuşî (Hîcrî) ka desa*

*(hesretî) pêy xoşe, çunke bê wefayî karîye. (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 83).*

(( naveroka li gel take kesên helbesta xwe ( hesreta ) belgeya hevaltiyê ya bi hêz û hezkirina xwe pir ji dil de di navbera xwe de û ew qas jî ( hesreta ) xwe bi hevaltî zaniye, vêna heya tiwana xwe tê digre serzenêşt dike, li pey kesê pêncem û şeşem Diyare ( hesreta ) serê wî li ( Kurdî ) daye, lê li kuderê û li Kur ?? )) (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 83).

## **2.3 Evîn û heskirina jin di helbestên Mistefa Begê Kurdî de:**

### **2.3.1 Evîn, heskirin û xweşikiya ji di helbestên helbestvanan de:**

Evîn, heskirin û xweşikiya jin di helbestên helbestvanên kurd de tiştêkî asayî û xwezayîye, ji ber helbestvan mirove, mirov jî bê heskirin beden û heykeleke bê giyan û candare, helbestvan bixwe jî nabe pêgeheke bihêz, nikare dest bibe bo nivîsandina helbestê, gelek tişt û sedem hene ku wa li helbestvan dike îlham bo nivîsandina helbestê jê re bêt, ev yek di nav helbestên hemû helbestvanên cîhanê de jî wisa ye, dikare sedem di nav helbestên helbestvanan de bê dîtin, wek (evîn û heskirina jinê, xweşikiya jinê, heskirin û evîna niştiman, heskirina ol, xweşikiya xwezayê, ji dest dana tiştên giring di nav jiyana helbestvan de, herwaha gelek tiştên din...)

Ev hemû bi ronî di helbestên helbestvanên kurd de jî bi asanî derdikeve berçav, bi taybet jî evîn û heskirina jinê di helbestvanên me de wek xelkê asayî bi qonaxa heskirin û evînê de û dema ciwanîyê de diyar e û her helbestvanek û navê jinekê di nav helbestên wî de tînin dîtin û dibe îlhama helbestên wî ((Helbestên klasîk ên kurdî de cîheke giring û berfireh bo ponijandina lêkolîna taybet a mijara jinê de ye, ku cîheke diyar di berhemên piraniya helbestvan û nivîskarên me de dagir kiriye û pir kêr helbestvanan de li ber çav nakeve)) (Kemal, 2003, R. 11) .

Babeta evîn û heskirin û dildariyê piranî derdikeve pêş di nav helbestvanê hemû demên cuda de diyar e (Eger em lê binêrin helbestên helbestvanên Kurmanciya jêrîn de

bo me aşkera dibe ku hemû di destpêkê de bi helbestên xeramyat helbest nivîsandine û navê xwe bi helbestvan derxistine, her evîn û heskirin bûye hêvinê helbesta wan. Bi xweşikî û bi leş ciwanî û heskirina jîna xwe heldane û pêsnên xweşikiya jinê dane, li hin cîha de navê fêkî ango meyve, gul û xweşikiya xwezayê wek jinê pênase kirine. Li hin cîhên din de jî bi tiştên pir cuda pênase kirine, bo nimûne ruh wek heyvê, sing wek çiya û xweşikiya beden wek hesp û ziluf wek mar û tiliyên dest wek bilûrê pênase kirine...)(Kemal, 2003, R. 3) .

Tiştta ku wisa li helbestvan kiriye ku bi wî awayî bandorê bi helbestên xwe ve bikare ava bike xweşikî û evîn û heskirin û mîhrebaniya jinê ye, ku di hemû dem û serdem û qonaxan de jin cîheke balkêş ê zilaman bûye. Herwaha jin bûye hêvinê helbestên helbestvanan, ji dil heskirin û dil û derûna mirov dagir dike, helbestvan jî ji vê yekê bê par nînin. (Bi taybet di helbestên klasîk de diyar dibe û bi awayeke hest û sozeke derûnî ya xwezayî ku evîn û heskirinê li gel xwe dike berhem, ew evîn ku helbestvan dilê xwe jê re dibexşe evîna jine ye û her di destpêkê de xwe dide derve û aşkera dike.) ('umer, 2013, R. 83). Helbestvanan di helbestên xwe de pir bi tînbûnê ve behsa evîn û heskirina xwe dikin û her dinalînin û dikin hewar êdî nayê zanîn ((Gelo heskirina wan rasteqîne bûye, yan mecazî bûye, yan bi armanca cinsî û dem derbaskirin bûye û nayê zanîn çima ewqas xwe mezin dîtine, lê li hember yara xwe, xwe pir nizim nîşan dane)) (Kemal, 2003, R. 4).

Helbestvanên klasîk dikarin bibêjin hemû jî helbestên xweşik û bihêz li ser jinê nivîsandine, bi awayek ku hêza helbestvaniya xwe di nav helbestê de ceribandine. ((Hêza xwe ya hunerî bi wî awayî derdixistin ku bi awayê herî xweşik aliyên ronî bêjiyê di behsa jin de aşkera dikin)) (Rewend , 2013, R. 91) .Helbestvan berdewam bo jinekê helbest nivîsandine, hin ji wan rasterast navê wan aniye, hin ji wan jî bi bingeh û amaje navê heskiriya xwe anîne ziman, piraniya wan jî negeheştine heskiriya xwe, ji ber heskirin pêşerojê hatî diyar kirî nîne, evîn û heskirin ((Berdewam di navbera sîber û ronahiyekê de ye, di navbera berdand û hev geheştinê de ye, di navbera yek girtin û cudabûnê de ye, di navbera huzur û nerihetiyê de ye)) (Ehmedî Mela, 2013, R. 24). Hin helbestvan xwe wek miriyê evînê pênase dikin, hin ji wan jî xwe wek dîwane û sergerdan û perîşan û keda wan vala çûyî pênase dikin, piraniya wan jî nasnavê xwe wisa derdixin. Em dikarin bibêjin hemû ew helbestvanên ku helbestên evînî nivîsandine navê endamên bedena jinê anîne, wek

(zulf, bejn û bala, çav, navteng, dest û tilî, ruh gerden û sing..û hwd..) ku ew hemû wek nîşana xweşikiya jinê pênasê dîkin û helbestvanan giringî dane vê babetê.

### **Nalî:**

Yek ji wan helbestvanane ku evîndar bûye û heskiriya wî navê wê (Hebîbe) bûye, êdî nayê zanîn ew naveke rasteqîne yan jî nasnave, hin caran bi Hebîbe û hin caran jî bi Mehbûbe navê wê aniye, di wê serdemê de ti kesê nekariye bi aşkera navê heskiriya xwe bîne, ji ber wê jî dibe ku nasnav be ((Nalî gîrêdayî bi heskiriya xwe ve bûye û bandoreke zêde li ser wî kiriye û hestên wî yên helbestvaniyê û xeyalên wî yên kûr xistiye tevgerê. Ev yek jî gotiye ku xwestiye û bûye hevjinê wî jiyanê û li gel vê jî peyvendiya wan a evîn û heskirinê wek yar û evîndar her berdewam bûye)) (Mela 'abdulkerîmî , Dîwanî Nalî, 1391, R. 31) . Wek di vê helbestê de navê heskiriya xwe bilêv dike û dibêje:

*Pê m delên (Mehbûbe) xêl û qîçe , meylî şer deka*

*Xêl û qîçe, ya terazûy nazî nextê serdeka ?!*

*Mujganî siyehe meste wekû çawî ( Hebîbe )*

*Xart ke bîken dên û deçin roh birefênin .(Mela 'abdulkerîmî , Dîwanî Nalî, 1391, R. 33).*

### **Salim:**

Ev helbestvanê mezin jî evîndar bûye ((Her di dema ciwaniyê de evîndarê (Behê) ku navê xizmeke wî bixwe ye û dibe sedemê vekolînên çavkaniya helbestên Salim)) (Bêdar , 2013, R. 26).

Zanyariyeke pir zêde li ser (Behê) tineye, ku di encamê de jî çî hatiye serê wê nayê zanîn, lê bûye sedme ku ew helbestvan gelek helbestên xwe yên evînî bi awayekî xweşik binivîsîne, di helbesteke xwe de navê zulfê yara xwe tîne û giyanê evîndarî û heskirin û xweşikiyê dide helbesta xwe:

*Meyle, wek serî zulfî , serî min bo berî pa*

*Be cefa meyxere la, sa ênema! tûbî xuda*

*Zêwerî husnî dilaramê, sewdarî xemî zulf*

*nanwênê, ke nebê vulmetî şew, şewqî çira(Mela 'abdulkerîmî , Dîwanî Salm, 2015 A, R. 9)*

Wate: Zulfên xwe veke û berde xwarê, serê min jî wek zulfên te ye, bo xwarê xwe berdide, zulfên xwe nede aliyekê, bi naz ve di rêya xwedê de, wekî wê ye ku serê min li ber piyên xwe bidî aliyekê, ew lihev alyayiyên zulfên xwe aram bike, dilê min ve ruhê te xweşiktir dike û wek aşkera ye ku çira li tariya şevê de bi xweşikî ronahiyê dide, eger tarîbûn nebe ma şevqa çira qet diyar dike, tu jî eger zulfên xwe yên reş bidî aliyekê xweşikiya ruhê te wekî xwe namîne.

### **Welî Dêwane:**

Yek ji wan helbestvanên ku navûbangê wî pir berfirehe û di sala (1745ê ji dayîkbûye û di sala 1801ê koça dawiyê kiriye) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 B, R. 126) . Ji bo navê wî yê tamam çavkaniyeke wisa li ber dest tineye, helbestvaneke evîndar û dîn û şeyda bûye, ji ber evîn û heskirina xwe jî navê xwe kiriye (Dêwane) çîroka wî ya heskirinê heye û vedibêjin ku (Ji zaroktiyê ve xwandiye û di temenê xwe yê ciwanîyê de bi rêya xwandinê ve keçekê dinase ku pêkve xwandine û navê wê (Şemse) bûye û hestên wî li hember vê keçê çêdibin û evîndarê wê dibe,

Piştî demekê wê dixwaze û li xwe mar dike, her du binemale li ser wê rêkdikevin ku piştî salekê veguhêzin, lê di heyama wê sale de pirsgirêk dikeve navbera her du malbatan û birayeke Welî Dêwane tê kuştin û ji ber tolhildan û dewa xwînê bavê Şemsê dikûjin, bi wî awayî hevjiñiya wan tê helweşandin, ji wê şûnde nikarin ji dûr ve jî yek bibînin, agirê cudayîbûna evînê berdibe giyana wan û wek dîwane li dar û ber û çiyayan dikeve û venagere nav eşîra xwe û heta koça dawiyê jî wisa dimîne) (Sdîq , Mêjuy Wêjey Kurdî, 1375 A, R. 467) . Ji ber heskirina xwe ya li hember Şemsê gotiye (Şem) û di piraniya helbestên xwe de navê wek (Şem) aniye û xwe jî wek (Pervane) pênase kiriye û di helbesteke xwe de dibêje:

*Ne ((Şem)) ciyam min , ne ((Şem)) ciyam min*

*((Perwane)) î peşêw ne ((Şem)) ciyam min*

*Mecnun bedbext çare siyamen*

*Şem dax hesret we dil niyamen*

*Qeys asane xêl şay Şem menden*

*Wêl derbeder fam perakendemen*



*Ten tenyayî bê kes yane bê dîmen*

*gun ne gîc behir na umîdîmen (Razî , Dîwanî Welî Dêwane, R. 152).*

Wate: Ez li Şem cuda bûme û wek Pervane halê min perîşane, wek Mecnun çareya min jî reş e, Şem xem û êşên giran xiste dilê min, derdê Qeys asantire ji vê derdê malbata xwe Şem dane min ez beredayî û derbeder bûme, dîn û sergerdanê tenê û bêke û ji kar ketime wek şepoleke serê wî tevlihev, ew helbestvane armanca wî ew e ku ji Şemê cuda bûye û wek çawa Mecnûn ji Leyla cuda bûye û dîn û aware bûye, ez jî çarenivîsa min wek a wî ye, xwelîser û bedbext û bêkesiyê ve wek Mecnûn xwe pênase kiriye.

**Narî:**

Helbestvaneke bi navûbang ê klasîka kurdî ye navê wî (Mihemedê kurê Mela Ehmedê kurê Mela Mihemedê kurê Ebdulrehman e, di sala 1874ê de li dayîkbûye, di sala 1944ê de jî koça dawiyê kiriye) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 E, R. 209) .

Jin pêgeh û rêzeke taybet li wî hebûye, li gel Narî di çend helbestekê de wesf û pênaseya jin kiriye, di helbestekê de jin kiriye hêvinê jiyanê û jiyana di navçavên jinê ve pênase kiriye, giringiya jiyanê bi jinê ve girêdaye û dibêje:

*kebeyî erbabî dîn, qîbleyî xelwet nişîn*

*Şemî şerîet kojîn, rûmetî rexşanî jin*

*Baysî tulî heyat, îletî fewt û memat*

*Xende be rûy nazewe, rûmetî rexşanî jin*

*Baxî dil û kanî dill: gulşenî ruxsarî ye*

*Gencî fereh bexşî dil, leylî bedexşanî dil*

*Ayetî mîhir û wefa, suretî sîdiq û sefa*

*Merhemî derd û cefa, xunçeyî xendanî jin*

*Merkezî eyş û neşat, zemzemî alî sîfat*

*Çeşmeyî awî heyat, çahî zendanî jin('Usman ' . N., 2010, R. 171).*

Armanca wî ew e ku jin dibe sedemê pêgeheştin û kamilbûna ol, wekî ku di cîheke vala û çol de xwedê biparêzî, ruhê jin wek find û mom pêdikeve, sedemê dirêj jiyan kirinê ye, derdê mirinê û têkçûnê dûr dixê, dema ku dikene ruyê wê ronahî dibe, jin hebûneke bi

nirx û giranbahaye, kena li ser lêvên jinê merhema derd û nexwaşî û nexwaşane, rewşên bilind ava dike bo jiyânê û wuze ye bo bedenê. Ew helbestvane pir xweşikî ev helbeste honandiye.

### **Mewlewî:**

Yek ji helbestvanên rêbaza klasîk a Kurdiye ku bi lehceya Goranî helbest nivîsandiye. (Navê wî Ebdulrehîmê kurê Mela Seîdê Tawegoziye, di sala 1806ê li dayîkbûye, di sala 1882ê koça dawî kiriye) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 C, R. 433) .Ev helbestvan jî wek helbestvanên din evîndar û şeydayê jinekê bûye, dema Mewlewî ciwan bû, li gundê xwe ((Hin malbatên bi bingeh Efganî dijiyan, ew sofiyên terîqata Neqîşbendî bûn.

Mewlewî aşnabûn li gel wan peyda dike, ew hevaltîya wan dibe sedem ku helbestvan heskirin û evîna wî li gel keçek ji wan bike û li gel wê hevjinîyê pêkbîne. Navê wê keçê Enber xatûn bûye. Beşek piranî di helbestên xwe yê evîndariyê de Mewlewî, rengadan wê evînê ya germ diyar e)) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 C, R. 435) . Mewlewî Enber xatun a hevjinna xwe pir jê heskiriye û helbestên evîndariyê jî gelek li ser wê nivîsandine, herwaha di nav helbestên xwe de, helbestvanên xemgîniyê û matemiyê gelek li ser ji destdana heskiriya xwe nivîsandiye, lê Enber berî hemûyan bûye ji ber ew berî Mewlewî koça dawiyê kir û bi helbest şîn bo mirina hevjinna xwe vedibêje, ev jî wateya mezinî û heskirina wê jinê ya li gel helbestvan nîşan dide û di helbesteke şînî de dibêje:

*Şûray aşûra dîsan bezmiş best*

*((muherrem)) ama ((mehrem )) şî ne dest*

*Ew xerîk ne çoll şar 'edem da*

*min ne ((kerbela)) î saray matemda*

*Ew ((yezîd )) merg we esîr berde*

*min zadey ((zyad)) xem yeqîr kerde*

*Bazaren , wadey mamellen saqî*

*hey bigre fanî , wey bder baqî*

*Ro, ((huseyn)) asa ferda ke ro bo*

*daxom ser ce ko , laşem ce ko bo (Mela 'bdalkirîmî , 1386, R. 339).*

Wate: Mewlewî ev helbeste bo mirina Enber xatûnê nivîsandiye, ku şibandiye Îmam Husên, ev yek tê wateya meziniya wê jinê, dibêje dubare aşûreye bo merasîm û şînê, ji ber Enber xatûn di roja aşûrê de koça dawiyê kiriye û ew jî bo ji destdana Îmam Husên şîn dikin, ez jî bo hevala xwe şîn dikim ku ji dest min çûye, dibêje çawa Kerbela matem û tazî û reş girêdaye, dilê min jî her wisa ye û mirinê ew bir û ez jî hatime girêdan di dest xemên xwe de, herwaha duaya wê dike ku xwedêyê mezin dibêje ez jî bimrim û tu min jî bibey gel heskiriya min. Mewlewî piştî ji dest dana heskiriya xwe ti sedemeke wî ya jiyane tineye, ku ewqas ji evîndar û heskiriya xwe hesdike.

### **2.3.2 Evîndarî û xweşikiya jin di helbestên Mistefa Begê kurdî de:**

Yek ji wan helbestvanên ku girêdayî bûye bi heskirina jinekê ve ye, guh nedaye lomeyên derdorê, evîndarî li gel Mistefa Beg wate û hesteke xweşik ya mirovî bûye, tiştê ku li gel wî pir girînge evîndarî bûye, bi dil û can evîndariye ne tiştêkî cîhanî, wek dewlemendî, xweşikî û navûbange, li gel wan jî helbestvan qedexe şikandineke mezin pêkanî ye û axaftina li ser evîndarî di navbera her du cinsan de wek tiştêkî heram bûye, ji ber di ola îslamî de evîndarî û axaftina li ser evîndariyê di navbera du cinsan de herame, lê Mistefa Beg evîndarî pêkanî, jibo wê jî êşên mezin kêşane û bûye hêvinê êşên nebiryayî û rengdana wê jî li jiyana û nav dil û helbestên wî de jî hebûye.

Wî helbestvanî çîrokekî wî yê evîndariyê heye û bi vî awayî vedibêje (Mistefa Beg ji ber ku demekê li Kerkûkê jiyana kiriye û her li wê derê peywendiyên wî yên evîndariyê li gel keçek cîrana wî pêktê û navê wê jî (Çinar) bû û bin (Çine) li Kerkûkê xwedî navûbang bû, Mistefa Beg evîndar û dîn û şeydayê wê keçê bû, ji aliyê civakî ve li gel malbata wê ne di gunca, ji ber malbata Mistefa Beg dewlemend û navdar û xwedî pile û paye bûn, malbata keçê jî dest teng û kêmtir deramet û bavê wê jî karker bû, helbestvan wî tiştî ne difikirî ku ji aliyê civakî ve li gel yek na guncên û guh nedida wan tiştane, wek dîwaneyekê lê hatibû aramî lê hatibû birîn, dayîk û bavê wê jî ev yek nedizani, piştî malbata wî vegehiyaye bo bajarê Silêmaniyê, bavê wî biryar daye ku jinekê bo bîne, lê ew dijî vê yekê rawestayê, dayîk û bavê wî ew xeber zanî, bavê wî ji tirsê ku kurê wî ji dest biçe, biryar dan ku biçin xwazgîniyê, li gel Mistefa Beg diçin bo Kerkûkê bo pirs kirina derbarê wê keçê de. Dema ku diçin tiştêkî nexwaş dibîhîsin, ku çend kesan ew keç revandine, piştî jî avêtine ber derê mala bavê wê. (Çine) ducan dibe û Mistefa Beg bawer nake û dibêje divê bi çavê xwe ez

bibînîm, piştire hevdu dibînîn û her du jî li ser heşê xwe diçin, dema Mistefa tê ser heşên xwe bi girî ve berê xwe dide esman û dibêje "Xwedê madem ev kar waha lê hat êdî her çî jine li min heram be, ji ber vê jî wê şûnde heta mirinê jin nayne." (Mhemmed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 20) . Herkesekî ku dest bavêje helbestên Mistefa Beg û bixwînê, çend tiştan di nav helbestên wî de dibîne, ew jî bê hêvîbûn û nalîn û gazind li xwe kirin û reşbînî û gelek tiştên nexwaş xwe didin derve, wisa li xwandevevanan dike ku talî û ne rihetiya jiyana helbest têbigehî.

Dibe ku sedemê wê nale nal û hewar hewara helbestvan ji ber vê yekê be ku evîndara xwe ji dest daye û ji jiyana xwe bê hêvî bibe, ji ber ew karesata ku bi serê evîndara wî hatiye, di piraniya helbestên wî de ev yek reng daye, ji ber vê jî piraniya wan kesên ku behsa Mistefa Beg dikin wî wek (Rêberê leşkerê xeman) pênase dikin. Helbestên ((Mistefa Begê kurdî wêneyê perîşaniyê ye, ji dil û cîger û hinawên wî hatine girtin, ew nexwaşiya bi dewkî bûye nexwaşiyek rastî û endamên laş û bedena wî daweşandiye û ji hêz xistiye. Ew aloziya di nav hizir û dilê wî de bûye, bûye sedem ku berdewam destên wî li hewa û dua dikir û berê xwe dide her tiştî ku hinekê êşên xwe kêmbike)) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 C, R. 235).

Mistefa Beg helbestvan û evîndare û heskirina xwe bo dîlbera xwe di piraniya helbestên xwe de aniye ziman û bûye çavkaniya îlhama helbestên wî, em dikarin bibêjin ((Mistefa Beg bi helbestvan û evîndar, an jî wek helbestvanê evîndariyê em pênase bikin, herwaha naveroka helbestên wî xizmet ji evîndaran re kiriye.)) (Sebah X. , 1987, R. 47). Evîndarî payeyeke mezin hebûye li gel wî helbestvani, ewqas evîndara xwe heskîye ku di nav gelek helbestên xwe de wêneyê xweşikiya wê û endamên cuda yên bedena wê amaje pê kiriye (Bejn û bala, çav, birî, birjang, rû, sing, dest, lêv û zulf...Hwd.) bi vî awayî pesnê dildarî û evîndariya xwe dike, herwaha eger evîndarê wan tiştê evîndara xwe nebe ku navê wan tîne, wê demê wisa bi asanî wan helbestên xweşik ne dikarî binivîsîne.

### **1- Bejn û bala:**

Armanç ji bejn û bala, pesnê bejn û bala jinê ye ku bejin bilind û bedenek xweşike, ev yek cîhê balkêşandina zilame û helbestvanên me di helbestên xwe de bejn û bala jinê

gelek anîne ziman, herwaha li ser bejn û bala jinê gelek tişt wek nimûne bikaranîne wek(Lewlaw, dara çinarê, dara seru, bilûr) Mistefa Beg di helbesteke xwe de dibêje:

*Bex bex ke, çi mewz wune , nexlî qedî şimşalit*

*Layiqîye heyase û pat pawane û wi xirxalit (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 71).*

Wate: Wax wax çend xweşikê, çend rêk û zirave, bejn û bala wê wek bilûrê ye û bilind e û rasterast wek dara xurmê ye, ew bejn û bala rêket binirxe kemera navqeda wê zêr e, xirxal û pawenê wê li ser wê gelek xweşikin. Helbestvan ewqas ji bejna wê ecêb maye ku peyva (Bex bex) wate (wax wax) bikartîne, ji ber ev peyv dema mirov ecêb dimîne ku tiştêk pir zêde ji pêwîst xweşik be bikartê, ewqas bejn û bala yara wî rêk û bilind dîtiye ku bilindbûna wê jî wek dara xurmê binav kiriye, rêk û pêk bûn û ziravî de wek bilûr pênase kiriye, bejna yara xwe di xweşikiyê de pir bi nirx (Heyase) dibîne û navqeda wê li zêr û zîv wek pêkhatibe pênase dike û evîndarê pî, pawan û xirxalên lingê wê bûye. Herwaha di helbesteke din de bejn û bala yara xwe wek lewlaw pênase dike û dibêje:

*Lawî qed lawlawî min ger bê be naz çav helbirê*

*Wa dezanim : şêx le min zutir le îman wergerê (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 145).*

Wate: Ciwanê xweşik û cahêlê bejna wî wek lawlawê bilindim, eger bi naz ve çavê xwe bilind bike, ew şêx û sofiyên bi baweriya xwe ve girêdayî ne bi olê ve, lê rûkeşin, armanca wî ji wan şêxane ku li ber çavên xelkê oldar diyar dikin, ewê yekcar ji ola xwe peşîman bibin, lawlaw ku guleke werziye zirav û dirêje, helbestvan bejn û bala evîndara xwe dişibîne wê gulê, eger bi nav û mekir û çav bilind bike, wê demê şêx li ola xwe dê paşde vegere. Ewqas bejn û bal û çavê yara xwe bi xweşikî zaniye ku bixwe û şêx jî li hember wê xweşikiyê ji ol û îman ango baweriyê dê dûrbikeve.

## **2- Çav:**

Endameke beden ê yek ji endamên herî giring ê bedena mirove, ku bi wê endamê mirov dikare cîhanê bibîne, herwaha di jiyanê de wek bingehê xweşikiya rasteqîn tê zanîn. Helbestvanan bi awayek giştî behs li xweşikiya çavên yara xwe kirine. Mistefa Beg wekî

helbestvanên din ev endame di helbestên xwe de bikaranî ye û wek amajeyek bo xweşikiyê çavê yara xwe nîşan daye, diyare ku çavê wî bi wê xweşikiyê bûye ku Mistefa Beg pê ecêb maye û wek çavên mest bi nav kiriye ku dibêje:

*Hîretim lem meste çawe, bo le gell min wa deka?*

*Em hemû derd û cexarem bo , (le kuwêy peyda deka ? (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 57).*

Wate: Mistefa Beg ecêb maye li çavên mest ên yara xwe, ku çavên wê ewqas xweşike dibêje ew hemû xem û derd li kûderê tîni û didî dilê min, diyar ku xweşikiya çavên yara xwe ewqas bi bandor bûye li ser wî êş di wî de çêdike, ji ber wê jî jê re dibêje çima tu wisa li min dikî, di wê derê de armanca wî ne ew e, ku tişteke lê bike, ji ber ewqas xweşike ku jê ecêb dimîne û wî bê hêz dike. Di helbesteke din de bi awayek din behsa çavên yara xwe dike û dibêje:

*Tîrî eşqî çawekanit wa le cergim Karîye*

*aw le çawanim be xur dê renekey gulnarîye(Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 266).*

Helbestvan di vê derê de bi awayek behsa çavên yara xwe dike û dibêje, çavên te tîrên evîne ne li cergê min didin û gelek bandora wan heye li ser wî, bi awayekê bandor li ser kiriye ku ji ronahiya çavên yara xwe de rondik ango hêsir gur gur di çavên wî de tîn xwarê û rengên wan hêsiran wek gula hinarê ye. Yan jî dibêje :

*Nîga hî çawî mestî nîme xwabit*

*Hezarî weku minî xistwete tabut (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 111).*

Wate: Nîgaya çavên yara wî ewqas dîn û şeyda kiriye ku dibêje, nîgaya çavên mest ên xumarî hezarên wek min kuştiye û têkbiriye û xistiye nav tabûtê û bo nav gorê rêkiriye, wateya wê ew e çavên yara wî ewqas mest û bi xumare ku her desek lê binêre dê dîn û şeyda bibe û ji ber tîşkên ronahiya xweşikiya çavên wê dê bimre.

### 3- Rû ango sîma:

Armanç dev û çavên mirove ku di dev û difin û çav û birî û mijûlank ango bi giştî rû wek ruxsar tê vebêjîn û helbestvan jî di helbestên xwe de navê wan endamane bi cuda cuda li gel yek bi nav dibin. Mistefa Beg jî bi awayê cuda û pêkve navên wan tîne û di helbestekê de dibêje:

*Alemit asan ke teksîr kirduwe, ey mah rû*

*Samîrî asay pîşet caduwe, ey mah rû (Mhemmed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 479).*

Wate: Hemû cîhan bi asanî te xistiye bin destê xwe ve ey kesa ku rûyê wê wek heyvê, (Samîr) wek ferîşteya cadûbaz, îş û karê te cuda kirine ey rûyê wê wek heyvê. Li gel helbestvan rûyê evîndara wî pir xweşik bûye û evîna xweşikiya rûyê wê bûye, ji ber vê wek heyvê ew bi nav kiriye, diyare heskiriya wî ewqas xweşik bûye hemû cîhan bi xwe ve girêdaye û xweşikiya rûyê yara Mistefa Beg ewqasê bi bandor bûye, ew wek cadûbaz pênasê kiriye ku xwedê girawî yara wî cadûtî kiriye ji ber vê hemû alem wisa şeydayê wê bûye.

Yan jî di helbestek din de dibêje:

*Eger yek lemhe xafil bim, le şewqî mahî rûxsarî*

*Le heşra, bê (ne êyb) î cennet û, rûbarî kewserbim (Mhemmed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 294).*

Wate: Eger yek demjimêrê ji te bê agahî bim, ji ronahiya rûyê te yê wek heyvê, di roja lêpîrsînê de ezê bê beş bim ji bihiştê û ji ava kewserê. Helbestvan di vê derê de duaya wê ji bo xwe dike ku eger bo yek demjimêrê jî bê agah be li rûyê yara xwe yê wek heyvê, ku ewqas geş û ronahiye, dê roja dawiyê û di cîhana din de ji bihiştê bê par bimîne û ava kewserê ku li gel mislimanan û tîrsa xwedê ava dike û dibêje ya xwedê bila ez ji wan du tiştên mezin ez bê beş bim, ku di cîhanê de misliman hemû hewldana wan û westandina wan bo xwedê perestiyekê ye ku wan du tiştan bidest bixin. Di vê derê de ew helbestvane ewqas ji evîndara xwe heskiriye ku dua dike ku bila bê beş be ji wan tiştên mezin, lê bila ji rûyê evîndara xwe dîtîne bêbeş nebe.

Helbestvan behsa hûrgiliyên rûyê evîndara xwe dike:

*Xalî rût, qurban be eyarî dilî xelkî dizî*

*To (Enêwbax) boçî rêt da ew hebeş zadey dize ??(Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 595).*

Wate: Xalên ser rûyê te bi qurban, bi mekirbazî û eyarî dilê xelkê bo xwe biriye û evîndar û şeyda bûne, erê tu çima rê da wan xalên reş biçin nave w baxê rûyê te, helbestvan bi awayekê xweşik wesf û pênaseya yara xwe dike û dibêje, bi eyarê dilê xelkê didizî bi xalên hûr ên rûyê xwe ve, ev jî tê wateya ku xalên hûr ên di dev û çavên yara wî ewqas xweşikin, bixwe bala dilê xelkê bi asanî aliyê xwe de dikşîne, ji yara xwe dipirse te çima rê da wan xalên reş ên hûr û heramzade bèn nav baxê rûyê te de, rûyê te hinde xweşik bûye, wî li gel xwe ew wek bax bi nav kiriye, xalên reş jî wek (Hebeş) ango wek reş pîst an jî reşikan binav kiriye.

#### **Memik:**

Memik ango sing endameke bedene, pêşketina wê li gel jinan bêhtire ji zilaman, bi vê rêyê ve jin şîr didin zarokên xwe, memik di temenek diyar de di jinan de pêşdikeve û xweşikkeyek mezin dide bedena jinê û zilam jî pir ji wê endamê jinê hezdikin, hin helbestvan jî bi amaje û hin ji wan jî rasterast navê wê tînin, Mistefa Beg jî di çend helbestekê de navê memik tîne û di hinekên din de jî bi amaje navê memik tîne:

*Eceb mawim, be (gull), bo baxî lîmokat derazênî ?*

*Be (mêxek) bend û (go) û (smil) û (xenawke) î bo denexşênî? (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 243).*

Wate: Ez ecêb mame ji hebûna xwe, çima me memkên xwe bi neqêm û gul dirazîni bi mîxek ku milwankeye ango dot û gerdeniye, bi mêxek tê çêkirin û goberek û smîl ku tişteki gerdenî pê tê çêkirin, xenawge li gula xunçeya ne bişkiwî lê ava dibe, ku ewane gerdeniyên kurdî ne, çima nexş dikey. Helbestvan ecêb maye li hebûna xwe û ji evîndara xwe dipirse çima waha memkên xwe dirazîni bi neqêm û gobera zêrîn a gerdeniya bi mîxek girêdaye,



gerdeniya bi gul çêkiriye dinexşîne û dilê min pê dişewitînî, ew core gerdenî û gobereyên sing û memkê jin xweşiktir dikin û bilind nîşan dide û bi vê yekê ve dilê evîndarê xwe zêdetir şeyda dike û aliyê xwe de dikşîne.

Yan jî dibêje:

*Ew memke çî şîrîne, tîflî dilî bo egrî*

*dawî dile , daney dawe egrîce û (xir) xalit (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 71).*

Wate: Memkê yar pir şîrîn û bi tame, dilê min wek zarokekê bo digrî, didanên te bo min ro kiriye, ku wek mel li dû zulf û egrîce û xirxala wê bim. Helbestvan di vê derê de armanca wê ew e ku memkê evîndara wî ewqas şîrîn û bi tame, dilê xwe wek zarok bi nav dike, ku çawa zarok bo memkê dayîka xwe digrî û egrîceya wê wek ta binav dibe ku xirxala wê daniye bo riştve ku bi wî ta ve bê.

#### **5- Lêv:**

Endameke bedene, xweşikiyê dide rû, ew xweşikî di helbesta helbestvan de reng daye bi lêvan (tenik û zirav û qeytanî û lêv bi ken û lêv şîrîn) navê wê tînin Mistefa Beg jî di helbestên xwe de wê jibîr nake ku bi lêvê evîndara xwe tîne, li gelek cîha de jî behsa lêvên yara xwe dike û dibêje:

*Şikandî qîmetî şeker , nebatî lêwî şîrînit*

*geyandîye meryemey meryem xeyalî rûy nîgarînit (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 123).*

Wate : Lêvên te ewqas şîrîne bi nîrxê şekira rasteqîn şikand, tama lêvên te yên şîrîn, ez gehandime rewşa Hazretî (Meryem)ê ku çawa Hezretî (Îsa) bû, ket rewşeke derûnî ya xirap ez jî dema xeyala lêvên te dikim wek wî heman tişt bi serê min jî tê. Ev helbestvane lêvên evîndara xwe wek fêkî ango mêyve bi tam û şîrîn û tirş bi nav dike û dibêje nîrxê şekir şikandiye û ewqas şîrîne û dibêje bi awayekê rewşa min têkdiçe ku çawa Meryem jê Îsa peyda bû û rewşa wê xirab bû ez jî wisa rewşa min xirab bû, ev yek wê wateyê

radigehîne ku ew helbestvane bi temamî evîndar û şeydayê lêvên yara xwe bûye, ji ber vê jî bi wî awayî agahiyan dide.

*Di helbesteke din a xwe de dibêje:*

*(Dil) Giriftarî pejarey (hîcir) e cananî dewê*

*leylî lêwî şekerîn û gewherî efşanî dewê (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 296).*

Wate : Dilêmin di astengiya xem û azariyê de ye. Dilêmin evîndariyê dixwaze. Leylî: ((Kevireke sor û bi nirxe)) ('usman ' . N., 2010, p. 171). Lêvên yara xwe dişibîne gewherê, ku di xweşikî û sorî û reng sor bûna wê dişibîne gewherê, gotinên wê yên şîrîn wek gewherê ne bo helbestvan, ewqas yara wî xweşik bûye li gel wî, ji bo wî wek gewherê giranbaha ye û ewqas giring û bi nirxe.

#### **6- Zulif:**

Ji biskên jinê re tê gotin ku pora xwe di her du aliyan de berdide, êdî kurt be yan dirêj be ferq nake di por de, bi (Perçem, zulf, egrîce, pirç, bisk, kezî) tê bi nav kirin, jin bêhtir giringî bi porê xwe didin û xizmeta pora xwe dikin, ev yek jî cîhê balkêşana zilamane, helbestvan jî di nav helbestên xwe de navê por bi awayên cuda cuda bikartînin, Mistefa Beg jî bi wî awayî zulf bi lêv dike:

*Emşew xeyallî zulfî siyat hate xatrim*

*bêçare , ( mar gezîde) dil zamî hate so (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 467).*

Wate: Îşev zulfên te yên reş ketin bîra min, dilê min ê birîndar û xwelîser dubare birîn bû, wek mar pê we dabe, helbestvan dibêje îşev fikra min çû gel zulfên te yên reş evîndara min û dubare kete bîra min xweşikiya te, dilê bê çare û xwelîser wek çawa cîheke birîndar be û çêbibe lê dubare birîndar bibe. Zulfên yar ewqas xweşik û dibiriqin ku dubare ketiye bîra wî û dilê wî birîndar bûye. Aliyeke din xweşikiyek din a helbestvan di vê derê de ye ku aliyeke xweşikiyê bikar aniye (Mar gezîde) wateya wê cîheke ku mar an jî tişteke din birîndar kiribe, piştê her tişteki ku lê bikeve careke din biêşê.

## 7- Mistefa Beg di çend helbestekî xwe de navê du endamên bedena jin tine:

pêkve bi xweşikiyê ve li hev tîne û di nav yek beyteke helbestê de, ku her yek ji wan xwedî wateya xwe ya taybet e, bo nimûne (Zulf û rûmet), (birî û mijûlank), (Bejn û memik), (Mijûlank û lêv), (Çav û zulf)

### Zulf û Rûmet:

*Be ( daw ) î zulf û , ( dane ) î xallî ser rût*

*Grftare dilî sed aşîqî rût (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 111).*

Wate: Armanca vê helbestê ew e, ez bûm tayê zulfên te, zulfên yara wî wek ta (ben) bi nav kiriye ku ew pê ve bûye û nikare derbas bibe, herwaha xalên wê yên hûr ên li ser rûmeta wê rûyê yara wî sed dilan beredayî û sergerdan ango bê çare kiriye û jiyana wî jê standiye.

Yan jî dibêje:

*Mehe, ya roje, ya rûy toye , derkewt ?*

*Şewe ya zulfe ya xo mûy dilcût ?(Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 111).*

Helbestvan bi evîndara xwe re dibêje ev heyve yan roj e, yan rûyê te ye, wisa geşbûnek derdikev?, Şeve yan zulfên te yên reşe, yan mûyên te yên dil direvîne, armanca wî ew e rûyê evîndara wî ewqas ronahî û xweşike li gel roj û heyvê wekhev bûye û wî jî tevlihev kiriye û ji yara xwe dipirse, xwedê girawî ewqas rûyê wê xweşike, du nivê beşa duyem de armanca wî ew e: Ew reşiya ku ez dibînim zulfên te yên reşe ?yan şev e, ku zulfê yara wî ewqas reşe ku li gel şevê tevlihev kiriye û nizane zulfên yarê ye yan şeve, yan mûyê dilrevîn e.

### Birî û mijûlank:

*Şikandit leşkerî eqil û şekîbim*

*Be tabûrî muje û, şimşêrî ebrût (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 111).*

Wate: Leşkerê aqil û berxwedana min te şikand bi xweşikiya xwe û artêşa mijûlank û şûr a biriyan ve. Helbestvan bi awayekê wesfê biriyên evîndara xwe dide, ku her tayeke mûyê mijûlankên wê wek leşkerekê dizane, biriyên wê jî wek şûrê di destê leşkerekê de pênase dike ku, leşker bi şûrên xwe biriyên xwe ve êrîş kirine ser aqlê helbestvan û berxwedanî tê de nehêlane û artêşa aqlê wî şikandine û heşên xwe ji dest daye.

### **Bejn û memik:**

*Balate, yan serûy xeraman ?*

*Narince yan memanî taze (qut) bûn ?(Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A,R. 111).*

Wate: Di vê derê de bejn bilindiya yara xwe wek darek bilind û xweşik pênase dike, ku xwedê girawî ecêb maya ji bejna bilind a yara xwe û dibêje, ez bibêjim bejna te ye yan dara bilind. Wateya wê bejna bilind ewqas xweşik bûye ku wek çawa ba li darên bilind dide û diheje û xwar dike, tu jî deme di rê de diçî wek darê bilind ê diheje û xwe xwar dikî bi wê bejna bilind ve, di nivê duyem de dibêje (Narinc) e yan memkên te ne, wateya wê ew e memkên yara wî ewqas gilover û xweşik û teji di dest bûye ku wek narincê bûye, ku bêhn xweşiya di qotiya wê de.

### **Mijûlank û lêv:**

*tesxîrî dilî kirdim, hemley sefî mujganit*

*Hoş û xêredî birdim, leilî lebî xendanit (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 82).*

Wate: Dilêmin bûye kole li hember êrîşên mijûlankên te, hiş û jîrbûn û eqlê min biriye kena li ser lêvên te, armanca helbestvan ew e rêzên mijûlankên wê êrîş kiriye ser dilê wî û ewqas xweşikin ku ew kiriye koleyê xwe, kena şîrîn a li ser lêvên wê hiş û aqil li gel min nehêlaye û dîn û dîwane bûme bo xweşikiya lêwên te.

### **Çav û Zulf:**

*Royî dilî mehûnim , daxim ewe nemzanî*

*Dû (çaw) î reşit birdî, ya (zulfî) perêşanit (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 82).*

Wate: Dilêmin ê xemgîn çû bi xeman ve, min nezanî du çavên te yê reş û xweşik birin, an zulfên te yê şev û aloz, dilê helbestvan ewqas evîndar bûye ku dilê wî li gel wî nemaye û çûye, xema wê dixwe ku nizane çavên reş û xweşik ên yara wî dilê wê biriye yan zulfên wê yê reş, ev jî tê wê wateyê ku helbestvan hem evîndarê çavê wê ye hem jî zulf û keziyên wê yê reş bûye, her du jî li gel wî pir xweşikin, ji ber wê bixwe têkçûye û nizane dilê wî yê şeyda li dû kîjanê de çûye.

#### **8- Helbestvan di helbestekî xwe de xwe dişibîne evîndariyên bê encam ên wek (Ferhad, Mecnûn, Welî Dêwane) û dibêje:**

*Be naxûn, (karî ferhad), dê le destim*

*Weha şahûle sînem nere emşew (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 511).*

Di vê helbestê de helbestvan dibêje, tişta ku Ferhad kiriye, ez jî dikarim bikim, di vê derê de armanca helbestvan ew nîne ku çiyayê Bêstûn qutbike bi tewşû û kulingan, ji ber bi nênikan singê xwe didirîne, pêwîstî bi diyar kirina wî cîhi nîne ku bibre û qut bike, ji ber singê wî nerme û bi asanî dikare bibre, wateya wê ew e; ewqas evîndare ku wek Ferhad e, ku Ferhad çiyayek kunkir û birî ji bo bigehe evîndara xwe, ew jî dikare dilê xwe kun bike û bibre.

Di beyteke din de heman helbestê dibêje:

*Le tenhayî be yadî rohî mecnun*

*Xeyallî geştî deşt û derme emşew (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 511).*

Di vê beytê de xwe şibandiye Mecnûn û wek çawa Mecnûn ji evîndarî û şeydayê Leyla de awarey deşt û der bûye, ew jî xwe wek wî dibîne û wî wek hevderdê xwe dibîne. Dilê min ê tenê û Mecnûn tînim bîra xwe, ji ber derdê wî jî heman awayî derdê min e û ji yara xwe ez cuda bûme.

Yan dibêje:

*Le dewrî (şem) gerra perwane nakam*

*Le ser rêy weslî to rehberme emşew (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 511).*

Di vê derê de helbestvan xwe wek Welî Dêwane pênase dike ku bo Şem a evîndara xwe ya bê encam wek perperokê derdora wê de ziviriye, ji bo bigehe evîndara xwe gelek rê dane berxwe, ew jî heman awayî wekî wî bûye.

Helbestvan ji ber bê encamîbûnê bêçareye û xwe wek evîndarê bê encam pênase dike ku ew jî ti yek ji wan negeheştine evîndarên xwe û xwedî çîrokên evîndariyê ne, ji ber evîndariyê êşên mezin kêşane.

### **9- (Eşq-Evîn) li gel Mistefa Begê Kurdî:**

Evîn tê wateya heskirinê, heta hestiyên xwe dagir kirin û kontrol kirina aqil û dil û fikirandinê ye û reftarên mirov ên li hember meşûqa wî ye. ((Evîn yek ji hestên herî bi bandore, ku mirov bi awayeke cuda difikire û dikeve wî derdî))(Serwer , 2005, R. 91).

Mistefa Begê helbestvan û evîndar, evîndariya xwe û girêdana xwe bi evîndara xwe ve di nav helbestên xwe de diyar dike ûu dibêje:

*kulî alem wa bû win sergeşte û heyranî eşq....*

*Hîç kesê nazanê ehwalî ser û samanî eşq*

*Bade peymananî îdrak û kemalî irfan...*

*Leng û aciz bûn le rêtey kirdnî meydanî eşq (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 257).*

Wate : Armanca helbestvan ew e hemû cîhan li wî tevlihev bûye û ketiye bela evînê, ti kesek li rewşa evîndariyê nizane, ereq vexwar û têgeheştvan û xanedan û kulek û xeyîdîne ji rê û rêbaza evînê, evîndar ewqas evîn li gel wî giran û bi êş bûye, dibêje hemû cîhan jî wek min dîn û şeydayê evînê ye, ji ber bixwe gelek evîndare dilê wî li hember evînê bi birîne, dibêje ti kesek rewşa evînê nizane heta ku evîndar nebe, ku evîn nebe bê xeme, li gor wî ereq vexwar û zilamên mezin û têgeheştvan wek di rêya evînê de îflîc bûne û di rêya evînê de rastî derdan hatine û nerihet bûne, vê yekê jî wek sebir û teseliyek ji dilê xwe re dibêje.

Di helbesteke din de bi awayeke xwazî dixwazê ku evîn ti demekê neba, ji ber evînê gelek êş dayê û dibêje:

*Nawî eşq, hergîz le dinyada nebûba, kaşkî...*

*Toyî le bo dermanî çaw nebûye peyda kaşkî*

*Her le ewwel, (qurqoşim) bikraye çeşmey menbeyî*

*Rîşeyî (gya) şî,ke nerwaye le (sehra), kaşkî (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 197).*

Wate : Dibêje, xwezî navê evînê li cîhanê neba, xwezî bo çavê min tu nebaya derman, her di destpêkê de qurqoşa min biba kangeya helkolana evînê, rihên giya jî pêk nehatiba xwezî her çol ba.

Helbestvan ewqas êşên evînê dîtiye xweziyan dixwaze ku evîn li cîhanê xwedî hebûn neba û pêknehatiba, yara xwe wek dermanê çavên xwe pênase dike, hêvî dixwaze ku evîn neba û yara wî jî neba û ew dermanê çavên wî jî be lê evîn neba û evînê ewqas êş jê re bexş kirine ku ew yek hemû jê rê bûne hêvî û daxwaz û her ji destpêkê de qurqoşa min biba ew cîh û kangeye ku ew kangeya ku evîn lê peyda dibe ku di vê derê de armanca wî dilê wî ye, daxwaza wê dike ku giya ti demekê li çolê şîn nebiba, ji ber çol evîndarê giya ye.

Yan jî di helbesteke din de dibêje:

*Lêm gerrên, ba cê nişînî kuncî xem bim ey refîq*

*Derdekey min derdî eşqe zor gran û sarîye (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 266).*

Armanca helbestvan ew e û dibêje: Dest li min berdî ew kesûkar û hevalên min bila di cîhana xeman de ez niştecih bibim û ne vegerime ser cîhana asayî ya xwe û jiyana asayî ya xwe, ji ber derdê min derdê evînê ye, ev jî wateya ku evîn wek derd û nerihetiyê pênase kiriye ku derdê wî berdewam di pêşketinê de ye, ev helbestvane di evîn û êş û derdên wisa de ye ku jiyana wî pir tal bûye.

Yan jî dibêje:

*Kuwan refîqanî ge rîqet, derdî eşqim çareken*

*Ya becarê bimkujin, cergim be xencer pareken (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 410).*

Wate: Li kuderêne hevalên rêya evîn û heskirinê, werin derdê evîna min çareser bikin, yan bi carê min bikujin û li nawa min bidin, yan cergê min bidirînin û bi xencerê dilê min derbixin. Helbestvan evîndareke pir keliyaye û ay û of li wî ketiye û hewar jê bilind dibin û dibêje hevalên xwe werin min bikujin ewqas jê bi bandor bûye dibêje eger bi yekcarî min nakujin werin dilê min derbêxin û parçe parçe bikin ji bo ez ji vê derdê giran xilas bibim.

Yan jî dibêje:

*Hemû umrim be çay çû le rêgey eşqda aman*

*Duçarî sîham û damî eşqî gîfil û xamêkim (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 353).*

Wate : Hemû temenê min vala çû di rêya evînê de, ey hewar ku ez armancê din ên yek li dû yek bûm, ji ber ez evîndarê kesekê bûm wek zarokan bû û pê negeheştî bû, di vê derê de evîndar, xeman ji ber temenê xwe yê vala çûyî dixwa, di rêya evîna bê encam de ku gelek tîrên evînê xwariye û gazind û lomeyan dike ku evîndarê kesekî bûye ku temenê wê kêr û pênegeheştî bûye.

#### **10- Peyva (Qadir) di helbestên Mistefa Begê Kurdî de:**

Di çend helbesteke Mistefa Beg de navê (Qadir) dikeve ber çavê me, di nav her helbestekê de bi armancên cuda navê (Qadir) aniye, wek li lêkdanên helbestên xwe de ev yek bi min derdikeve ku helbestvan di hin cîh de armanca wî ya wê peyva Qadir xwedêyê mezin û mîhreban e, ji ber (Qadir) yek ji navên xwedayê mezin e û Mistefa Beg jî kesek misliman û xwedê nas bûye, her ji ber vê navê xwedayê mezin û payedarê wî aniye.



Bi wate û armanca din navê (Qadir) aniye, ew jî bi kurdî li ser terîqeta (Qadirî) bûye û derwîş û sofî yê ser bi wê terîqetê bûye, ev jî wa lê kiriye ku navê (Qadirî) bîne, dervey wan jî peyva (Qadir) di helbestên wî de bi wateya hêz û quwet de bikar tê, peyva (Qadir) di zimanê erebî de tê wateya hêz û quwet û Mistefa Beg jî zimanê erebî zaniye û di nav helbestên xwe de gelek peyvên erebî li ber çav dikeve, ji ber vê em dikarin bibêjin ev lêkdane raste,

Herwaha (Qadir Beg) jî birazayê wî bûye û gelek jê heskiriye, ji ber vê jî di çend cîhekan de navê wî aniye û helbest li ser bejna wî gotiye.

Dervey wan jî tiştê di derbarê Mistefa Beg de bi awayek ne rewê tê gotin, bi xwe kesek rewş paqij û ji xwedê tirs bûye û çawa dest dibe bo kareke wisa ku xwedê girawî hez ji kesek zarok kiriye, lê ew tiştê ku tê gotin ne raste (Heme Bor) di dîwana kurdî de pir awayek xweşik ew piştrast kiriye ku, ev tiştên ku derbarê wî de tên gotin ne rastin, sedemê wê ne rastiyê jî tê gotin ku, (Qadir) navê ti kesek şarazayî li ser jiyana wî nebûye, yan jî kesekê çîroka wî kesî ne bihîstiye û ne dîtiye, ev tenê gotinên tên kirin in û tê gotin ti belgeyek li berdest nîne ku ew (Qadir) hebûna wî heye yan na, tenê li helbestên wî dinêrin û lêkdanên cuda bo dikin,

Li gor wan lêkolînan û lêkdanên kuli ser helbestên Mistefa Beg min kiriye û helbestên wî min xwandiye, zîrekî û jêhatîbûna wî helbestvanî di gelek xalan de min dîtiye, lê li hemûyan girîngtir jî babeta (Qadir)e ku bi awayê cuda amaje pê kiriye, lêkolînvanan û nivîskar rastî tehlîhevîyê kiriye, di her helbestvanekê de em lê dikolin awayek din derdikeve, xweşiya wê bi temamî di helbestên wî de ev yek ronî nekiriye û li dû xwe nehiştiye, kun aha gelek gotin li ser tên kirin û li gel hinekan jêhatîbûn, li gel hinekan jî berevajî vê yekê tê nirxandin.

Dibe ku sedemê dana kêlekê her babeta (Qadir) be ku wisa hatibe piştguh kirin ji aliyê nivîskar û lêkolînvanan ve.

Eger wekî ku tiştê hildin dest Ew (Qadir) kurek be û Mistefa Beg evîndarê wî be û hez jê kiribe, ev yek ne tişteke ecêbe, ji ber ew dema ji heskiriya xwe cuda dibe rû li esman dike, wê demê hemû jinên cîhanê li wî heram be, eger ew heskirin rast be wê demê vedigere bo cuda bûna ji yara xwe.

**Tarîqeta Qadirî:** (Yek ji rêbazên ku cîhê wê gelek hebûye ye, bernamêyên wan li ser ola îslamê bûye (Şêx Ebdulqadirê Geylanî) rêberê vê terîqetê bûye, her bi navê wî ve wê terîqetê navûbang derxistiye, ji ber di dema wî de rêbazeke geheştiye lûtke, ji ber vê jî ku şêx kurd bû gelek kesên kurd li dû wî de çûn) ('Umer ' . m., R. 68). Mistefa Beg jî yek ji peyrewê wê terîqetê bûye û gelek pê ve girêdayî bûye û gelek li ser wî bandora terîqetê hebûye, ji ber vê jî di gelek helbestan de pir xweşik di ronî dike ku ew (Qadir) bi sê awayan di nav yek helbestê de bikar anîye û xweşikiyek pir bi vê helbestê de derxistiye û dibêje:

*(Qadir) e (Qadir) be çarem ey peristim (qadirî) m*

*Boye (kurdî) qet le naw em daweda nabê qutar (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 131).*

Armanca Mistefa Begê helbest ji (Qadirî) yekem hêz û quwet û desthilate û ji (Qadirî) ya duyem de armanca wî xwedê ye, wek me got (Qadir) yek ji navên pîroz ên navê xwedayê mezin e, herwaha armanca wî li (Qadirî) ew e ku ez li ser terîqeta Qadirî me û xweda perestim, di nê beyta duyem de dibêje ez ti demê xilas nabim ji wê dawê ku ketimê, armanca wî xema dûrbûna ji heskiriya wî, armanca wî ew e baweriya min mezin û hêza xwedayê mezin heye û ez xwedê perestim û li ser terîqeta Qadirî me, bes bi xwedê ez ti demekê ji wî derdê bê eman ê dûrbûna yarim xilas nabim. Ev jî vê yekê ronî dike ku armanc ji (Qadir) xwedayê mezin ku bixwe bi hêz û quwete û her tiştek jî destê wî tê.

Yan jî dibêje:

*Belê, xot (Qadirî) , (roj)î hemû alem bikeyte (şew)*

*Hezaran aşiqî wek min, ke çaw helbînî, denwênî!!(Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 243).*

Wate:Xwedê tu bi hêzî dikarî roja hemû cîhane bikî şev, hemû evîndarên wekî min ku xew nakeve çavên wan tu dikarî bixî xewê û bi mirînî, bi ronî wateya peyva (Qadir) di vê derê de diyare ku armanca wî ji xwedayê mezine, ji ber tenê xwedayê mezin dikare rojê

bike şev, ew tenê di desthilata wî de ye, tenê ew dikare wê yekê bike, ew dikare sebrê bide dilê evîndarên wek Mistefa Beg û çavên wan ên xewê nabînin bixe xewê.

Di helbesteke din de navê (Qadir)î aniye û bi awayekê dibêje:

*(Kurdî) amanet, sed amanet ke emşew cumaye ,*

*Ta sibeynê, qet mebe, xafil le jîkrî (Qadir)î (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 162).*

Wate : Helbestvan bi xwe dibêje (emanet), agahdar be ku îşe şeva îne ye, heta sibê bê agah nebe ji bîranîna xwedayê mezin û sunetên pêxember û mirovên baş. Helbestvan daxwaz ji xwe dike ku hişyar be ku şeva îne ye û şeva bibîranîna xwedêyê mezine di nav mislimanan de û şeveke pîroze û divê bibîranîna xwedayê mezin tê de tê kirin ku wek şeva xêr û bereketê te bi nav kirin, dîsa bi xwe dibêje heta ber bi sibê nerazê û bê agahî nebe ji bibîranîna xwedayê mezin, ku ew şeva pîroz û bi firsete bo xweda perestiyê. Bo me ronî bûye ku armanc ji peyva (Qadir) xwedayê mezin û mîhrebane, jib er helbestvan kesek mislimane û ji xwedê tirse, misliman jî tenê xwedayê mezin wek şayenê perestîne dizanin.

Di helbesteke din de dibêje:

*Rêrewit (Qadir) bê bo agay ciwabî meselet*

*Werne (kurdî) natwanî halî xoy bo bika beyan (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 392).*

Wate : Eger xwedayê mezin heval û yawerê te be wê demê çareserî li gel wî ye bo hemû pirsgirêkan, lê kurdî nikare rewşa xwe aşkera bike bo we. Helbestvan di vê derê de armanca wî xwedayê tak û tenê ye, ji ber vê jî bawerî bi hêza xwedêyê mezin heye, dibêje eger xwedê li pişt te be, çareserîya pirsgirêka asane, li gel vê jî helbestvan ewqas rewşa wî xirabe ji ber dûrbûna yara xwe nikare û nizane ku çawa wan pirsgirêkan bibêje, ku çareseriyek guncaw bo xwe bibîne û herçend bawerî bi wê yekê tineye ku xemên wî çareser bibe, ji ber bi temamî bê hêvî bûye ji evîna xwe.

Yan jî dibêje:

*Eger (hîcrî) depirsin mezheb û pîrî gihrîqî min*

*(Elî) mewlame (qadir) pîrime (mehmûd), sultanim (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 326).*

Wate: Eger yek ji min bipirse rêbaz û mezheba te çiyê, ezê bibêjimê ku Îmamê Elî mezinê min e û li ser rêbaza Şêx Ebdulqadirê Geylanî me û ser bi terîqeta Qadirî me, Mehmûd Paşa sultanê mine, ku yek ji serdarên wê serdemê yê Mistefa Beg e. helbestvan di vê helbestê de xwe wek (Hîcrî) pênase dike, dibe ji ber koberiya Hîcrî ev helbeste nivîsandibe.

Elî: (Yek ji kesên malbata Pêxembere, navê wî Elî yê kurê Ebu Talib e û kurmamê Pêxembere û herwaha zavayê wî ye, bavê Hesên û Husên e) ('Alî , R. 10).

Di helbesteke din de navê (Qadir) aniye û bi wî awayî dibêje:

*Be taw hat (kurdî) (qadir) dil fîday bê*

*Xuda mehfuzî key ça buk suiarm (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 316).*

Wate: Kurdî bilez hat (Qadir) dil qurbanê te be, xwedê biparêze suraçakê min. Wateya wê (Kurdî) ji xwe re dibêje ku ez bilez hatim bo gel (Qadir) giyan û dilê min qurbana te be, armanc ji peyva (Qadir) Qadir Begê kurê Hemîd Begê kurê Ehmed Begê Sahîpqirane ku dibe birazayê Mistefa Begê Kurdî ye ku gelek jê heskiriye û ev helbest li ser bejn û bala wî ya xweşik û nivîsiye û xwe wek qurbana wî nîşandaye û wî emanetî xwedê dike ku wî birazayê wî yê xweşik biparêze. Ewqas jê heskiriye ku wek suraçak wî pênase dike.

Mistefa Beg di helbestên xwe de ku navê (Qadir) aniye wek berî naha jî me ronî kir, bi çend awayan dem dikarin bibêjin wek (Menêwrî Helac) ku (Ene El Heq) gotibû û felsefeya xwe ya jiyana xwe diyar kiribû, wî jî wek wî (Qadir) kiriye felsefeya jiyana xwe û bi wê armancê ku bikar tîne û helbesta xwe li gel di guncîne.

Herwaha di helbesta xwe de dibêje:

*Weku menswur eger bîşim sûtênin*

*(Ena El Qadir) delê gerd û xubarim (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 320).*

Wate: Ez jî wek Menêwur eger bêm kuştin jî û min bi şewitînin jî ezê her bibêjim û hindî hêza min hebe ez eger bibim xwelî jî, ez dest li rêbaza xwe bernadim, ku ew rêbaz rêbaza xwedê perestiyê ye, armanca wî ew e ku dest ji bernameya xwe bernade û eger wek Menêwrê Helac jî bê şewitandin dest ji karê xwe bernade.



### **3 Hunerên helbestî û awayê bikaranîna wan li gel mistefa begê kurdî**

#### **3.1 Çemkê dûrbûnê û rengdana wê di helbestên Mistefa Begê Kurdî de**

##### **3.1.1 Têgeha dûrbûnê:**

Armanç ji dûrbûnê dûrketina li cîhê niştêcîh bûnê ye, yan jî li welat û niştiman e, hin cara li nav welat û cîhê xwede ye, lê ew dûrbûna ji qutbûne kesekê yan jî dost û heskiriyeke û ji ber her sedemekê be dûrketinek û qutbûnek tê hesibandin, ew babet wateya cuda di nav xwe de heldigre (Dûrbûn û xerîbî di bingehe de li (El xerîbe) ya erebî tê, ku bi awayek cuda hatiye lêkdan lê bi awayeke giştî dibêjin (xerîb) ve hatiye, di wateya ava bûn an jî dûrketin û windabûnê de tê bikaranîn, herwaha (El Xerîbî) jî tê wateya dûrketin li welat û niştiman û malbat û kesûkar û dost û heskirî ye, hin car di cîha (xerîbî) de koçberî jî tê bikaranîn, di her peyvek ji wan de agahiyê li ser dûrbûna ji wan tiştê dide ku li jor hatin behs kirin.)(Naz , Xurbed û Rengdanewey le şî'rekanî (Salm) da, 2013, R. 47).

Dûrbûn cuda cuda ne her yek bi awayekê ne, lê bandora wan yek core ye (Cuda bûn û dûrbûn di hemû civakekê de heye, dûrketin ji bira mirine, hin dûrketin bo demekê ne û heyamekê ne, hin ji wan bi dile, lê hindê jî ji naçariyê ye û pir caran jî heta hetayîye, her kîjan ji wan be her dûrbûn û xerîbiye û belayeke reş û bandora wê girane, hin kesan dûrbûn derd û mirinê li gel xwe tîne, li gel hindekan jî mirin asantir e li qutbûnê û dûrbûnê û cudayîya xem û derdan gelek dide dilê mirov)(Zekerya , 2013, R. 428).

Dema heskirî cuda dibin û ji hev qut dibin ev yek li gel xwe êş û derdên giran û xemên mezin di dil de ava dike, ew xem û êşên cuda nîne, ji ber êşên dûrbûnê wek yek in (Dûrbûn û qutbûn di navber heskiriyan de ne serdem û ne jî dem û ne jî rewşeke gohertinê bixwe re tîne, ji ber di aliyê derûnî de ti cudayîyek li holê tineye, ji ber heskirin hesteke derûniye û cudabûn û qutbûn bandoreke giran li ser derûniya mirov dike) (Ferman , 2008, R. 226) . Hemû êş û xem bi awayeke xirap bandore li ser derûniya mirov pêktînin, ji ber vê jî xem xwarin derûniye, di encama nerihetbûn ji tiştê de pêktê, êdî ew xem ji ber çî sedemekê be bila bibe. Dûrbûn û qutbûn gelek xeman li gel xwe de tîne êdî ew dûrbûn bi çî awayek be ji awayan ((Qutbûna peyvendî û cudabûn bê guman dibe sedemê xemên tund))(Luys , 2015, R. 170).

Mirov di encama xem xwarinê de gelek rastî nexwaşiyên derûnî dibe, ew jî ji ber wan xemên dûrbûnê ku yek ji xemên girane, ev jî bandorê li ser derûniya kes dike, bi taybet ew core dûrbûn ku li welat û cîhê niştecihbûna xwe be bandoreke giran dike, ji ber ku dûrbûn li mirovên xwe hesteke xembariyê û bêkesiyê li gel xwe tîne û mirov bîra hemû tiştêkî cîhê xwe dike û xemên zêde ji ber raboriya xwe û navçeya xwe dixwe, di encamê de ev yek li gel xwe nexwaşiyên derûnî tîne (Rêjeya nexwaşiyên derûnî di nav wan kesane de zêde ye ku koçber dibin û dûrdikevin ji cîhê xwe, herwaha koç û dûrbûn dibe sedemê serîrakirina nexwaşiyên derûnî yên cuda cuda.) (Efram , 2009, R. 41).

Bi awayeke herî diyar ew nexwaşiya derûnî ku mirov dikevê di encama dûrbûn û qutbûnê de ye û nexwaşiya (Xembariyê) ku nexwaşiyêke derûniye ((xembarî nexwaşiyêke beden de pêktê û aqil dibe, herwaha pir caran ew nexwaşiyên waha çend nîşaneke aqil û beden tê de derdikeve pêş))(Kwam , 2007, R. 7). Ew nexwaşiyê çareseriyê wê heye, bi vergirtina derman û rahênanê, eger neyê çareser kirin wê demê ew kese rastî nexwaşiya beden dike û bandorên wê pir xirab dibin.

### **3.1.2 Rengdana dûrbûnê di helbestên helbestvanan de:**

Di nav civakên cuda de dûrbûn û cudayî tiştêke ku em dikarin bibêjin gelek tê dîtin, sedemên wê yên cuda hene di nav takekesên civakê de, kurd jî wek civakên din, bi heman awayî dûrbûn û cudabûn di vê civakê de jî pêktê, êdî cudabûn be yan jî heskirin be, yan kesûkar û ji xizman û ji walat dûrketin be.

Ev tişt di nav helbestên kurdî de jî tê dîtin û bi awayên cuda cuda ji hev qutbûn ji heskiriyan re xemên giran di dil de ava kirine û rastî nerihetî û êş û xeman aniye û di helbestan de jî ev yek rengdanek pêkaniye.

#### **Nalî:**

*((Nalî)) wa daîm ke meşxulî fuxan û naleye*

*baîsî hîcranî yare dil şerarî girtuwe . (Mela 'ebdulkerîmî , Dîwanî Nalî, 1391, R. 549).*

Wate : Nalî waye hemû demê mijûlê hewar hewarê ye û nale nala wî ye, ev jî ji ber dûrbûna ji yara xwe ye ku dilê wî xem girtine, Nalî xwe bi xemgîn û bê taqet bi nav dike, ji ber dûrbûna yara xwe hewar û nale nala jê bilind dibe û wê xem û bê taqetiyê, sedemê wê girêdide bi dûrbûna yara xwe ku ji ber vê dilê wî kul û xem girêdane.

**Narî :**

*Be yadt kewte sozîş xunçe dem, wa qelbî bîmarim*

*Le hîcret hate so dîsan , birînî par û pêrarim*

*Hemû neşey zimistanî fîraqe erê erey ahim*

*Nîşaney payîzî hîcrane zerdî pelkî ruxsarim*

*Be şuley narî pir tesîrî eşq sozî dûrîy to*

*Weku perwane sutawe , diley xemgîn û xembarm (‘usman ‘. N., 2010, R. 129).*

Wate: Ji ber bîranîna te qey dibêjî birîndarim şewitî xunçe li dev, ji ber dûrbûna te dubare birîna min a salan a berê keliya û êşa wê hateve û nav dilê min di êşîne wek berê çawa ez êşandime, henaseya min sar e wek zivistana em ji hev cuda bûne, ji ber wan sedeman ez serxweş û bê agahim, ev bingehe payîz cudabûnê ye, ku rûyê min zer girêdaye wek zerbûna payîzê, bi tîşkê agir bandora wê soza dûrbûna te ye, ez wek perperokê şewitîm bi dilê xemgîn û bê taqet ve. Helbestvan di vê derê de dûrbûna ji yara xwe pir bandor bûye, ew gehandiye rewşeke ku bixwe ewqas di êş û kulên dûrbûn û qutbûnê dibîne.

**Mehuyî :**

Yek ji helbestvanên bi navûban ên helbestên klasîk ê kurdî ye ku navê wî (Mihemedê kurê şêx Osmanê Balixiye, ku di sala 1831ê de dayîkbûye, di sala 1909ê de koça dawiyê kiriye) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 D, R. 163).

*Wîsalet nare , hîcret roje reş wek aftarî to*

*Le to nîzdîke pişkoye , xeluze ger le to bê dûr (Mela 'bdalkirîmî , Dîwanî Mehuy, 1389, R. 163).*

Wate: Geheştina te wek agir ronahiye û geşe, ronahiyê dide dil û xem û êşan radike û xweşiyê ji dil re dibexşe, dûrbûna te wek roja reş e, dil tarî û xemgîn dike û xweşiyê ji dil dibre, ev jî di rûyê te yê wek rojê de nêzîk be, wek çirûska agir geş dibe û dilxweş û keyfxweş dibe, ewê ku ji te dûr be wek reşbûna rejûyê dilê wî reş dibe û jiyana wî tal û nexwaş dibe. Helbestvan di vê derê de nêzîkbûna heskiriya xwe wek ronahiya agir, dûrbûna wê jî wek roja reş pênase dike, li gor wî yara wî rûyê wê wek rojê ronahiye, ewê



ku ji wê nêzîk be ronahiyê dê bide wî û dilxweş bike, ewê ku ji wê dûr jî be wek rejûyê dilê wî dê reş be.

**Wefayî :**

Helbestvanek kurd e û navê wî (Ebdulrehîmê kurê Mela Xefûr kurê Mela Nesrûlla ye, di sala 1844ê de ji dayîkbûye, di sala 1902 de koça dawiyê kiriye.) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 D, R. 369).

*Şerhî derdî arezûmendî le kes tesîrî nabê*

*Ew kesey derdim dezanê ger le yarî xoy cudabê*

*Ey birader xanewêranî , cudayî bo wefayî*

*Wek wefayî ey cudayî yaxwa xanet xirabê !*

*Xeyrî dilber derdî dil nalêm be hîç kes ta bimênim*

*Derdî dil bo wey bilêm çake be derdim aşnabê . (Muhemmed, 1390, R. 306).*

Wate: Lêkdana xemên dûrbûna min bandore li ser herkesekê nake, ku ew kesê ji derdê min bizane û eger ew jî wekî min ji yara xwe cuda bibe û dûrbikeve li yara xwe dibe bizane, ji ber derdê dûrbûnê derdeke girane û mirov hildiweşîne û herkesek jî nikare ji wî tiştî têbiguhe, eger bixwe bi serê wî jî hatibe, Ey bira û dost hevalên min ên dûrî û cudabûme ji yara xwe mala min wêran bûye, ey dûrbûna cudayiyê çawa te mala min wêran kir, xwedê mala te jî wêran bike wek mala min, dervey heskiriya min behsa xemên xwe bo ti kesekê nakim, heta li cîhanê ez mabim, xem û êşên xwe tenê bo kesekê bibêjim ku şarezaiya wî hebe ji behsê, heskirinê û êşên qutbûn û dûrbûnê.

**Herîq:**

Yek ji helbestvanên mezin ê klasîkê kurdî ye, navê wî (Salihê Kurê Mela Nesrulla ye di sala 1856ê li dayîkbûye, di sala 1909ê jî koça dawiyê kiriye.) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 D, R. 449).

*Hênde bêzarî ke zanîwme be zarî*

*Dur le balaket serîna naumêdîm nayewe*

*Heyfê hêndet derbeder kird dil le îqlîmî wîsal*

*şîrî mindalît be zehrî hîcir pê hênayewe (Seyîd Necmedîn, 2012, R. 161).*

Wata : Dizanîm gelek bêzarî wek min ji dest dûrbûnê û ez dizanîm çend bikim hewar û gazî tu bi ti awayekê guh nadî wan gaziyên min û nayê û agahiya te nîne ji nala nala min, dûr ji bejn û bala te û evîna te bû bê hêvîbûn, min serê xwe danî ser serîn û êdî li benda hatina te nînim, ji ber te niyeta vegera gel min tineye, ji ber vê jî ez wisa bê hêvî me, heyfe ewqas dilê min ji dûr xist ji herêma bi yekgeheştina me her duyan, ji ber hêvî hebûn bo ez û tu li gel yek bijîn, te bi destê xwe, xwe ji min û xwe jî bi yekgeheştina min bêbeş kir, ew şîrê ku bi zaroktiya xwe de min xwarî ku ez pê mezin bibim, te ji ber sedemên tal û jehrî dûrbûna li xwe ji devê min derxist û ewqas êş dane min jiyana li min tal kir. Helbestvan dûrbûna ji yara xwe wek jehrê bi nav dike, ku jehr madeyeke kuştinê ye û jiyane li mirov têkdibe û dûrbûnê bi wî awayî bandorek li ser derûniya wî daniye ku bi temamî bê hêvî bûye.

### **3.1.3 Dûrbûn û rengdaneya wê di helbestên Mistefa Begê Kurdî de:**

Dûrbûn û cudabûn ji evîn û heskirinê, dibe sedem ku ew evîn zindî bimîne ji ber berdewam evîna bê encam jibîr nabe ((Çarenivîsa dildarî (evînê) ya helbestvan û armanca huner di dahênanê de wek berhem di vê derê de ye ku dildar û yara xwe negehin yek, berdewam ji yek dûrbin. Piraniya helbestên Mistefa Begê Kurdî mijûlê dûrbûnê ye, di hin berhemên wî de armanca helbestvan li ber çave, eger na sifeta giştî di evîna nav helbestê dûrbûn û dûrketina yek e.)) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 C, RR. 237-238) . Dûrbûn li gel helbestvan dibe îlhama helbesta wî û wa lê dike ku gelek helbestên xweşik û bihêz binivîsîne, ew ji xema dûrbûna yara xwe di nav cerg û dil de hest pê dike û hêz û quweta nivîsandinê ji wê verdigre, ji ber vê jî helbestên xwe ve ew êş ragehandiye. (Mistefa Begê Kurdî piraniya helbestên xwe di demekê de gotiye ku dema ji evîndara xwe dûr bûye, dûrbûn kul û êşeke wisa daye helbestvan ku dilê wî parçe parçe kiriye û wisa lê kiriye ku helbestan binivîsîne.) (Sebah X. , 1987, R. 48).

Babeta dûrbûnê di nav helbestên Mistefa Beg de pir bi aşkerayî diyar dibe ku ji ber dûrbûna ji yara xwe nivîsandine.

*Xemî dûrî le ser şanim weku kêwî demawende*

*Umêdî weêl wek mûre , meyan û seruy barîke*

*Beyanî hesret û şerhî xemî dûrî le hîcranit*

*Be kaxez , qet tewaw nabêt û uştir bêne barîke (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 27).*

Wate: Êş û xemên dûr ji yarê ser mil û bedena min wek çiyayekê ye, hêviya geheştina yek ewqas kê m û biçûke ku wek çûna mêhristanê waye û ewqas zirave ku wek bejna dara serû ye, ku dareke zirav û dirêje, aşkera kirina xem û rawekirina xemên dûrbûna ji te qutbûna ji te ye, bi kaxez ango bi nivîsandinê tamam nabe, ewqas zêdene ku hêştir bêt û eger bar bikî tamam nabe.

Helbestvan xemên dûrbûna ji yarê ewqas giran pênase dike ku, li gel wî wek çiyayê Demawend pênase dike, ku giraniya çiya nayê hesap kirin, lê ew helbestvane xemên dûrbûna yara xwe bi wê pîvane dike, li gel wê xemê jî hêviyên geheştina hev ewqas kêmbûye ku pir biçûk û kê m wek mêhristanekê behsa wê kiriye, ango hêviya wî ya geheştina hev ewqas kê m û zirave ku ziraviya wê wek darê serû bi nav dike, lêkdana êş û xeman ji dûrbûnê ye ku bi awayek behs kiriye û bi nivîsandina li ser kaxezê tamam nabe û nayê behs kirin, ewqasê zêdeye ku li hêştirê bar bikî tamam nabe, xweşikî û rêkbûna vê helbestê di wê derê de ye ku behsa kê m û zêdebûna tiştan dike, wekî ku xemên dûrbûna ji yarê ewqasê zêdene ku giraniyek wek çiyayekê li ser wî çêkiriye û hêviya geheştina yek wek mêhristanekê û qasê bejna dara serû biçûk û zirave, di beyta duyem de jî ku lêkdanê bo xemên dûrbûna dixwe û piraniya xemên xwe dibêje bi kaxezê tamam nabe, ji ber helbestvan bixwe dûrbûna xwe bi helbestê dinivîsîne û digehe wê encamê ku nivîsandina xemên wî bi kaxezan tamam nabe û li hêştirê jî bar bikî xilas nabe.

*Çêştîm emrro jehrî (mar) û , rohî şîrînim nehat ,*

*Zexmî konem hate jan û , merhemî birînim nehat*

*Min xemim xward û xemîş xwênî cergimî xwardewe*

*Boye giryam çend be çend firmêskî xwênînim nehat*

*Xem serî lê dam û , yarim qet serêkî lê nedam*

*Ebir û hoşim royewe, xaretkerî dînim nehat (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 115).*

Wate: Min îro jehra mar xwar, armanca wî xemên dûrbûnê ye, lê heskiriya min nehat, birînamin a kevin kelî ku birîna evîn û heskirinê ye û evîndara min ku dermanê wê birîniye her nehate gel min, ku ji min re çareser bike, ji ber bi hatina wê birînamin baş dibe, xem û êşên min ên heskirinê û dûrbûna ji yarê ne û pir ew xem xwarine ku wan

xeman xwîna cergê min xwar, ji ber vê xemê ez gelek giriyam, lê tenê sûda xwe çiyê rondikên bixwîn ji çavên min nehatine xwarê, xeman hemû giyana min dapoşiyê û ez dagir kirime berdewam li gel mine, heskiriya min ne serdana min dike û ne jî hinekê li gel min dibe, ew xeme geleke ku li gel min nebûn û dûriya wê ye, ez aram im lê qutbûye agahiyên min li ser min nemaye, talankirina ol û bîr û baweriya min her nehat.

Helbestvan pir bêhêvî û xembare ji dûrbûna yara xwe û jehr xwariye û hemû nexwaşî û bela hatine serê wî û lê dîsa jî heskiriya wî nehatiye.

*Ey tabîb erê to temate zamî derdim çarekey ??*

*Ta ke germaw germe boy peyda bike, şehdî wêsal (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 271).*

Wate: Ey bijîşk eger tu têy birîna derdê min çareser bikî, ku germ germ li dest neçê, ew rêya xweşî û şirînî bi yek geheştina min peyda bike, Mistefa Beg di vê derê de dûrbûna yara wî ew nexwaş xistiye, ji bijîşk dipirse tu hatiy derdê min çareser bikî? Armanc ji wî derdî dûrbûna ji yara xwe ye ku ewqas bandor li ser wî kiriye û ji ber wê jî bi dirinde bi nav kiriye ku derdeke kuştinê ye û bi bijîşk re dibêje, hîn germ germ çareser bike ku hîn ji dest derneketiye û di bin kontrolê de ye rêya xweş û şirîn a geheştina yek li gel yara wî jê re bibîne, bixwe çareseriya derdê xwe dizane, pêwîstiya wî bi dermanê bijîşk nîne, ji ber pêwîstiya wî bi geheştina yara xwe heye, êdî derd û nexwaşiya jî dikare bi vê çareser dibe.

*Le hîcrî to derûnim wa desutê ,*

*Hemîşe dil tenurî pir le narim .*

*Le taw êşî ceger hawar dekêşm ,*

*Le ber derdî dil giryane karem (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 316).*

Wate: Ji ber dûrbûna te hindirê min dişewite, hemû demê dilê min wek tendûrê teji li agire, ji ber êşa dil û cergê min hewar û êşan dikeşim, ji ber vê derdê ku li ser dilê min de hatiye îş û karê min bûye giryan, helbestvan di vê derê de dûrbûnê pir bandor li ser wî kiriye, ewqas jê nerihete ku dibêje dûrbûn waye min dişewitîne, dil bixwe wek tendûrê ku dema nan tê de tê patin çawa germ û agir tejiye dilê wî jî wisa ye, ewqas bi xem e û dûrbûna ji yarê êş dide wî, wan êşan dil û giyanê wî ewqas êşandiyê ku dibêje, ji ber wan

êşan cerg û dilê min dikin hewar hewar û ji ber vî derdê giran ê dûrbûna ji yarê berdewam ez tenê digrîm û çî tişteki din nakem.

*Le dûrîy (tutya)yî xakî qedemgat , dîde bê nûre*

*Le tînwêtîy le bî leilit dilî dêwane mexmûre*

*Şahenşahî xeyalit, meclîsî bezmî le ten*

*Dilim reqqase, sînem çenge, nalem saz û sentûre*

*Xeyalit pêy nezanî aşqî tom taku dûrkewtim*

*Belî êsta le sayey hîcirta ew eşqe meşhûre*

*Gutim : însaf bike, takey esîrî zahî dûrît bim?*

*Wutî: Hey qur beser, aşq hemîşe zar û mehcûre(Mhemed M. ,Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 587).*

Wate: Helbestvan bi awayekê behsa dûrbûna ji heskiriya xwe dike û dibêje, ji dûrbûn (tutya) ku madeyeke di kevin de dermanê çav êşê yê re hatiye çêkirin, bê toza ber piyê te ve ber çavê min nabe ronahî, dilêminê şeyda û serxweş têniyê lêvên te yên şîrîne, şahê şahan xeyalê kora rûniştina bezm û rezma û sema û mûzîkê lê dide û nal nal û hewar hewara mine wek dengê saz û sentûrê, bîr û hizra te min nezanî heta ku ez ji te dûrketim, naha bi saya vê dûrbûnê ew evîn bû xwedî navûbang, min ji evîndara xwe re got, rast here ma heta kengî dildar û girêdayî çala dûrbûna te bim, wê jî got, ey xwefiserê belengaz ma tu nizanî evîndar berdewam perîşan û girêdayî evîna xwe ye.

Helbestvan di vê derê de dûrbûna ji yar ew tengav kiriye û êşeke zêde di dilê wî deye, ji ber vê jî hewar jê bilind dibin, sedem jî dûrbûna ji yarê ye û bi wî awayî axaftinê li ser dûrbûna ji yara xwe dike, ax û toza ber pêlava yara xwe wek dermanê êşa çavên xwe danaye û jê re dibêje, ji ber vê dûrbûnê ronahiya çavên min nemaye û dilê wî yê şeyda û mest têniyê bo lêvên şîrîn ên yara xwe, bi awayekê bîr û hizra heskirina xwe dike, ku bedena xwe bi awayekê ku koreke mezin datîne, ku di bezmeke mezin ê stran û mûzîkê de ye, dilê xwe wek semakar daniye ku ji ber dûrbûna yara xwe sema dike û singê xwe wek enstrûmanek pênasê dike ku perasiyên wî wek enstrumanek mûzîkê ye û dengê nale nala xwe bi dengê saz û senturê pênasê dike, pir bi êş ve dibêje bîr û hizra te min nezaniye heta ku ez ji te dûrketim min zaniye ewqas ez evîndarê te me, herwaha sedemê dengdana

çîroka heskirina dûrbûnê vedibêje, bi tundî hewar lê radibin û ji evîndara xwe re dibêje here ma ezê heta kengî wisa bim û di kûrayiya zîndana dûrbûna te de bim, ew jî bersivê dide û dibêje xwelîser ma tu nizanî evîndar berdewam perîşane, dilê evîndar dîle û girêdayiye.

*Le ( 'eşq ) û (dûrî) ye (kurdî) , weku bulbul xezel ciwane  
gedayî kuwêy to bim nek , be şahenşahî dunya bim (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 284).*

Wate: Wek çawa bilbil xweşik dixwîne, ez jî ji ber evîn û dûrbûna helbestên xwe xweşikim, hejarê ber deriyê te bim ne ku paşayê paşayê cîhanê bim. Helbestvan (evîn û dûrbûn) jiyana wî tamamî gohertiye, wan du tiştan êş û nerihetî û gelek tişt anîne serê wî, di vê derê de du tişt wek sedemê xweşikî û îlhama helbesta xwe dizane, ji ber vê dibêje, sedem evîn û dûrbûne ku ez wak çawa bilbil bi dengê xweş ve dixwîne, ez jî bi wî awayî helbestên xweşik û li ber dilan dinivînim, evîn û dûrbûn sedemin ku ez wisa xweşik binivînim û dibin sedem ku hestên nivîsandinê bikevin tevgerê, nêzîkbûna ji yar ji wî re xweştire heta nêzîkî paye û pileyan be û tiştên cîhanê keyfa wî bi wê tê ku hejar û belengazê ber deriyê yara xwe be ne bibe paşa û mezinê hemû cîhanê.

Di helbesteke din de ku bi awayek pir xweşik behsa dûrbûnê dike((Parçeyek xatir xwastinê (Karwanê fîrçet) û cudabûnê parçeyek mûzîkek wênegirî, hestek bêkesî û êşên dilê xwe, kul û xemên dûrketinê û xerîbiyê ye)) ('ebdulrezaq, 2006, R. 24).

*Seday karwanî fîrçet dê, delên serqaf le çî yare  
zirey pêşengî hîcret dê , meger kallay xem bare (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 550).*

Wate: Dengê karwanê barberî cudabûnê û dûrketinê tê ji dûrve, dibêjin yara min mezinê karwanê ye û birêve dibe, dengê zir zir û zengila sukra sewalên barberan tê ku guhê min lê ye, di vê dûrketinê de heta tê dengê zir zira dûrketinê di guhê min de her diçe zêdetir dibe, tiştê wê karwanê helgirtiyê û armanca wê barê wê ye, heger xem be eger na ne tişteke dine,

Cuda li lêkdanên berê nêrîna min wisa ye ku ew helbest ewqas bi zîrekî û jêhatîbûnê ve nivîsandiye ku armanceke cuda di vê derê de heye, ew jî dûrbûn û cudabûne û xerîbiye, ku helbestvan bixwe di dûrbûnê de gelek jiyan kiriye û herwaha ji yara xwe cuda bûye û vê wisa lê kiriye ku dûrbûnê gelek tişt lê birine, di vê derê de armanca helbestvan ew e ku dûrbûna ji yarê ewqas lê zor hatiye ku wek karwanekê pênase kiriye, herwaha dibêje (Karwanê firqet) wateya wê xemên dûrbûnê ewqasê lê zore ku wek karwanekê ye û serqafileyê wê ango serok û mezinê karwanê ew yara wî ye ku wek rêveberê karwanê behs kiriye, ku sedemê serekî yê wê xemê ye, zirekiya pêşengî hîcret armanca wî li nale nala dilê wî bixwe ye ku bo dûrketinê ye ji yara xwe û hewar jê tê û dibêje ew karwane belkî xem barkiribin, ji ber ku dûrbûn û cudabûn tenê xemên mezin wisa radike û mirov dixwe rewşeke ne asayî û rewşeke derûnî yar xirab.

Mistefa Beg wekî ku berî naha jî me amaje bi vê yekê kir ku helbestvaneke xembar û dil tejiyê û dil şikestî me pênase kir, ku nale naleke zêde di helbestên wî de tê dîtîn û helbestên wî de mirov vê yekê dixwîne û hest bi vê dike ku ev helbestvan bê hêviye û xembare. Ew hewar û nale nal bo ji dest dana evîndara xwe bûye ku ji destê wî çûye û êş û xemên ku xilas nabin di wî de çêbûne, ev yek jî di helbestên wî de diyare.

Wek di helbesteke din de dibêje:

*Le kuncî sîne dengî ay û oy dil dê be mehzûnî*

*Wêran bê nem dî satê , lêy neyê naley brîndarê (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 137).*

Wate: Di nav dilê min û singê min de ay û oy û herwar tê bi xemgîniyê ve, wêranî be armanca dil ku ti demek nedîtiye ku hewara birîndarî lê neyê. Helbestvan bang jê bilind dibe, ku dengê ax û ofên dilê wî ye ku ji ber dûrbûna yara xwe xemgîne û di nav singê wî de bilind dibe, ku ewqas dilê wî tejiye li xemên ji ber evînê, di nivê beyta duyem de helbestvan bêzar dibe ji dengê dilê xwe, ku duaya wêranbûnê dilê xwe dike û loman dike ku ti demek ne dîtiye ku dilê wî ax û nal nalê cuda nebûye ji evînê ku jê qutbibe, ev jî agahiyê ji xemên giran ên ser dilê helbestvan ji ber ew evîndarî ji kîs çûye.

Mistefa Begê kurdî di helbesteke din de bi awayekê behsa dilê sar ê xwe dike ku di nav ciwan û yaran de ew dilê tejî li xeman a ji bo yara xwe diyar nîne û jê dûre, li ber çavê wî na zivire û dilê wî jî bo ketiye lerizandinê û aramî û biryar lê qutbûye û her çi tiştê xweşik bibîne ti sûda xwe ji bo wî nîne, ji ber bixwe xweşikê heye, lê mixabin jê dûre û nikare bigehê.

*Wa, le kanî sawe , wek gull toqenê kîj dêne xwar  
taq û waz, polî quling û qaz , be rêz bestyan qetar  
Cute biskanyan le cewlanda be ser memkolewe  
her delêy gencî telawsîm pas eken dû tûlema  
Kîj be am wa hatine ser (coxîn) û çawimyan kuwêre kird  
naske, karaske, minyan le nawa (nadiyar)  
Ciwandin ema be min çî ciwanî minyan tiya nebê  
arê, aram nageyêsînin bem derûney bê qerar  
Min ke kuşte û, şêfte û sewda zedey yek dulberim  
(pendî pêşîn ), nexşî berde , dilî yeke, meyde hezar  
Bo minî bêkes, xuda, emrro, çî rojêkî reşe  
axo kê neyhêştuwe, yazîze yar le minî hejar  
Xuwa nekirde, derde dare, daxo çî qewmawe lêy  
ya (reqîb), taqe gulî lem çepkeda kirdûm bijar (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R.  
131).*

Wate: Xweşikî û rêkbûna vê helbestê di vê derê de ye ku li gel hatina xwar a beytê de hêdî hêdî rewş digohere, ew kesên ku dixwînin hest bi vê dike ku ji ber li cîhekê bi dilterî destpê dike û hêdî hêdî yara xwe tîne bîr, û tîne nav helbestê û piştê dikeve ser dûrbûn û cudayiya xwe û yara xwe ku hemû xweşikê ti sûdekî nade wî, ji ber wî tenê yarek heye, piştî beyan kirina evîna xwe bo yara xwe û gazindan li bextê xwe dike. wateya helbestê jî ew e ku polê keç debîne li (Kanî Saw) ku ew cîh li derdora navçeya Silêmaniyê ye û tîne xwarê û tek bi tek û pol û pol û rêz bi rêz dû yek cotên zilfên wan wî alî û aliyê din li ser milê wan de hatine xwarê û li ser memkên wan de şor bûne, wek du kêşkên mar pesnên hebûneke bi nirx bikin, armanc ji wê hebûnê jî cotên memkan e, keç hemû hatine ser coka avê, çavên min jî kur kirin, lê kar xezala min di nav wan de nîne û diyar nîne, hemû pir



xweşikî lê xweşikîya wan bi min çî, ji ber xweşikî min di nav wan de nîne, xweşikîya wan aramiyê nade dilê min ê bê biryar, ez kuştî, dîn û şeyda me heskirî û dîlbera min li min daye, gotinê pêşîyan wek nexwaşîya ser kevir e ku dil yek dile û nede bi hezar kesan, bo min jî tenê û ne ti kesek din, îro rojêke pir nexwaşe û reşe, nizanim yara min li min acize, yan kesekê nehêlaye bê, yan xwedê neke nexwaşe, yan tiştêk din hatiye serê wê, xwedê çavê te li mine, tenê gulek min di nav gulên de helbijartîye.

### 3.1.4 Helbestvanên û Dûrbûna ji niştîman:

Helbestvanên kurd ji ber rewşa nebaş a Kurdistanê di serdemên cuda de û ji ber hebûna tevlihevî ya derve û navxwe û hebûna koçberî û derbederî bûnê, hin ji wan jî ji ber karûbarê taybet ve, hin ji wan jî bi dilê xwe ve li derve jiyan kirine, ew dûrketina ji welat bûye sedemê zêdetir hogir bibin û di dil de niştîman li wan şirîntir be, vê yekê jî wisa kiriye ku zêdetir xem bo niştîmana xwe bixwen û bi helbestan agahî li ser wan xeman bidin.

#### Nalî:

*Lem şerhî derdî xurbete, lem sozî hîcrete*

*dil renga bê be aw û çawa bika ebûr ?*

*Aya meqamî ruxsete lem beyne bêmewe*

*ya meslehet teweqqufe ta yewmî nefxî sur?*

*Halî bike be xufye : ke ey yarî seng dil*

*((Nalî)) le şewqî toye denêrê selamî dûr (Mela 'ebdulkerîmî, Dîwanî Nalî, 1391, R. 206).*

Helbestvan ev helbeste li dûtî Silêmaniyê nivîsandiye, dibêje di dema behskirina xemên wê dûrbûnê li vê dûtîyê dibe di dema behskirinê de dilê min bibe bi av û ber bi çavê min serbikev û ji vê derê ve bi rêya rondikan ve bête xwar, xwedê girawî ez dikarim bêm bo Silêmaniyê û çareseriyek bo min pêktê, yan ji ezê her dûtî bimînim heta qiyametê, tê bigehe ey yara dilreq Nalî bi veşartî jî be silavekê bo te rêdike.

#### Salim:

Ew helbestvane pir çûye xerîbiya niştîman û behsa dûrbûnê kiriye li welat û navçeya xwe (Salim bixwe rûniştvanê Silêmaniyê bûye, lê ji ber têkçûna rewşa Silêmaniyê wê derê dihêle û berê xwe dide Tehranê, li wê derê jî nekariye rihet be û hest bi xerîbî û koçberiyê

kiriye) (Kerwan , 2012, R. 35). Vê yekê jî wisa lê kiriye ku gelek helbestên xweşik binivîsîne, li Tehranê ve jî helbestekê li ser dûrbûna ji niştimanê xwe nivîsiye:

*Le gel dil şerte ((Salim)) ger necatim bê le (Taran) a  
beheşt her bête deştî (rey), be Êrana guzer nakem (Mela 'abdulkerîmî , Dîwanî Salm, 2015  
A, R. 475).*

Wate: Helbestvan behsa dilê xwe dike ku li gel rewşa dûrbûna ji Kurdistanê dibêje, li gel dilê xwe peyman didim eger ez rizgar bibim li welatê Tehranê û xerîbî û dûrbûn û welatê xwe, wê demê carekedin biheşt eger bi wê xweşiyê û avabûnê ve ku misliman û xwedênas hemû hewl û xwedêperestî bo geheştin û şadbûna bi biheştê berîn bête deştê Rey ku navçeyê Îranê ye, wê demê berdeyam û ti demekê naçim bo welatê Îranê û ezê xwe jê dûr bigrim. Ew dûrbûn û xerîbî û koçberî bandoreke wisa li ser pêkaniye ku êdfî bêzar û bê taqet kiriye, herwaha wisa lê kiriye ku ew peymanê bide xwe ku biheşt li Îranê be jî naçe, lê tenê careke din jê xilas bibe.

Yan jî di helbesteke din de dibêje:

*Xozge demzanî le Taranê necatim key debê ?!  
Koyî yare meşhedim , ya metfenim her rey debê ?! (Mela 'abdulkerîmî M. , 2015 B, R. 983).*

Wate: Ew helbestvan ku li dûrî Kurdistanê jiyan kiriye, pir bê taqet û bêzar dibe, ji ber dûrbûn û koçberiyê dibêje, xwazî dixwazim ezê kengî rizgar bibim ji vê rewşa dûrbûnê û vegerim bo cîhê xwe, cîhê mirina min û şehîdbûna min, cîh û menzîlê min e yan koçberiyê, cîhê bi axê spartina min niştimanê min e, yan bajarê (Rey)e, ku ez lê koçberim û li vê derê xwazî dixwazê û bizanê dê kengî xilas bibe, yan jî bizanê cîhê mirin û axê spartina wî kûdere, niştimanê wî ye, yan bajarê (Rey) e.

### **3.1.5 Mistefa Beg û dûrbûna niştiman:**

Eger çavek bi dîwana Mistefa Beg re em derbas bikin, emê bibînin helbestên niştimanî pir kêr dikevin ber çav, sedemê wê jî ne diyare, ew helbestvan wek di hin helbestên xwe de soz ji bo niştiman û bîr û baweriyê xwe ya netewî aşkera kiriye, dibe ku ew helbestvane wek pîranî helbestvanên din ku helbestên wan têkçûne û helbestên wan

ên niştimanî jî dibe ketibe ber wê pêla têkçûnê, ev yek bi tamamî nayê zanîn ((Herçend honandinên di vê derbarê de kêmtir jî be, berevajî helbestên evîndarî, lê ewqas zêde nebin jî agahiya wê yekê didin ku, Kurdî ax û netewa xwe pir heskiriye, baweriya wî pê hebûye)) (Naz, Dengî Mistefa Begî Kurdî le şî'rî Klasîkî Kurdîda, 2014, R. 138).

Mistefa Beg yek ji wan helbestvanan bûye ku koçberî û dûrî Kurdistanê jiyan kiriye, vê yekê jî hêlaye ku hestên netewî li gel wî pîroz bin, dûrbûnê bandorek mezin li ser wî ava kiriye, li hin helbestên wî de ev yek bi ronî diyare, wek berî naha jî me amaje pê kir, Mistefa Beg du nasnavên wî hebûne (Kurdî û Hîcrî) di helbestên wî de her du nasnavên xwe jî bikaraniye, li gor rewşa helbestê ew nasnavane jî piştrast dikin ku ew helbestvan niştiman perwer bûye û hestên netewî li gel wî pîroz bûye. (Wî helbestvanî ji ber heskirina netew û niştimana xwe nasnavê Kurdî xwe daniye û herwaha nasnavê duyem jî ku Hîcrî ye, ji ber ku koçber bûye û li dervey Kurdistanê jiyan kiriye xemên dûrî li niştiman gelek xwarine, ji ber vê jî ew nasnave daniye ji xwe re, wek bibîranîna niştimanê xwe bikaraniye.)(Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 22).

Di helbestên xwe de bi wî awayî gotiye:

*Axa gyana, to deçî bo şar û min lem xurbete  
zehmete yaran xelasim bê le paş em hîcret e  
Herkesê şehidî wîsal û , zehrî dûrîy çêştibê  
ew dezanê derdî dûrî çend giran û zehmete (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 548).*

Wate : Kake giyan tu diçî bo nav bajarê Silêmaniyê û ez jî bi tenê û bê kesî de me û ev yek pir girane ey dostîno ez rizgar bibim li vê qutbûnê, herkesekê tama şîrîniya geheştina bi yek girtibe û jehra dûrbûnê û koçberiyê dîtibe, ew baş dizane xem û êşên wê çend girane. Diyare helbestvan ew helbest ji ber dûrbûn ji Kurdistanê û bajarê Silêmaniyê û dostên xwe nivîsandiye, li gel vê jî diyar nîne ku ev ji kî re dibêje û bo kê behs dike, herwaha wisa diyare dibêje kake giyan ku armanca wî kesek nêzîke, yan jî dosteke nêzîk re vê behsa dûrbûna xwe bo dike, jê re dibêje tu diçî bo bajar, di vê derê de armanca wî bajarê Silêmaniyê ye, ku xweziyê dixwaze ku ji ber bixwe koçber û awareye û dûr ji welat û kes û karên xwe ye bi asanî destê wî nagehe Silêmaniyê û ji wî re zihmeta ji wê rewşê

xilas bibe ji wê qutbûnê, herwaha dibêje herkesekî ku tama xweşiya geheştina yek kiribe û jehre dûrbûnê tam kiribê, ew dizane dûrbûn çend girane, êdî ew dûrbûn ji niştiman be, yan ji dost û xizim û kesûkar be, yan dûrbûna ji yar be, her çi dibe bila bibe lê bi ronî û aşkera diyare ku ew helbest bo dûrbûna ji Silêmaniyê û navçeya xwe bûye.

*Jehrî dûrî çeştuwe (Hîcrî) emêsta boye ke*

*Telix guftare kalamî leilî şeker barekem (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 350).*

Wate : Taliya dûrbûnê min xwariye, ji ber vê jî naha bilêvkerinên min leile û peyvên helbestên min ên berê bi awayê naha ye, helbestvan ecêb maye bi helbest û nivîs û gotinên xwe, lê ji ber dûr bûye ji niştiman û xizim û kesûkarên xwe ew dûrbûnê bandoreke mezin li ser kiriye, herwaha wê bandorê li ser nivîs û gotin û peyvên wî kirine, ji ber vê dibêje wek berê nîne nivîsandinên min, wê dûrbûnê ewqas giran bandor li ser kiriye wek jehr ku madeyeke kuştinê ye, ew yek bi wî rengî pê nase kiriye û dibêje min talî xwariye, armanca wî ji talbûnê dûrbûna ji ax û niştimane, di vê helbestê de jî wek piraniya helbestên din nasnavê (Hîcrî) box we bikaraniye, ku ewqas jê re giran bûye û ew nasnav ji ber dûrbûna xwa bikaraniye.

Mistefa Beg dervey helbestên dûrbûna yar û niştiman nivîsandiye:

Dûrbûna ji dost û xizim û kesûkarên xwe jî nivîsandiye, çend helbestek bo dûrbûna li Salimê helbestvan ku kur mamê wî ye jî nivîsandiye. Di helbestekê de dibêje:

*Le dûrîy, be merg awate xwazim ,*

*Ke cestem xeste û, derdîne bê to*

*Rehî weslit ewende sext û dûre*

*be nûkî derzî , bîr kolîne bê to*

*Zimistan meyleket payîz birakem*

*Beharî weslî tom hawîne bê to*

*Girîm min bûme walî û şah û sultan*

*Tu xwa sa kake giyan ?? Key jîne bê to ??(Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 448).*

Wate: Ji ber dûrbûna te awat dixwazim ku bimrim, leş û bedena min nexwaşe û bi derde bê te, rêya geheştina bi te ewqas dijwar û dûre wekî wê ye ku bi derziyeke biçûk bîreke kûr û mezin bikolî, meylê te sare ey payîz, bira wek xweşikiya buharê awat û hêvî bo geheştina hevdîtina te dixwazim û bahara min bêyte wekî havînê ye, ez giriyam, ez bêyte bûme paşa û mezin, tu bi xwedê kake giyan bêyte jiyane? Derdikeve ku ev helbeste ji ber dûrbûn ji (Salim) nivîsandiye, ku ji yek dûrbûne, gelek car helbestvanan bo yek helbest nivîsandine, diyare ev helbeste jî Mistefa Beg ji ber pir bîra Salim kiriye, ji ber dûrbûna wî awat û hêvî ji bo mirinê dixwaze û jê re dibêje bedena min bêyte nexweşe, êca ji ber her sedemekê be şadbûna wî pir zihmete û ewqas girane û dijware li gel wî, wekî mirov dikare bibêje di helê û bi serê derziyê bîr bikole wisa ye, sarbûna meylê Salim wek sarbûna zivistanê pênase kiriye û jê re dibêje (Payîze bira) wateya wê ew e ku wek payîz salê carekê pêktê, herwaha eger bibe paşa û mezinê cîhanê jî li gel wî wisa ye ku ji Salim dûr be ti tam û lezetekê jê vernagre.

Yan jî dibêje:

*Tebîb dênin deway derdim bika , xo min zerdey dûrîm*

*be bê dûrîy weslî to niye aram û teskînîm (Mhemmed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 338).*

Wate: Bijîşk tînin ku çareseriya nexwaşiya min bike, lê nizanim nexwaş û reng zeriya min dûrbûna ji te ye, bê geheştin û hevdîtina li gel te aramî û sebra min nemaye. Helbestvan ev helbeste bo (Salim) nivîsandiye ku Salim li dervey welat bûye û Mistefa Beg li Silêmaniyê helbest bo wî rêkiriye, behs dûrbûna di navbera herduyan dike û bandora wê jî li ser wî pir hebûye û dibêje dostên min bijîşk bo min tînin ku çareseriya min bike, ji ber ez nexwaşim, lê ew dizanin ku ez nexwaş û reng zerê dûrbûna te ye û bê geheştin û hevdîtina li gel te bi ti awayekê aramî û sebra min nemaye.

Herwaha ji ber dûrbûna ji Ezîz Beg, ku rêveberek wê demê yê Kurdistanê bûye û dostê nêzîk ê Mistefa Beg bûye û helbest nivîsandiye:

*Takey bikêşm ey senema , ahî derdinak ?*

*Wexte tenim le Hîcir û fîraqit bibê be xak*

*Neşey fîraqî toye kurey sexme qerimzî*

*Walî û be barim û , reng zerd û sîne çak (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 264).*

Heta kengî ezê êş û xemkêşê te bim ey peykerê xweşik ê tenê û bikêşim nexwaşî û henaseyên sar û derdên te, waye bedena min ji ber dûrbûna te û qutbûna te têkelî axê dibe, hêz û bandora qutbûna ji te ye ey kurê hêlek sor, ji ber te wisa lêvên min bi bare û rengê min zer bûye û singê min parçe parçe bûye. Mistefa Beg ev helbest bo (Ezîz Beg) nivîsandiye, dema ku jê dûr dibe wê helbestê bo wî dinivîsîne, wê demê Mistefa Beg li dervey Silêmaniyê bûye.

Mistefa Beg helbestê bo (Seydî) helbestvan nivîsandiye ku bi awayê name bo rêkiriye û dibêje:

*Qedem renceke, ger, zerdey hîcrî*

*xeylê muştqaî (deya) ten ( hîcrî) (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 309).*

Wate : Lingên xwe biêşîne û bi westîne were bo gel min, eger tu bê taqet û xemgînî ji dûrbûna min, ez jî gelek bîra hevdîtina li gel te dikim. Helbestvan li gel (Seydî) yê helbestvan ê Hewramî ku heval bûne û helbest bo yek birêkirine, di nav helbestên xwe de behsa dûrbûnê kirine, li gel wî bi awayek jê re dibêje lingên xwe biêşîne, birêya hatinê ya li gel min bilez bike ji ber wî pir bîra wî kiriye.

Herwaha bi heman awayî helbest bo (Ehmed Paşa) nivîsandiye ku desthilatdareke Silêmaniyê bûye û dostayetiya wî li gel Mistefa Beg hebûye, dema bîra Ehmed paşa kiriye behsa Kurdistanê jî kiriye:

*(Dil) griftarî pejarey (Hîcrî) ye, cananî dewê*

*leilî lêwî şekerîn û gewher efşanî dewê*

*Bo birînî (rê) , minî kirduwete (xidirî zînde), dil*

*Qet birî rêge û geyînî ber le (karwan) î dewê*

*Hepsî (sae) yî mîhnet û dûre (diyar) û (yar) e dil*

*Bo şîfay derd, (diyare) çarî, maçî (pêşanî) dewê (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 296).*

Wate: Dil girêyên xem û êşên dûrbûna ji ezîzan û heskiriyan dixwaze bibîne, pêwîstiya min bi amojgarî û axaftinên şîrîn û gotarên bi nirx ên heval û mezinên min heye ku ji devê wan derdikevin, bi birîna wê rêya dûr ku di navbera me de ye, dilê min naçar kiriye bo geheştina bi heskiriyên xwe wek (Xidirê zînde)\* ev lêhatîbûne ku wek ew kes bim û guh bi dûrbûna rê nedim û xwe bigehînimê gel ezîzên xwe, benê di nav bendîxane ango zîndana xem û meynete mine, ji ber dûrim ji niştiman û cîhê xwe û dostan û heskiriyên min bo dermanê derdê dûrbûnê pêwîstiya min bi maçî kirina nav çavên mezinên min û hevalên min heye. Helbestvan ev helbest bo Ehmed Paşa nivîsandiye.

\*Xidirê Zînde: ((Xizir bo hemû cîhekê diçe û berdewam zindî ye û wek pêxember lê tê nêrandin, lê navê wî di Qur'anê de tineye)) (Mhemed N. ', 2009, R. 357).

Mistefa Beg berdewam di honandinên xwe de behsa dûrbûn û cudabûnê dike, diyare ev diyardeye bi temamî bandor xistiye ser wî, ji ber vê bi rêya nivîsandina helbestan ve ew xemên giran ji dilê xwe daye derve, helbestvan di helbestên xwe de behsa ((Babeta dûrbûna ji yarê behs dike û dixwaze aliyê derûnî û soza xwe bixwe bilêv bike û guhdar jî li gel xwe beşdarî vê sozê bike))(Kamil , 1983, R. 167).

## **3.2 Zimanê helbestî yê Mistefa Begê Kurdî**

### **3.2.1 Zimanê helbestî:**

Zimanê helbestî zimaneke bilinde û zimaneke berfireh û kûre, gelek tiştên digre navxwe û bo ronahî kirina peyvên ziman bi hêza helbestê vedibêje, ku di guh û guhdar de wate û bi karanîna peyvan bicîh bike. Helbestvan danûstandin û miamelê li gel ziman dike, ev kare jî asan nîne, ji ber teknîkê bikaranîna peyvan di cîhê herî guncaw de şarezayî û jêhatîbûnê dixwaze, danûstandin pêkanîn li gel ziman di helbestê de cuda ye li gel tişteke din, hêza helbestvan di wê de rê de derdikeve ku ew zimanê nivîsandinê bikarbîne, ku bandorê li ser dil û derûniya xwandevan û guhdar bike, bikaranîna ponijandin û xeyalan babeteke ji aliyê derûnî de pêktê û eger wisa nebe, bandorê li ser hest û soz nayê kirin.

Tiştê herî bingehîn di wêje de zimane, ziman wek hebûneke herî serekî xizmetê ji wêjeyê re dike, ziman birbireya pişt civakê ye, ew rola ku ziman digre serxwe, bi ti tiştêkî

din pêknayê, ziman tê bikaranîn bo aliyên cuda yên jiyana rojane, ev jî xwedî taybetmendiyên xwe yên giringe, herkesek li gor armanc û pêwîstiyên xwe bikartîne. Awayê bikaranîna ziman cor bi core, zimanê rojane coreyekê ye û zimanê nivîsandinê coreyek dine, zimanê helbestê jî coreyek din e. zimanê rojane xwedî taybetmendiyeke sade ye, zimanê nivîsandinê şêwaz û xwedî bernameye, herwaha zimanê helbestê xwedî rûyekî taybete, di nivîsandina helbestan de helbestvan awayê ziman ji giştîbûnê bo taybet bigohere, ev yek ne kareke asane, pêwîstî bi şarazayî û jêhatîbûnê û behredariyê heye.

Ziman rîtim ji helbestê re dibexşe, jêhatîbûna helbestvan di wê derê de ye ku zimanê sade yê rojane xelkê bixe nav qalibê helbestên xwe de, li gor jêhatîbûna xwe bike zimanê helbesta xwe û ji zimanê asayî derbixe. Zimanê helbestî, zimanê azade, helbestvan dikare lîstokê bi peyvan bike, ji her kûderê bîne dikare dayne, li gor pêwîstiya wê babetê ku dixwaze helbestê li ser binivîsîne, li gor ew mercên li gel wate û rîtmê helbestê bi guncê dikare binivîse.

Ziman û bikaranîna ziman pireke bo xwe gehandina bi bîr û nêrînên yek û têgeheştin li hember û li gor pêwîstiyê bikaranîna bo sûd vergirtin li tiştên derdorê ye, l,ê ev tişt li gel helbestvan tişteke dine, giringî û wateya taybet a xwe heye, raste xwe ragehandina helbestvan bi zimanê xwe pêktê, dervey awayê bikaranîna ziman giringiya wî helbestvani ji guhdarên xwe re xwe radigehîn (Zimanê helbestî peyvendiya xwe bi aliyên hunerî ve heye, ev yeke ye wî ji zimanê asayî cuda dike, ji tişteke sade ve wî bilind dike bo nirxbûna helbesta wî, zimanê helbestê bêhtir giringiyê dide ji kûrbûna wate û tejbûnê û zimanê girane, zindiye û nemiriyê ji helbestê re dibexşe, hêzeke efsûnî û bandoreke bihêz heye li ser xwandevan, bê guman ev jî vedigere bo şarazayî û zîrekiya helbestvan a bi rêya helbijartina wan peyv û hevokên ku heldibijêre dikare rîtmê rêk û guncandinekê xweşik ji wê pêkhatiya nivîsê re bibexşe, ev jî wa bike ku bandoreke bihêz bixe ser xeyal û ramanên xwandevan)(Rêbîn X. Q., 2007, R. 58) .

Helbestvan bixwe dikare vê yekê bibexşe ji helbesta xwe re ku zûtir biçe nav xelkê, divê tişteki sivik û sade û xwedî wate ve destpê bike, ku hin xeyalan di dîtîne xwandevanan de û guhdaran de pêkbîne û vê yekê jî dikare bi rêya zimanê helbestê ve pêkbîn. ((Taybetmendiya herî mezin a baş di zimanê helbestê de ew e ku bi ronî û aşkera



be û bê ku giran be. Zimanê helbestê wê demê ronî û aşkera dibe û ji peyvên rojane pêktê.)) (Eresto, 2004, R. 83).

Ne merce hemû demê helbestvan bi zimanê ronî, sade û zimanê rojane ve helbestê binivîsîne, taybetmendiya zimanê helbestî û zîrekî û jêhatîbûna helbestvan di wê derê de ye ku bi zimanê sade dinivîsîne û peyvên di asta bilind de jî bikartîne, ji ber nirx û payeya helbestê dadimezrînei hin caran ew peyvane her peyvên heman zimanin û heman wate ne, lê di nav civakê de û xelkê de nayên bikaranîn, ji ber vê têgeheştina wê li gel hin kesên asayî hinekê giran dibe, di heman demê de her pêwîste helbestvan bikarbîne, ji ber nabe helbestvan hemû demê helbestên bi ronî û aşkera bixe berdestê xwandevanan û bi yek ast û bo yek girseyekê helbestê binivîsîne, herwaha ji bo hêlana giraniya helbestê (Bikaranîna peyvên heman wate yên nehatine bikaranîn di nav xelkê de û peyvên biyanî, yan jî yên hatine kurtkirin, an hatine dirêj kirin, an destverdan lê hatî kirin, sedemeke herî giring û bi bandore bo bidestxistina ronîbûn û aşkerayiyê di zimanê helbestê de, li gel vê jî dibe sedemê bidestxistina zimanê helbestî ji aliyê zimanê pest û sewawe de, rexne li helbestvan kirin di vê mijarê de ne kareke di cîh de ye ku ji ber bi wî awayî helbest dinivîsîne) (Eresto, 2004, R. 84) .

Helbestvan bixwe serbeste ka dê çi mijarekê ji bo xwe helbijêre, hinkes berevajî vê yekê aliyên ast bilind ku tenê çînen rewşenbîr ji wan tê digehin û hinkesên din jî her du şewazan helbestan dinivîsin û hem xelkê asayî li berçav digrin û hem jî girseya ast bilind û ji hemû aliyên re helbest dinivîsin, ji ber vê şarezayiya helbestvan di heman demê de hêvî jî dide. ((Zimanê helbestê azade, helbestvan li gor dilê xwe û li gor pêwîstiyên wê babeta ku dixwaze behs dike û peyvên bikartîne, ji ber vê jî zimanekî huneriye, divê bergeke bingeh bo hatibe kirin hebe û ew bingehê wateyeke taybet bibexşin. Wê demê dive zimanê helbestê ji hin taybetmendiyan zimanên taybet hebin, ku di hemû qonax û serdemekê de li zimanê helbestî de bikar bê.))(şaxewan , 2011, RR. 88-89).

Zimanê hemû netewekê girêdayîye bi nivîsandinan ve, êdî aliyên wêjeyî zêdetir divê giringiyê ji vê babetê bidin û parastin û zindî ragirtin di stûyê nivîsandinên wan ve ye, ji ber di serdema xwe de û piştî xwe dikevin berdestê xwandevanan ku takekesên nav civakê eger bi zimanê paqij û rewanî yên xwe ve nivîsandinan tomar bikin û zimanê

netewa xwe bikin ser meşqa nivîsandinên xwe wê demê dewlemend û bi nirxtir dibe û li gor derbasbûna rojê jî pêşketinê dê ava bikin (Eger nivîskar û zımanasên serdemên cuda bi awayeke zanistî xem li zımanê xwe nexwan, wê demê bi destê xwe zımanê xwe ber bi têkçûnê ve dibin, lê eger berevajî wê yekê erkê ser milê xwe pêkbînin, peyvên nû yê zımanê xwe bînin nav beyanatên xwe, wê demê zımanê xwe ber bi pêşketinê ve dibin, ne wekû dest û çûkên xwe beramber stranên jıyanê birûnên, zımanê xwe bi hejarî bihêlin, an jî hewlbidin peyvên biyanî bînin nav zımanê xwe) (Mhemed N. ', 2009, RR. 30-31).

Bikaranîna peyvên li gel helbestvanan cudaye, her yek ji wan bi armancekê bikaraniye, li gor qonax û serdeman cuda bûye, ev yek jî vedigere bo armanc û rewşa jıyan û derdora helbestvan û zîrekî û jêhatîbûna wî ya derbarê helbestê de û hêz û şarezayî di bikaranîn û lîstok kirina bi peyvên di nav beytên helbestan de (Bikaranîna zımanê helbestî ji aliyê wate û şêwaz ve ji helbestvanekê bo helbestvanek din digohere, di encam de her helbestvanek zımanê xwe yê taybet bi xwe ve girêdayî di xulqîne, ev jî bingehek girîng bo helbestvan ku li ser helbestvanekê pêwîste zımanek dabîne û agahiyê di derbarê xwe de bide, bi awayek be bi zımanê helbestî ve bikarê aliyê nav dilê xwe û buyerên derdora xwe di helbestê de derbixe derve )(Mhemd , 2012, RR. 24-25).

Zımanê kurdî di serdema klasîkan de cuda bû, naha ew jî ji ber sedemên ku têkel bi zımanên din bûye û jê bandor bûye, ev yek bûye sedem ku gelek peyv û zarawa têkel bi zıman bibin ku bi taybet jî (Farisî, Erebi û Tirkî)ji ber nêzîkî Kurdistanê ne, li wan navçane, ew bandor di nivîs û pêkhateyên helbestî yên klasîk de jî piştrastiya wê derdikeve (Bi awayeke serekî zımanê farisî xwedî bandor bûye, ji ber helbestvanên mezin û bilind hebûne, helbestvanên kurd çav li wan kiriye û peyvên wan bikaranîne, herwaha zımanê erebi xwedî bandor bûye û xwedî rol bûye li ser zıman û wêjeya kurdî, bi taybet di serdema klasîk de, ev jî vedigere bo girêdanbûna ola îslamê û nêzîkbûna li sînorên Kurdistanê ve, zımanê tirkî jî bi heman awayî xwedî bandor bûye li ser zıman û wêjeya kurdî, lê bi rêjeyeke kêmtir li gor zımanên erebi û farisî)(Rêbîn X. Q., 2007, R. 59) . Hin caran helbestvanan bi awayek qestî ew peyv û zarawayane bikartîna bo ku asta zımanê helbestî pê bilind bikin,

Di serdema klasîk de peyvên biyanî pir bikartanîn, ji ber ((Di serdemekê de peyvên erebî û peyvên farisî di nav nivîsên kurdî de pir hatûçûn dikirin.)) (Komelêk Nuser, Dîwanî Pîremîrd, 1990, R. 90). Helbestvan pir caran bi zimanê dilê xwe helbestê dadirjîne û tiştê ku di nav dilê wî de ye derdixe derve û dirjîne ser kaxezê û piştê dide ber guhê xwandevan û wa li xwandevan û guhdar dike ku xwe û rewşa xwe di nav helbestê de bibînin (helbestvan pir caran tiştê ku dinivîsîn berhemê jiyan û nav dilê wan bixwe ye ku peng ango kombûye û di berhemên wan de reng daye ku ji nav dilê wan bixwe daketiye û darêjiyaye, ew jî ji ber vê ye ku zimanê helbestî, zimanê beyankirinê yê ji aliyê estetîk û helçûne ango forandinê ye, ev jî bo çêkirina pirekê ye di navber helbestvan û xwandevan de ye, bi wê rêyê ve helbestvan dikare şarazayî û jêhatîbûna xwe bigehîne xwandevan û bi awayekî herî bihêz dikare vê yekê pêkbîne.) (Awat , 2017, R. 134).

Tiştê ku helbestvan dinivîsîne helbeste bi zimanê xwe, ji ber vê bi rêya wî zimanî ve dikare jêhatîbûnê bi encam bike, her bi vê rêyê ve, dikare bo rîtmê helbesta xwe peyvên nû bîne pêş, bi vê yekê ve jî sûdeke baş dide zimanê netewa xwe.(Helbestvan bi rêya ziman ve hewldide cîhaneke pir xweşik û bi wate bi bingeh bike, ji tiştêkê ve ber bi tiştêk din ava bike, çavkaniya wê jî helbest bi xwe ye, ku di nav wêje û huner de nîrx û giringiya xwe heye, helbestvan ji zimanekê zimanek din dixulqîne, bi awayeke watedar bow ate û naveroka ziman dinêre, ji wê ve jî derdikeve ku helbestvan tenê rêkxistina peyv nîne, herwaha ew tiştê li ser helbestvane pêwîste bi awayek hostayî danûstandinê li gel peyvên bike) (Azad E. M., 2009, R. 8).

Ji ber ku ziman berfirehe bo babetên cor bi cor tê bikaranîn, helbestvan bi vê rêyê ve dikare bi şarazayî ya xwe ve peyvên rêkbixê, lê li gel wat û rîtmê helbestê divê bi guncê, hin caran helbestvan peyvên digohere û kêr û zêdebûnê pê dike, ji aliyê şewaz ve di heman demê de tiştêkê nû jê ava dibe (Helbestvan sê ji giştgiriya ziman verdigre, hin caran li sînardarbûnê derdikev û peyvên nû ava dike, bo armancên cuda cuda bikar tîne û hin caran jî helbestvan bo ku ji dûr dirêjiyê bireve hewlên kurt kirinê û biçûk kirinê pêkve bi awayê leqandina peyvên ve dike, ev jî di encamê de dibe sedemê dewlemend bûna ziman )(Dîlêr, 2009, R. 39).Bîkaranîna zimanê helbestî bi awayê wêjeyî rê û pêdaçûn û wateya helbestî ya awayê xweşikî û pir wateyî dibe, bi mercê helbestvan bixwe vê derfetê bo helbesta xwe ava bike. ((Ziman rêgezê ji rêgezên herî giring ê helbestê, ji ber vê jî

pêwîste helbestvan rêyeke taybet bigre berxwe, ku bi wê rêyê ve bikarê wateyan bi awayekî cuda rabigehîne.)) (Luqman , 2009, R. 52).

### 3.2.2 Zimanê helbestî yê Mistefa Begê Kurdî:

Aşkeraye behs kirina zimanê her helbestvanekê, yan jî zimanê nivîsandina her nivîskarekê ji vekirina çend rûpelên teng gelek zêdetire ku mirov dixwîne, ev yek bi zimanê helbesta helbestvaneke jîr û zîrek ê wek Mistefa Begê Kurdî, ku em nikarin bi temamî maf bidin wî, lê her tîşk xistina ser zimanê helbestên wî xizmetek biçû ji helbestvan û helbestvanên wî re jî, di vê derê de zimanê helbestî yê Mistefa Beg me xistiye ber behsê, ku ew helbestvane bi zimanê helbestê yê cuda ji helbestvanên din helbest nivîsandiye. ((Tiştê herî giring a helbestên Mistefa Begê kurdî di zimanê wî de ye, zimanê wî ji aliyê rewanî ve taybet ê wî bixwe ye. )) (Marf X. , Mêjûy Edebî Kurdî, 2010 C, R. 250).

Mistefa Beg ji helbestvanên berî xwe û helbestvanên di serdema xwe de pir bi bandor bûye, lê ji aliyê ziman ve bandor nebûye, ji ber zimanê helbestî yê wî pir taybet bûye û yê wî bixwe bûye û helbestên xwe de ev yek daniye (Helbestvanên wek Nalî û Salim çavkaniya wan a nivîsandina helbestan Mistefa Beg bûye, lê di ziman de teqlîda ti helbestvaneke din nekiriye, herwaha zimanê helbestî yê vê helbestvanî ji zimanê helbestvanên din asantir û rewantire, eger Nalî zimanê giran, Salim zimanê helbijartî û dibiriqê bide helbestên xwe jî, ew yek li gel Mistefa Beg berevajî vê yekê zimanê asan û ronî û rewan dide helbestên xwe)(Azad E. M., 2009, R. 250) . Awayê dariştina û agahî dayînê di helbestên Mistefa Beg de cudaye ji helbestên helbestvanên din, lê bi çî diçe ku awûreke giringiyê lê nedabe (şêwazê helbestên Mistefa Beg henase û nefesek kurdî tî tê de diyare, ji aliyê ziman û dariştin û helbestî ve, lê nivîskarên mezin û lêkolînvanên wêjeyî wek pêwîst lê nenêrîne wek tê xwestin xizmet li ser nekirine û li ser ne rawestane.) (Tel'et , 2011, R. 23).

### 3.2.3 Taybetmendiyên zimanê helbestî yê Mistefa Begê Kurdî:

1-Yek ji taybetmendiyên herî giring ê zimanê helbestên Mistefa Beg ew e ku bi zimaneke sade û rewan helbest nivîsandiye, bi awayek ku xwandevan bi asanî jê têbigehe ne, di piraniya helbestên wî de pêwîst nake di ferhengan de lê bigerî ((Helbestên Kurdî bi vê yekê tê naskirin ku ronî û sadebûn tê de diyare, herkesê ku dest bi xwandina helbestên wî bike, wisa dizane ku ew peyv û hevokên ku helbestvan helbestên xwe pê darijandiye wa dizanê ku ew tiştane berî wê li gel wî jî hebûne û naha jî wekî ku me di jiyana xwe ya rojane de çend caran dubare kiribin û bikaranî bin, lê em nikarin bikin honandin û bergeke hunerî ji bejna wan bibexşin, diyare di vê derê de helbestvaniya Kurdî ji bo derdikeve ku çend jîr û zîrekî danûstandin li gel peyvên sade yên jiyana rojane de pêkaniye û qalibeke hunerî wisa bi xweşikî li ber kiriye ku tameke taybet daye wan)) (Qumrî , 1990, RR. 84-85).

2- Li gel vê yekê jî ku bi zimaneke sade û rewan helbest nivîsandiye, ku xelk bi asayî li wateya helbestên wî têdigihin û lê di heman demê de bi awayeke zanistiyane û aloz û lîstok kirina bi peyvên û bikaranîna peyvên dihêle ku xelk bi awayeke asayî lê tenegehî jî helbest nivîsandiye, diyare ew jî bo çînen bilind ku xwandevanin û şaraza bûne li babetên ziman û têgehestina babetên giran ku ev yek ji taybetmendiyên dibistana klasîk e.

3- Li gor şarazayîya wî hebûye li zimanê (erebî, farisî, tirkî)ew jî wisa kiriye ku zimanê helbestî bilindtir be di nav helbestên wî de.

4- Di nav helbestên Mistefa Beg de awayê veşartî beyanat dayîn û hin girê tîn dîtin, bo nimûne babeta (Qadir) wek berî naha bi awayeke ronî jî me behs kiribû, ku gelek rexne û lêkdan li ser tîn gotin û ew helbestvane bi awayê teknîkekî ziman wisa bikaraniye ku her helbest û lêkdanek li ser tê kirin, dikarin bibêjin helbestvaneke ku tenê bi awayê kariye teknîkê veşartî bikarbîne di zimanê helbestên xwe de ku nivîskarên herî mezin û lêkolînavan xistiye rewşeke wisa ku nekarîne bi temamî rawekirineke temam û bawerpêkirî bo bikin.

5- Yek ji taybetmendiyên din ên zimanê helbestî yên Mistefa Beg jî ew bûye ku, li gor helbestvanên serdema xwe peyvên kurdî bi awayeke zêdetir bikaraniye, di helbestên wî de jî bi awayeke xweşik di helbestên wî de dibiriqê û ji aliyê wate û wêjeyî ve diyar e.

Awayê bikaranîna zimanê helbestî li gel Mistefa Begê Kurdî:

Mistefa Beg şêwazeke cuda ji aliyê zimanê helbestî ve bikaraniye, ev jî vedigere bo şarazayiya helbestvan a di vê derbarê de, ku di helbestên wî de derdikeve, ew jî yek ji helbestên ku bi zimanê helbestên sade û ronî ve nivîsandiye ku şêwazê berdewam ê Mistefa Beg e:

*Ey musulmanîne nabê pê m bilên çîm kirduwe ??*

*Dulberim boçî weha destî le xwênim xistuwe??*

*Penceşî xênawiye û hêştî kûlêk haşa deka*

*swênd dexwa be diro, dellê : Bexwa emin nemkuştuwe(Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 73).*

Di vê helbestê de em dibînim (Mislîman, Dîlber, xwîn, tilî, hene, gul, derew, kuştin) ev peyvane hemû asayî û sade ne û bi berdewamî rojane dikevin ber guhê me û hunerek wisa tê de nîne, ku Mistefa Begê Kurdî bi awayek ew peyvane sade di nav helbestên xwe de bikaraniye ku ruheke hunerî û wêjeyî dayê, ku bi tu awayekê hest bi wê nayê kirin ku ev na peyvên sade yê rojane ne, ev jî vedigere bo zîrekî û jêhatîbûna helbestvan ên di derbarê helbest nivîsandinê û herwaha teknîkê bikaranîna peyvên sade di nav helbestan de teji li wateyên mezin in.

Di helbesteke din de dibêje:

*Çawekem derheq be min, be qisey bedî, bê pîr meke*

*Bê xeta û, sûç û qebahet xot le min dilgîr meke*

*Her ke lêm aciz debî tuxwa were zû bimkuje*

*Çunke qetlim xêre, sa lem kare qet tîrxîr meke*

*Rojî dîwanî xuda destî min û damanî to*

*Qet le bo qetlî minî bêkes be kes tedbîr meke*

*Di beytên din ên heman helbestê de dibêje:*

*Min wutim dîn û dilî (kurdî) nebey, birdûte xo*

*Sa lemewla herçî pê m mumkîn debê teqşîr meke (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 11).*

Di vê helbestê de wekî ku awayê berdewam ê helbestvan ku bikaranîna şêwazê sadeyî û ronîbûnê di zimanê helbestî de bi temamî vê helbestê de heye û peyv û hevok hemû diyar û aşkerane. Wekî (Çavêmin, bê kêmasî, dilgir, aciz, tu xwedê were, zû min bi kuje, qetlamin xêre, li wî karî, roja dîwana xwedê, destê min û dehmanên te, ezê bêkes, ti çi dikarî bike û hemû peyvên wî yên din ê di helbestê de) wan peyvane pêwîstiya xwe bi wateya wan rawekirinê nînin, ji ber bixwe hemû ronî ne û bikaranîna wan berdewam tê dîtîn, lê helbestvan xistine nav qalibeke helbestî û bi zimanê helbestî wisa darijandiye ku tejî li wate û pir bi nirx in.

Di helbesteke din de waha dibêje:

*Dil griftar bû, emin, demgut îlacî nakrê*

*zor zîr û acize xem destî lê helnagrê*

*Xemrewênêkî nebû bêçare, carê bête lay*

*barî derdî suk bika û neyhêlê xem way dagirê (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 151).*

Di vê helbestê de helbestvan peyvên sade xistiye nav pêkhatiya helbesta xwe û wateyeke wêjeyî li ber wan kiriye, dema mirov li peyvên dinêre dikare bibêje hemû ronî û diyarin û rojane bikartên, eger helbestvan zîrek û wêjeyî babetan bi awayê taybetmendiyên helbestê ve ne darijîne, wê demê helbest ji wan peyvên pêkhatibe bi wê xweşikiyê ve rêk dernakeve. Wek diyare (Dil, giriftar, îlac, pir, aciz, dest, xemrevîn, bêçare, derd, sivik, xem) ev peyvane sade û ronî ne, pêwîstiya wan bi lêkdanê û rawekirina ferhengê tineye, herçend ronî û diyarin jî xweşikiya wan aşkera dane helbestê, ji ber şêwazê bikaranînê ji aliyê helbestvan ve bi awayeke jîr û zîrekî bûye, ku ev jî taybetmendiyên Mistefa Begê Kurdî ye.

Helbestvan li gel ku bi zimanê ronî û sade helbest nivîsandiye jî bi awayeke aloz helbest nivîsandiye ku zimanê bikaranîna peyvên bi awayekê ne ku xelkê asayî bi asanî nikarin têbigihin û pêwîstiya wan bi vegera bo ferhengê ye ku ev jî çîneke asta bilind a xwandevanane û şareza li zimanên din e.

Ku di helbestekê de dibêje:

*Çawî fettanî deka sîrrî nîhanî dil eyan*

*waqî a her fîtne esrarî cîhan îfşa deka*

*Merdumî çawit ke dête ser supahî can û dil*

*wek (qecer) daîm be ( qîrçac) î nîga dewa deka (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 64).*

Di dema xwandina vê helbestê de mirov hest dike ku di astekê de hatiye nivîsandin ku mirov nikare bi asanî lê têbiguhe, eger mirov vegere bo ferhengê, ji ber peyvên (Fettan, Sîrr, Nîhan, eyan, waqî, fitne, esrar, îfşa, merdum, can, daîm, dewa) mirov nikare bi asanî lê tê biguhe, em dibînin her yek ji wan peyvên ji hin zimanên dervey kurdî hatine bikaranîn ku ji farisî û erebî sûd vergirtiye, herwaha herçend zimanê wî bixwe kurdî (Sorani) ye, lê lehceyên din ên kurdî jî di nav de bikaraniye, bo nimûne: peyva (sîrr) ji (sir) a erebî vergirtiye ku tê wateya (veşartî) de ye, (waqîa) ji (waqî) ya erebî hatiye ku tê wateya (rastî) tê, (fitne) ku peyveke erebiye û tê wateya (kesê tevlihevî û aloziyê çêdike), di zimanê kurdî de (daîm) peyveke erebiye li kurdî de tê wateya (berdewam – hemû demê), (dewa) peyveke erebiye ku di zimanê kurdî de tê wateya (doz). Herwaha peyva (merdum) ku peyveke farisiye tê wateya (xelk ango gel), (can) peyveke kurdiye, lê bi lehceya kurmanciya jor de tê bikaranîn û sorani jî (giyan)e, ev hemû vedigere bo zîrekî û jêhatîbûna helbestvan ku dikare wan peyvane di nav yek helbestê de kom bike û bê ku giringî û wateya helbestê kêmbike, berevajî vê yekê mezintir û bi nixtir dike.

Herwaha di helbesteke din de dibêje:

*dîsan wa hate gerdiş çerxî çawî mest û fettanî*

*ku gul îqlîmin urze bîrde surdî sefî mujganî*

*Be gabûrî mujey zanîm le gel dil dê be şer, çunke*

*îrş asaye dir, xewxaye, fîrçey sungî dewranî*

*Be haşyey terlik û fîsî keç û gaqî dû ebroy xoy*

*ye le wêrdî bînayî ke ebewu dînî musulmanî (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 206).*



Di vê helbestê de hêz û şarezayî ya helbestvanê me aşkera dibe ku kariye çend zimanekê têxe nav qalibê helbesta xwe û wateyeke xweşik bide helbesta xwe, em dibînin di vê helbestê de çend ziman hatine bikaranîn, wek tirkî, erebî û kurdî di beyta yekem de nîvê yekem de bi zimanê kurdî nivîsandiye û nîvê duyem de jî çend peyvên tirkî bikaraniye û çend peyvek jî erebî di beyteke din de bi heman awayî em dibînin bikaraniye. (Ku gul, îqlîmin, urze, bîrde, îrş, terlik, fîsî, yele verdfî) ev peyvane tirkî ne û Mistefa Beg bikaranîne, ji ber ew bixwe şarazayî zimanê tirkî, herwaha (sefî, gabur, fîrçe dîn) ev jî peyvên erebîne ku bikaranî ye, li gel vê jî peyvên kurdî xistiye tenişt wan her du zimanane û li gor rîtim û wateya helbestê rêxistiye, ev jî şarazayî dixwaze ku bikarê sê zimanên cuda di çarçoveyekê de rêkbixe û bê ku gohertinê di wate û şêwaz û rîtim de pêkbîne.

Herwaha Mistefa Beg (Remz – nîşane) di helbestên xwe de bikarîneye (remz) ku dikarin bibêjin hemû helbestvanan di helbestên xwe de giringî dane wî aliyê, ji ber xwandevan û guhdar dixwe nav fikirandin û rewşeke ku li ser wê helbestê bimînin û ew yek jî xweşikiyê dide helbestê, Mistefa Beg jî wek piraniya helbestvanan giringî daye wan aliyan, remz ango navbirina tişteke di cîha tişteke din de ku armancek li pişt wê ye (Remz wateya wê komkirina gelek wateyan di nav helbestê de bikartê, ev jî giringiya wê di wê derê de ye ku wate an jî zêdetir ji peyvên tê komkirin û herwaha veşartîbûna wateyan derketina wateya tişteke din e, ev yek jî gelek caran ji bo bandor kirina helbestê ya ji aliyê manevî û derûnî ve ye.) (Pexşan , Hewlêr, R. 6).

Wekî ku di helbestê de dibêje:

*Gerdimim ya ge waqî toy têda bê azadî meke  
ge bî min, em mîhnetey pê xoşe to şadî meke  
Hewrî rehmit lazime yeksane bê bo xas û am  
reiyetî xote dexîle ferqî efradî meke*

Herwaha di beytên din ên heman helbestê de dibêje:

*To ke sultanî cîhan û padîşahî alemî  
Dadî mevluman bipirse, heyfe bêdadî meke  
Xatemî mulkî Suleyman layiqî alî ewe  
el eman der uhdeyî (taran) û (bexdad) î meke (Mhemed M. ,Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 15).*

Li gor lêkdanên ( Heme Bor ) di dîwana Mistefa begê Kurdî de ev nameya ku ji bo Ebdulah paşa nivîsiye ku desthilatdar û serdarê serdema wê demê yê Slêmaniyê buye. Ebdulah paşa destê wî di xiyanet kirina walat de hebuye rewşa bajarê Slêmaniyê ji wê demê şûnde têk çûye komelek ji gel ketine ber lêhiya girtinê û zindanî kirin ku Mistefa beg jî yek ji wan buye lê piştî çend rojekê ew azad kirine wî jî ew helbesta xwe li ser vêya ji bo Ebdulah paşa nivîsiye, weke ku diyere navê Ebdulah paşa nehatiye nava helbestê de ku eve di rêya zimanê helbestîve diçe nav çarçevaya bi kar anîna ( remz- nîşane ) eve ku jîrbuna helbestvan diselmîne di daviya helbestêde bi nîşane agahî li rêwşê dike wek li nîve beyta yekem de mebesta wî li ( ge wqî to ) ew zindene ku xistin nav ev jî di duyem de bi şêweyekî daxaz li paşa dike ku weke hev li gelê xwe bike ku peyva ( dexîle ) nîşaneyê ji bo daxwazkirin û derbas kirina zêde û herweha di beyta sêyem de jêre gotiye ku tu ( padşahê alimî ) xwe Ebdulah paşa, paşayê hemî Cîhanê nebuye lêbelê bi şêwazekî xweşik nav lê biriye ku ew zêdetir hest bi berpirsiyartiya xwe bike. Di beyta davî de bi şêwazekî xweşik gilî ya xwe digehîne ( Mulkî Sulêyman ) ew rupela xweşikîyê têde binav kiriye ku mebesta wî li bajarê Slêmanî û alîgirên bajarê Slêmanî û gelên di nava bajarê Slêmani yê buye ku ew hêjayî neheqiyê nînin ku daxwaz lê dike wan nede destê fermanrewayên Bexda û Iran.

Yan di helbesteke din de dibêje:

*Mesxerey dehreke ( bendî hîcrete ) dêwanetan*

*dek felek bart kewê wek rêt le ser ayn nîye*

*wa le yar û memleket bûm , xakî rûy dunyam beser*

*bo yeka êstake karm : bê le girye û şîn nîye (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 90).*

Weku diyare zêdetirî peyvên di nava vê helbestê nîşanin, ( mesxerey dehir ) ku mebesta wî li henekê serdemênei ( bendî hîcret ) em dikarin bêjin ev çavkaniya nîşaneyêye ji bo hevukekî pêşiyane ku dibêje, ( kevir li cihê xwe de girane ) , ( dêwanetan) ev jî nîşaneyê ji bo xwe ku mebesta wî li xwe ye ku dîn û sergerdane vê peyve ji bo sergerdan bi kar tîne,( yar ) ku mebesta wî heskiriya wî ye ku hemû demê bi vî remzê ango nîşaneyê bi nav kiriye û guncave em bêjin mebesta wî ji dost û xizmtiyê buye, ( Memleket ) ku nîşane ye bo walat û bajarê xwe ye ku mebesta wî li Kurdistan û bajarê Slêmaniyê bu

ye, ( xakî ruy dinya be ser ) di vê nîvekê de mebest li wê ye ku axa Cîhanê li ser bê ku eve di demekî de bi kar tê ku kesek tişteke wiya girîng ji dest çûbe. Ji bo me rûnî buye ku hostatî kiriye di zimanê helbestî de ku tiştên xwe bi nîşane bi nav kiriye û xweşikiyeke wêjeyî jêre daye. Mistefa beg li wê şêwazî de bi kar anîna zimanê helbestiya xwe ku me amaje pê kiribu dikarin bêjin bi şêwazekî cuda û bi kar anîna zimanekî helbestî cuda bi kar anîye di helbestên xwe de weke ku di babetên destpêkê de tişteke xistiye sere me ku ev helbestvane zimanê aşkere ya helbestê li piraniya helbestên xwe de nale nal û xem û aloziya hinav û bêhêvî û reşbînî tê dîtin ku eve bi zimanekî helbestî pir wate tîne ziman û taybetmendiyên xwe li helbestên xwe dibaxşîne û weku di

helbestekî de dibêje:

*eman mirdim îlacê, sa le rêy pêxembera çarê wyêal,  
ya qetill û yane teskîn, le hersê bom bken karê  
weha sûta wim eêla tabî firyadim nema sa dey  
refîqan nîwe sutin êwe , namerd 'erze hawarê  
le kuncî sîne ay û oy dill dê be mehzûnî ,  
wêran bê nem dî satê , lêy neyê nalley brîndarê (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R.  
134).*

Her di beyta yekem ve bigre li peyva yekem ve dest bi hewar hewar dike heya daviya helbestê bi vî şêweyî bi lêv dike. ( Eman mirdim îlacê, qetill, weha sutawm û firyad, nîwe sutin êwe, hawarê, dengî ay û oy dill dê, mehzûnî, wêran bê, nalle, brîndarê ) ev peyvana hemû agahî ji bo hebuna xem û xefet û bêzarî û reşbîniya helbestvan ev şêwazê nivîsan û ev zimanê aşkereyî di nava piraniya helbestan de tê dîtin bi zimanê helbestî ji rewşê dibêjê eger temaşeyî nîve beytan bikin şêwaza axaftina rojaneye dikare li cihê şêwaza helbestê weke nirxandina siyasî bi kar bê lêbelê teknîka rêxistin û peyv û riste yên li ser rêya zimanve waha kiriye rewşê biguhere bo helbestekî pir wate û dîtina zimanekî helbestî têda ye vana jî digre ji bo helbestvan bi xwe li rewangeha helbestîve xem û azar û dinya dîtina xwe beyan bike.

### 3.3 Rewanbêjî di helbestên Mistefa Begê Kurdî de

#### 3.3.1 Rewanbêjî

Yek ji malbateke berçav di wê rêyê de derbaz dibe li aşkira kirina milekî bi bandor li ser hizir û derûnê kesê beramber bi rengekiye ku li gel rewşa aşkera û axaftin de bi guncê, rewanbêjê xwe li huner xwe ye di nav babetên wêjeyî de bi kurahiya wê tê dîtin ku ev li ser roxsarve zêdetir bi dest dikeve, rewanbêjî (birêtiye li dirêjbrî bê zêdeyî û kurtbire bê kêmahî di wê rewangê ve mebestan dixin ser hindek car peyveke kêma derdixê ser lê belê wate û mebesteke pir hildigre) (îdrîs ' . M., Layane Rewanbêjîyekan le şîrî Klasîkî Kurdîda le Nmuney Hemdî û Hacî Qadrî Koyî, 2011, R. 18).

Rewanbêjî yek ji hunerên derbirîne, ev mijare ji aliyê netevan de cudaye her yek ji wan rewanbêja dabeşkirina rast û guncave li gel hîlbijartina peyvên pijya û xweşik, li gel Romanan rewanbêjî kêma gutine li cihên berçav dirêjbire li cihê ne ruhî de, lê belê li gel Hindiyan rewanbêjî pêkanî ye li aşkera kirina hest û soz bi hêsanî û bi eşkereyî li gel hilwergirtin û ji bo mebest kirinê, Ereb ji bo wan wisaye ku rewanbêjî kurtbiriye bê kêma û dirêbiriya bê zêdehiye) ('Ezîz , 1972 A, R. 14).

li vana ve derdikeve ku li gel hemî netevan eve ecibandîye ku rewanbêjiya kurt ber bi heman demê wateyeke pir bibexşîne li gel wê jî taybetmendiyên xwe heye ( rewanbêjî mijareke bi pîvane nivîsên xwe pê diherikîne herwaha roxsar li ser naverokê de zal dike û dabeş dike ) ('Ebdulwahîd , 2015, R. 18). rewanbêjî zêdetir di babeta ango mijara wêjeyî de li ser dikeve bi taybet di rêka roxsarve.

Rewanbêjî û aliyên wê ji aliyê kurd ve bi kar hatiye û girîngî jêre hatiye dayîn ( rewanbêjî di nava kurd de dîrokeke wê ya Kevin heye ev aliyana zêdetir li wêje û ayîn de rengdayîneke wê heye zêdetir di nava helbestê de pêrevî ji vê re hatiye kirin û herwaha dikare li nîqaşa nesteq nêzîk bê ) (Muhsîn , 2008, R. 159) ewa li ber çav be û bi rûnî eşkereya wê li derkevê eve ye ku zêdetir di nava helbesta helbestvan de em dikarin bêjin hemû aliyên rewanbêjiyê dibînin li pey helbestên helbestvanan evê cihê lewaziyê dibînin helbestvanên klasîk pir girîngî dane aliyên rewanbêjiyê û bi şêweyeke ku her yek bi helbestên xwe taybet kirine.

(( wêneya rewanbêjiyê yek ji rêbazên hunerî ye herî diyarîkirî yê helbestvanên klasîkî, xwe bi xwe berhemên endîne ango ponijandinê û leyistoka xeyal ya helbestvaniyê ye û binemayeke girîng ya pêkhatina çemka helbestî bu ye di wê qonaxê de )) (Avan , 2013, RR. 58-59).

Mistefa beg yek ji wan helbestvanan buye ku girîngiyê mezin daye milên cuda yê rewnbêjiyê piraniya aliyên xwe bi kar aniyê û hostatî têde razandiye di nava helbestên wî de bi rûnahî derdikeve, helbestên vî helbestvanî pir zêdetir ji wê heldigre ku bi vê çend xalê re behs bê kirin, lêbes di vir de em bi tiştêkî xistina ser çend aliyekî rewanbêjiyê di nav helbestên wî de dirazînin. Ev helbestvan gelek zêde li van aliyên dêde ye ku ev behsa wê dikim lê belê behsa ( rêgez dîtin, teqezkirin, dijî yek, lihev walandin, mulemmei) dikin.

### 3.3.2 Rêgez dîtin:

wateya rêgez dîtinê ewe ku dû peyv yan jî zêdetir bi hev re bî ew dû peyvîn(( di eşkerekirinê de wek yekin û di wateyê de cudane, peyvên bi wate di şêweyê de dişibin hev û di wate de cudane)) ('ebdulwahîd , 2015, R. 133). Mistefa beg ev aliyana kar anîne de di nava helbestên xwe de

Rêgezdîtinê dû curene:

#### **Ya yekem: rêgezdîtinê temam:**

(( rêgezdîtina temam ewe ku hener yan nivîskarê dû sê peyvên waha bîne ku di wata gîştî da kit û mit wekî hev wahabin û bi endaza mûyekî cudabuna wan nebe, lê belê li gel wê de jî heryek ji wan wateya taybet ya xwe hebê wateya wan cuda û realîteya wan yek bê )) ('ezîz , Rewanbêjî le Edebî Kurdî da, 1972 B, R. 7).

bo nimune:

*(Kurdî) mestî durdî badey eşqe wîrdî nevmî wîrd*

*Derdî hîcre ger be herfî kurdî her yare dekat (Mhemmed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 61).*

Em dibînin di nîveka beyta yekem de peyva ( kurdî ) bi kar aniyê ku yek ji nasnavên xwe ve peyvê ( Kurdî ) ku di nîveka beyta dîyemde hatiye bi wateya zimanê bi kar aniyê. Herdû peyvên ( Kurdî, Kurdî ) di heman pîtê pêk hatine û şêwe û rêzbandîya wan her

weke yeke tenê li ser watere ji hevdû cudane ev jî rêgeza temame. Di helbestekî din de dibêje:

*ew heway kewtbuwe kelley xaînanî text xwae*

*textî kird bo sûdî romî , text û bextî dûdman (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 396).*

Ew heway xuyaye di nîve beyta yekem de peyva ( text ) ê bi kar aniye ku bi wateya textî fermanrewaya wê tê, herwaha di nîve beyta duyem de bi heman şêwe peyva ( text ) hatiye ku eve bi wateya rûxan û texta zevî yê tê. Herdû peyva ( text, text ) di hemû aliyêve wekî hevin lê belê li ser wateve cudane ev jî rêgezdîtina bi temame.

Yan di helbesteke din de dibêje:

*( Qadir ) e ( kurdî ) le bo heşrî hemûman ( Qadir )*

*Eşqî ew, zînde dekat û, demrênê, be Elî (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 202).*

Di vir de di nîve beyta yekemde peyva ( Qadir ) hatiye ku bi xwe peyveke Erebi ye bi wateya hêz û tiwana tê ku Mistefa beg bi hêza tiwana xwe bi kar aniye, û di nîve beyta duyem de bi heman şêwe peyva ( Qadir ) hatiye ji yekêye di nîvekên xwe de bi wateya xudayê mezin tê ji ber ku ew dibêje ji bo erşê me hemûyan Qadir bes bi xwe dikare xudayê mezin heşir bike. Herdû peyvên ( Qadir, Qadir ) weke hev wan bi mijahî li ser wateyê cudane ku ev jî rêgezdîtina temame.

Yan dibêje:

*Ehlî Çîn , neqqaşî çakin . Bellan teswîrî to*

*neqşî xamey kirdgare, karî westay Çîn nîye (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 93).*

Di nîveka beyta yekem de peyva ( Çîn ) hatiye ku mebesta helbestvan walatê Çînê buye, ku çî di nîveka beyta duyem de peyva ( Çîn ) ku dibare bi kar aniye bi wateya ristin û çînîn tê ku nexşa Çînê ye. Herdû peyva ( Çîn, Çîn ) weke hevin lê belê di wateda cudane ev jî rêgez dîtina temame.

**Dûyem : rêgez dîtina ne tamam:** ji cureya yekem cudane li ser şêwe û hêjmar û rêzbandî ya pîtanva (( ew rêgez dîtineye, ku dû peyvên di realîteyê de hemû wek hev nînin, wate dû peyvên li ser hejmara pîtanve, yan şêwe ya pîtên wan, yan cureya ango awaya pîtên wan, yan rêzbuna pîtên wan hemû weke hev nînin û cudahiyên wan di navberê de heye, vêja cudahî dikare kêr be û cudahî dikare zêde be, li ser wate peyvê divê her yek wateya xwe ya serbixwe hebe)) (îdrîs ' . M., Layane Rewanbêjîyekan le şîrî Klasîkî Kurdîda le Nmune Hemdî û Hacî Qadrî Koyî, 2011, R. 232).

### **Rêgez dîtîna çend awa yînin:**

**1-rêgezdîtîna netemamiya wê zêdeye:** peyv li ser hejmara pîtve ji hedû cudane bi şêweyê ku peyveke wan hejmara pîtan ji wanên din zêdetire ev jî dibe rêgezdîtîna netemamiya wê zêdeye. Weke ku di helbestan de dibêje:

*Çi şayanim ! Ke ( şa)m hatuwete dîdar bo (mçeta)yê  
ke (şam) rojî drexşane û, çi şukrîm bo bedî nayê (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 278).*

Dibe helbestê de di nîveka beyta yekem de peyva ( Şa ) ku bi wateya Padişah hatiye, lê belê di nîve beyta dûyem de peyva ( şam ) hatiye ku bi wateya nanê şevê tê ku li ser hejmara pîtan wateve cudane ji hevdu ev jî dibe rêgez dîtîna netemam û li ser wata pîtanve.

*Mehrumî serî (lutif) î e (bîmar) îye ( kurdî)  
boyê keserî (Salm) e le hîcranî be samt (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 77).*

Di nîve beyta duyem da peyva ( Salim ) hatiye ku navê helbestvanê mezin ( Salim ) e herwaha peyva ( Sam ) hatiye ku tiştê tirsê de hebe jêre Sam tê gotin ev dû peyv tenê yek (a) yan cudayê ji vî jî rêgez dîtîna netevî ya zêde têgotin

**2-rêgez dîtîna netemam ya şêwe cuda:** ev awana li ser şêweya pîtanve cudane, wekî ku di helbestekî de dibêje

*weku ( bar) î min suk kird, le hîfvî (barî) ya bê ew  
be ( mehbûbî) û be ( mehmûdî) , le her kat û le her layê (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010  
B, R. 278).*

Di vê helbestê de peyva ( mehbûbî ) hatiye û bi heman şêwe peyva (mehmûdî) hatiye netemamin li ser şêweya pît û wateve cudandin ji hevdû.

Di helbesteke din de dibêje:

*bê zuban kû zenan her xanedane seyr dekem  
Enkebût xwace nuşîn û cûtî kundin dîde ban (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 396).*

divê beyta helbestê de peyva ( Zuban ) hatiye ku bi wateya ziman tê û peyva ( Zenan ) hatiye ku bi wateya bêçare tê ku ev dû peyva rêgez dîtina netemam ji ber ku di şêweya pîtêve cudahiya wan heye.

**3- rêgez dîtina netemam li ser rêzbenda pîtanve:** cudahiya peyvan li ser rêzbendî ya pîtanve ye ku pîtek yan zêdetir paş û pêşe di ya dinde ev jî dibe rêgez dîtina netemam.

*Umêdî wesil û dîdarî nema ( hîcrî) le damawî  
hemîşe întîzarî name û peyk û selamêkim(Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 353).*

Di nîve beyta yekem de peyva ( Nema ) hatiye ku bi wateya temam bûn yan jî davî tê, û di nîve beyta duyem de peyva ( Name ) hatiye, herdû peyva ( Nema, Name ) di heman pîtêve pêk hatine lêbelê rêgez dîtina ne temam li ser rêzbendiya pîtêve weke hev nîne bi vîre jî dibêjin rêgez dîtina netemam li ser rêzbendiya pîtve ango tîpve

*Multecî nabê be kes ( kurdî) le dunya û axîret  
rojî dîwanî xuda destî min û damanî eşq (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 257).*



Di nîve beyta yekem de peyva ( Dunya ) hatiye û di nîveka beyta duyem de peyva ( Dîwan ) hatiye ku mebesta wê roja daviyê ye. Herdû peyv ( Dunya û Dîwan ) di heman tîpê pêk hatiye lêbelê li ser rêzbendiya tîpêve cudane.

**4- rêgez dîtina netemam ya cuda:** ev avayana (( eşkereye li hebuna dû peyvên hevbeşve, ku bi tenê di yek tîpê lê cuda bibin)) (îdrîs ' . M., Layane Rewanbêjîyekan le şî'rî Klasîkî Kurdîda le Nmuney Hemdî û Hacî Qadrî Koyî, 2011, R. 233).

*Şorî emcarem le corî bezmekey ( Şîrîn ) nîye*

*Newî suday kake mem ya şewqî ( xatû zîn ) nîye (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 90).*

Di nîve beyta yekem de peyva ( Şor ) hatiye ku bi wateya hewar tê bi heman şêwe di nîve beyta duyem de peyv ( Cor ) hatiye ku bi wateya tê ev dû peyv ku tenê tîpawan ya yekem cudaye ev jî rêgez dîtina wêya netemam e.

*Le ( Seyl) î eşkî çawanîm, (qum) û (Xerq) e heta (ferq) m*

*be (bilq bilq)î nefes ferqim eken, xerqim le deryada (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 47).*

Di vê helbestê de peyva ( Serq ) hatiye ku bi mayîna wînda bunê tê bi heman şêwe peyva ( ferq ) hatiye ku bi wateya navçavan tê. Ku herdû peyv di yek tîpa destpêkê de cudahiya wan heye ji vîre jî tê gotin rêgez dîtina netemam ya cuda.

**5- rêgez dîtina netemam ya Teshîf:** ev avaya yekeye ji wan rêgez dîtînanê ku (( li ser hejmar û şêwe û rêzbunanve weke hevîn, lêbelê di xala ser dengan ji hev cudane)) (Naz, Dengî Mistefa Begî Kurdî le şî'rî Klasîkî Kurdîda, 2014, R. 191).

*Zelîl û bêkes û zar û perêşan hal û bê malim*

*weku min kes nîye bem renge kuştey xalî ala bê (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 104).*

Di nîve beyta yekem de peyva ( hal ) hatiye ku bi wateya rewş tê û bi wateya çawaniyê jî tê, herwaha di nîviya beyta duyem de peyva ( xal ) hatiye ku bi wateya peyva ( xal ) xalek li ser tîpa (x) ve cudabuna wan tenê tîpa ( x, h ) ye

*ya defermûne : çîye ?? Em uzletî wehiş alûde,*

*ya : le cil arî, le kul (xar)î, le (xar)î le jyan (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 382).*

Di nîve beyta duyem de peyva (aar) hatiye ku bi wateya rût tê, lê belê bi heman şêwe di nîve beyta duyem de peyva (Xar) hatiye ku bi wateya Şikeftê ye, em dibînin di heman nîve beyt de peyva (xar) careke din hatiye ku bi wateya dûr ketene tê, ev dû peyv tenê cudabuneke xala sere tîpa(x)deye ji van awayan re dibêjin rêgez dîtina netemamya( teshîf ) ku cudahiya wan tenê xala ser tîpane.

### **3.3.3 Teqez kirin:**

Bi wateya dû car hatina peyvê yan jî zêdetir li pey hev de li heman beytê de li kêleka hevdû bi heman wate hindê car jî çend peyvek dikeve navbera wan, mebest ji bi kar anîna wan zext kirine li ser tiştê yan ji bo rêxistina helbestê jî guncav dibe. ( peyv di heman demê de dubare dibe, mebest jê zext kirin û gef xwarin û gazind kirin û çend tiştên din digre, li gel wê jî ji bo xweşik kirina beytê bi tê ev jî diyardeyê huneriyê, ev rêgeze di hindê hewlestên diyarkirî de tê bi kar anîn ) (Îdrîs ' . M., Layane Rewanbêjîyekan le şîrî Klasîkî Kurdîda le Nmune Hemdî û Hacî Qadrî Koyî, 2011, R. 247).

*Daîma destî dua bendmu şayet zû zû*

*( şa) î sefer kirdeyî min bêtewe bê îciz û çihrer (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 136).*

Peyva (zû zû) ku di nîve beyta yekem de hatiye mebesta wî ji zext kirinê tê.

*Be qye dozî cgerî let letî şimşêrî cefa*

*merhemî sîneyî mecrûhî sînanî hîcran (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 382).*

peyva ( let let ) di nîve beyta yekem de hatiye mebesta wî bi zext kirinê hatiye ku wateya peyvê ji perçe perçe tê

*Çak çakî tîre baranî mujey to , sîneme*

*bo xerabî çake, em wêrane, abadî meke (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 15).*

peyva (çak çak ) ku di setpêka nîve beyta yekem de hatiye  
helbestvan bi mebesta zext kirinê bi kar aniye.

Mistefa begê Kurdî bi rengê din teqez kirinê bi tine di nava beytên xwe de lê belê bi  
şêweyeke cuda cuda, mînak:

*Çaw qatîlî aşq bû, (cadû beçe) bû eyyar*

*bo ( şwêne wunê ) desrrê em xwêne be damant (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R.  
91).*

Di nîve beyta düyem de dû car peyva (bû) hatiye ku eve teqez kirine.

*Nexşî vahîr bagnîkî pak û bêgerdî dewê*

*Sebhe ghuqî zahîde sed car eger sed wanebê (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R.  
108).*

Di nîve beyta duyem de dû car peyva (sed) dúbare buye ku bi mebesta zext kirinê bi  
kar aniye.

Derveyî wan cure dúbareyên ku Mistefa beg di helbestên xwe de bi kar anîne ku me behs  
kir ( em dikarin bêjin ew hemû herwaha di asta sitûn de jî dúbare kirina wî heye vêja di  
sînurê çend beytan de jî bê)(Naz, Dengî Mistefa Begî Kurdî le şî'rî Klasîkî Kurdîda, 2014, R.  
309).

*zuyr mebe kewtûme dawî zullf daney xallî to*

*ya be her muxê reza be , ya be êeyadî meke*

*ya be neşey şerbetî şayîtewe bbeyne ser*

*ya ke zehrit pê lenaw eçê çî qennadî meke(Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 15).*

Em dibînin di sê nîve beytê de peyva (ya) dúbare buye.

*wtim : rawî dillt kirdim, wtî : kollî şkart bûy*

*wtim : çare ? Wtî : aşq wehaye, Seydî meşume*

*wtim : zexmî dllim, bes karîye, tund buwe,*

*wtî laço be min çî ? Tîre baranî nîgahî çawî cadûme (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 57).*

di nav vê helbestê de em dibînin sê car peyva (wtim) ango min got, dûbare buye ku bi peyva situna vê jî teqez kirine bi şêweya situnî.

### 3.3.4 Dijî yek:

yek ji aliyên rewanbêjî yê eşkereye li ( anîna dû peyv li dijî hevdûne, yan jî ber bi rûkirina dû peyvane ku di wateyê de li hev pêçandinên hevdûne) ('Ezîz , Rewanbêjî le Edebî Kurdî da, 1972 B, R. 68).

dijîyek dû cureye ( dijyeka neyînî, dij yeka erênî )

**1-dijyeka neyînî:** ev awana bi şêweyeke peyva nerê kirinbe weku ( hat, nehat).

*Xem serî lê dam û, yarm qet serêkî lê nedam*

*Sebir û hoşm roywe, xaretkirî dînim nehat (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 115).*

Peyva ( min lêda ) û peyva ( min lê neda ) dijî hevin di cihê neyînî.

*Ew cefa û cewrey ke ( kurdî) lew nîgarey çeştuwe*

*Sed, ke bêar bê, debê bo çî le roh bêzar nebê(Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 111).*

Peyva ( dibe) di nîve beyta duyem de li gel peyva ( nabe ) di heman nîve beytê de dijî hevin bi awayê negative ango neyînî.

*Min ewa bo hecuîy pîrêjn dllim kewte frîn*

*ba bkem hecuîy kewate : qeg nekem teqêyr le qîn (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 418).*

di nîve beyta duyem de peyva ( Bikim ) li gel peyva ( Nekim ku di heman nîve beytê de ye bi awayê neyînî dijî hevin.

**2- Dijî heva erênî:** ev awana bi şeweyekî herdû peyv tu pêwendiyeye wan bi hev re nine her yek ji wan rêgezekî ser bi xwe ne.

*Le sîney pir bilêsem, hênd, dekêşm ahî germ û serd*

*Xelîfî toye, dil boye, kenarîş pêy çihrer nada*(Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 47).

Di nîve beyta yekem de peyva ( Gerim ) û ( Serd ) hatine ku dijî hevin di cureya erênîde.

*Sayqe û berqî nhûsed vulmetî da şerq û xerb*

*berde barane, be mexêwêy le ser mulkî beban* (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 396).

Di nîve beyta yekem de peyva ( şerq ) hatiye ku wateya wê rojhilate û bi heman şewe peyva ( Xerib ) hatiye ku wateya wê rojava ye ku ev herdukana dijberê hev yên erênîne.

*Be bê kes mamewe bê naz û bê yar*

*şew û roj nalle û hawarî min bû* (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 442).

di nîve beyta duyem de peyva ( şew ) hatiye herwaha peyva ( roj ) hatiye ku dijberin ji awaya erênî de.

### 3.3.5 Lêk dan:

Bi wateya çandina tişteki bi tişteki yan çend tişteki li ser wateva, ku di sifetda hev beşin di rêya emrazên wî lêk danin, wek hev ji bo derxistin û runahî kirina tişteki nediyare, ku bi tişteke diyar û naskirî tê çandin, ya derxistina fikir û soz yan razandina aşkera kirinê )) ('Ebdulwahîd , 2015, R. 71).

Bingeha serekiyên lêk danê.

**1-lêçu:** yek ji bingehên girînge lêkdanê ye ( lêçû sifetek têdeye ku bi tişteki din tê lêkdan ku heman sifeta wê heye )('Ezîz , Rewanbêjî le Edebî Kurdî da, 1972 A, R. 25).

**2- lêwçû:** bingeheke sereke ya lêkdanêye bi vî tiştî re tê gotin ku tişteki din jêre tê lêv kirin ( ew tiştta ku jê re lêçûyê tê lêvkirin sifeta aşkereye) (îdrîs ' . , (Lêkçuwandin) le Edebî Kurdîda, 2004, R. 32)lêçû û lewçû di navbera wan de heman sifet heye.

**3- Emraz:** Emrazekî rêzimanîye ku tê bi kar anîn ji bo girêdana lêçû bi lewçûve, evana ku pir bi bingehe nînin di nava helbestê de nabe ji ber ku sereke nîne .

**4- lêlçûn:** tê wateya wê ku ( lêçû û lêwçû ) di sifetande lê dicing ( dema helbestvan dû tiştan bi heve dike divê yek alîbe ku di wê xalê de hevdû bigrin û hevçîh bin û sifeteke wan hebe êdî li ser wê bingehe lêkçû ava dibe) ('Ezîz , Rewanbêjî le Edebî Kurdî da, 1972 A, R. 30).

Li hev çandin li pey hebûn û nebûna bingeha ne serekiyan:

**1-li hev çandina reha dirêj:** (( ew li hev çandina ku her çar rêgezan ( bingehan ) bi eşkere tê de hatibe )) (îdrîs ' . M., Layane Rewanbêjîyekan le şî'rî Klasîkî Kurdîda le Nmuney Hemdî û Hacî Qadrî Koyî, 2011, R. 122).

*key ewe mehbûbeye ? Ger bê wefa û xwên xwar nebê ?*

*Hellqe hellqey zulfî, wek zincîrî des zor dar nebê ?(Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 111).*

lêçû: zulf

Lewçû : zincîr

Amraz : wek

Rûy lêkçûn : hellqe hellqe

Mistefa beg zulfa yara xwe bi pêçandina heşqeyên zincîran bi nav kiriye. Ev awayê li hev çandinê her çar aliyên xwe li hevçandin tê deye jêre li hevçandina reha dirêj tê gotin. Yan di helbeta xwe ya din de dibêje:

*perçemî çeşnî perrî tawus ke dedrewşêtewe*

*hênde nerm û xawe wek awrîşme ya ( tûkî tû) we (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 73).*

Lêçû : perçem- al

Lewçû: perrî taws – Balê tawus

Emraz: çeşn- çav

Lêkçûn : derdewşêtewe – diçirise

Helbestvan perçema heskiriya xwe bi per angò baskên nerim yê melekê tawus bi nav kiriye dir eng û biriqandinê de.

**2- li hevçandina rêhê pijandî:** ji vê li hevçandinê re têtogin ku rûyê lêkçûnê tê de nîne.

*Min le pîrî qedim xem nebuwe ger bawerr dekey*

*qet xemî dey fîrquetî ballay weku lawlawî tom (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 343).*

Lêkçû: bala -bilind

Lewçû : law law- lav lav

Emraz : weku-weke

Lêkçûn :

Mistefa beg di vê helbestê de bejna yara xwe bi lav lav ku dareke bilind û zirave bi nav dike ku ( li hevçû, lê çû, Emraz ) tède ye lêbelê li hev çandin tède nîne ji vê re jî lêkçûna reha pijyayî tê gotin

*Wtim , qurban bke rehmê be hallm ,*

*wtî , çi bkem dllî min mîplî senge (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 47).*

Lêçû : dllî min – dilê min

Lewçû : senge - kevir

Amraz : mîplî

Lêkçûn :

Mistefa beg dilê yara xwe weke kevi binav kiriye ku ( lêçû, lêwçû, Emraz ) tê de hatiye lêbelê rûyê lêkçûnê tê de nine.

**3- li hev çandina cuxteya dirêj:** ev awana ( lêçû, lêwçû, rûyê lêkçandin ) ê têde ye lêbelê Emraz têde nîne.

*Eger yek lemhe xafl bim, le şewqî mahî ruxsart ,*

*le heşra, bê ( neêyb) î cennet û , rûbarî kewser bim (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 294).*

Lêçû : ruxsar - roxsar

Lewçû : mae -heyv

Amraz :

Lêkçûn : şewq –şewq

Helbestvan roxsara heskiriya xwe bi rûnahiya heyvê bi nav kiriye ku ( lêçû, lêwçû, lêkçandin) tê de heye lêbelê Emraz têde nine.

*Şkandî qîmetî şekker , nebatî lêwî şîrînt*

*geyandîye meryemey meryem xeyallî rûy nîgarînt (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 123).*

Lêçû : lêw - lêv

Lewçû : şekker- şeker

Amraz : \_\_

Lêkçûn : şîrîn – şîrîn

Helbestvan divir de lêva yara xwe bi şîrîniya şeke çandiye ku ( lêv, lêvçîç, lêkçûn ) têde heye lêbelê Emraz têde nine ji vê re jî li hevçandina cexta yan jî zexta dirêj tê gotin.

**4- li hevçandina zexta pijandî:** ev awana tenê ( lêçû, lêwçû ) têde heye ne lêkçûn û ne Emraz têde nîne.



*Şox û mehbûb û Igîf nazkî*

*çaw xezal û newnemamî newberî (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 158).*

Lêçû : çaw - çav

Lewçû : xezal- xezal

Amraz : Emraz

Lêkçûn : - li hevçandin

Helbestvn div ê helbestê de çave yara xwe bi ciwantî çandiye ku ( lêçû, lêwçû) têde heye lêbelê ( Emraz, lêkçûn ) tê de nîne.

*Lawî qed lawlawî min ger bê be naz çaw hellbrrê*

*wa dezanim : şêx le min zûtir le îman wergerrê (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 145).*

Lêçû : qed- bejin

Lewçû : lawlaw –lav lav

Amraz : emraz

Lêkçûn : li hevçûn

Helbestvan ziraviya bijna yara xwe lav lav bi nav kiriye ku (lêçû, lêwçû) têde heye lêbelê ( lêkçûn û emraz ) têde nîne lewma jêre dibêjin li hevçandina cexta pijyayî.

### **3.3.6 Melemme:**

yek ji hunerên rewanbêje ku helbestvan di nîve beyta xweya yekem a helbestê de bi zimanê xwe dinivîsîne nîveka din jî bi zimanekî cuda li zimanê xwe dinivîsîne, bêguman ev jî digere bo zimanê helbestvan û şarezayîya li zimanên din. Mistefa beg jî yek ji wan helbestvanan buye ku ev hunere bi kar anîye (( Kurdî yek ji helbestvanên dewlemend ê hunera Mulemme ye weke ku bêje biryar dabe Mulemme bi hemû zimanên naskirî danîbe) (Marf X. , Le Babet Mêjûy Edebî Kurdîyewe, 1984, R. 204). helbestvan bi zimanê ( Tirkî û Erebi û Farsî ) mulemme nivîsiye .

Ji bo zimanê Erebî:

*Umrim ewende kafye satê bebê reqîb*

*(rnivir alî cmalk ruhî tkin fdak )*

*şerhî fîraqî ( kurdî) be kes nallêm êstake*

*(rruy cmî halte hînma îrak ) (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 A, R. 264).*

Ji bo zimanê Tirkî:

*weha bêbake bo qetlî mnî bê kes dellêy emrro*

*gêtrimiş başmin fitwasnî şewketlî fermanî*

*bllên meytanî şîn , bo te'zyey ( hîcrî) nekate ber*

*Eza gugimhigle îhya îtmemîş meqtûlî hîcranî (Mhemed M. , Dîwanî Kurdî, 2010 B, R. 206).*

Ji bo zimanê Farsî:

*xoşm, qurban, be bendîxane û zincîr û sêdaret*

*beşrt anî ke narî bristr min tenî axyart*

*dlim mehbûse cergim let lete eqlim le des derçû*

*be tîx hacb û zlif kmend û çêşim shart (Gîwî , 1387, R. 15).*

## Encam:

1-Mistefa begê Kurdî ji malbateke mezin û binavûdeng weke ( Sahêb Qiran ) buye ku malbata wî navdar û xwendevar û payedar bune û çendîn kesayetên mezin dinava wan de rabune bi taybet ji asta helbest û wêjede ji wan helbestvan ( Salim, Hemdî ) buye û çendîn kesayetên din. Viya jî wisa kiriye helbestvan zêdetir giringiyê bi de warê helbestê.

2-Mistefa begî Kurdî yek ji damezrînerên helbestên klasîkê kurdî ya kurmanciya jêre ku rol û pêngaveke wî ya girîng hebuye di pêşketin û bawerî dana bi wê dibistana helbestê de. Bi awayekî ku bandoreke wî ya bi temam hebuye li ser piraniya helbestên serdema xwe û li pey xwe hindek ji wan pênc lîste li ser helbestên wî nivîsîne û hindek ji wan jî di şêwaz de lasaya wan kirine.

3-Ev helbestvan ku hevserdemên çend helbestvanekî mezin buye ku bandora wan li ser hevdû hebuye helbestên nêzîkê hevdû nivîsandine li kêleka wan jî Mistefa begê Kurdî rêbaz û rêyeke xweya taybet hebuye ku pê helbest nivîsiye wî jî bi bikar anîna peyva kurdî tîpî û peyva sade û karên rojane di nava helbestên wî de ku xweşikiyeke wan ya taybet bexşandiye helbelên xwe ku eve di rêka wêjeyê ve jêre tê gotin ( Shil mimtin) yanî sade û rûniya aşkere kirinê de ev peyvên sade ruyekî xwe yê sade nedane helbestê ji ber ku rûpelekî tije wate û hunerî danê de.

4- li pey wê ku me xwendina xwe ji bo temamiya helbestên wîye kurdî kiriye em dibînin peyva ( Erebi, Farsî, Tirkî ) di nava helbestên wan hatine, ev jî dizivire bo zimanzanê helbestvan hebuna zarezariya xwe hemû di zimanên Erebi, Farsî û Tirkî ev jî wisa kiriye çendîn helbestên asta wan cuda binivîsîne ji ber ku asta rewşenbîriya helbestvan bilind û xwener û şaraza buye.

5- mijarên ( Qadir ) di nava helbestên Mistefa beg erkekî pir hilgirtiye ji aliyê nivîskaran û lêkolînavan heryek ji wan bi şêweyekî li ser asasê lêkdana xwe ev mijara rûnî kirine lêbelê li ser piştgirêdana bi lêkdanê û dûde çûna helbestên wan ji bo me derket ev babete têbîneke mezin buye ku helbestvan bi şêweyekî mebesta wî ( Qadir ) ji me re

lêkdide ku keseke ji navên xwedê helbestvan jî pêşengê ayîna îslamê buye ji ber wê navê xwedayê mezin bi Qadir aniye, di cihekî dinde mebesta wî ji peyva ( qadir ) hêz û qiwete ku peyveke Erebiye û helbestvan bi xwe şarezayîya wî hebûye di zimanê Erebi de, bi şêweyeke din peyva ( Qadir ) bi kar aniye ku mebesta wî ji terîqeta ( qadirî ) buye herwaha navê (Qadir)î aniye ku birazayê wî buye pir jê hez kiriye ez evim ji bo jîrî û lêhatina helbestvan vegehandiye ku kariye bi çend şêwazekî vê peyvê bi kar bîne bi mebest û wateya cudahiye ve bêku giranbunê di helbestê de kêmbike.

6- Helbestên klasîk a kurdî bi kurmanciya jêrîn li pêş dibistana helbestî ya Mistefa Begê Kurdî û hevalên wî hatine nivîsandin, tenê ew nebe ku çend helbestvanek kêmbin ew jî bi awayê milî bûye ku helbest nivîsandine, lê li gel damezrandina dibistana helbestî ya helbestên kurdî pêşketinek berçav karîne bidest bixin.

7- Rewşa jina kurd ji aliyê demê ve her bela û xemgînî bûye, bi astengiyên destê zilamsalarî û rêgiryên wê bûye, lê li gel vê jî li gor netewên din jina kurd serbestiya wê zêdetir bûye û rola xwe hebûye, di gelek aliyan de li gel tengasî û astengiyên rewşa wê li gor gelên din baştir bûye.

8-Li gor lêkdanên helbestên helbestvan geheştine bi wê encama ku ew helbestvane evîndarî jinekî bûye û gelek helbest bo nivîsandine û bi awayeke xweşik wesfa endamên bedena evîndariya xwe kiriye û bi hêvinê gelek helbestên pir wate û teji ji tam nivîsandiye.

9- Di encama negeheştina bi evîndara xwe biryar daye ku ti demekê jiyana hevjinîyê pêkneyne, ev jî xemeke mezin di dilê helbestvan de çêkiriye û di piraniya helbestên wî de dengê hewar û nale nalê bilind bûye û ew cudayî û dûrbûna wî bandoreke mezin çêkiriye û herwaha li dûrî niştiman de jiyana kiriye, ew dûrbûn bê taqetî di wî de çêkiriye û ji ber vê jî yek ji nasnavên wî jî (Hîcrî) bûye û ew nasnav jî ji ber dûrbûna wî ya li welat bûye, herwaha gelek helbestên wî hene li ser dûrbûn û cudayiyê.

10- Bi awayê hunerî aliyên rewanbêjî di helbestên wî de bikaranîna ku her yek ji huneran têdaye, bi coreyekê berê xwe daye wate û xweşikiyê û bêhtir di helbestên wî helbestvanî de bi nîrx bûye, ku ev yek jî li şarezayî û jêhatîbûna helbestvan çavkaniya xwe digr

## Çavkanî

- 'Edalet, & 'umer, S. (2002). *Enfal û Afretî Kurd* (Yekem ed.). Hewlêr: Aras.
- 'Elaedîn , S. (1996). *Mêjûy Raperînî Kurd* (Duwem ed.). Êran: şarî Kurd.
- 'Elî , X. (2013). *Afrete Newdarekanî Kurd*. çwar çra.
- Ahmed, T. (2010). *şêx Rezay Talebanî ; Kele şa'ri Xorhelatî Nawerast* (Duwem ed.).  
Hewlêr: Aras.
- Aram , K. (2009). *şere Sipyekan*. Slêmanî: Bînayî.
- ARî , ` . (2004). *Peywendî Xoşewîstî le Nêwan Wehim û Gumanda*.
- Aştî , ` . (2012, Payz). Xoşewîstî le Komelgey Bawksalaryda. *Tewar*(40), 29-32.
- Avan , ' . M. (2013). *Ferhengî şî'rekanî Salm Leber Roşnayî Edebî Farsîda*. Slêmanî: Kemal.
- Awat , R. K. (2017). *Deqî şî'ri Afretî Kurd (1970-1991)*. Germiyan .
- Awring , E. (2008, Payz). Rolî Jin le Rojnamey Kurdîda. *Tewar*(24), 5.
- Azad , ' . K. (2005). *Sosyolojyay şî'ri Kurdî le Rûy Pêwere Akarîyekanewe*. Hewlêr: Wezaretî  
Perwerde.
- Azad , E. M. (2009). *Bunyatî Zman le şî'ri Hawçerxî Kurdîyda 1985- 2005*. Hewlêr: Hacî  
Haşm.
- Bêdar , ş. (2013). *Gulzarî şaîranî Kurd* (Yekem ed.). çwar çra.
- Bedirxan , S. (2008). *Komelgay Kurdewarî le Dîdî Rojhelatnasîda* (Yekem ed.). (î. îsma`îl,  
Trans.) Dhok: Xanî.
- Burhan , Q. (n.d.). *Dîwanî Qan'* (çwarm ed.). Sne: Dalaho.
- Bwar , N. (2005). *Redukewtin le Keltûrî Kurdîda* (Yekem ed.). Slêmanî: şvan.
- Cemal , B. (2012). *Slêmanî şare Geşawekem* (Duwem ed., Vol. I). Hewlêr: Aras.
- Cemal , H. (2013). *Derwazey şî'ri Nasîn* (Yekem ed.). Hewlêr.
- Cemal , M. M. (1984). *Dîwanî Hemdî* (Yekem ed.). Slêmanî: Serkewtin.
- Dlêr , C. A. (2013, Tîşrînî Duwem ). Jin û Komelge û Eqlî Xêlekî. *Leyla Qasm û Leyla Zana*(7),  
131-132.
- Dlêr , S. K. (2009). *Hendê ladanî Zmanî şî'ri Lay Sê şa'ri Nwêxwazî Kurd* (Yekem ed.). Dhok:  
Xanî.
- 'Ebas , S. S. (2008, Tîşrînî Yekem ). şwêneware Dêrînekanî Lurstan. *Raman*(137), 127-130.
- Edonîs Efsunkaî Wuşekan* (Yekem ed.). (2008). ('. 'abdulmutelîb, Trans.) Hewlêr: Mnare.
- 'Ebdulrezaq, B. (2006). *Xuêndneweyekî Tazey-Helbestî Kurdî* (Yekem ed.). Hewlêr: Aras.

- 'Ebdulwahîd , M. D. (2015). *Pragmatîk û Rewanbêjî* (Yekem ed.). Hewlêr.
- Efram , M. H. (2009). *Nexoşye Derunyekan* (Duwem ed.). Awêne.
- Ehmedî Mela. (2013). *Mehuy le nêwan Zahîrîyet û Batnîyrt û Serçawekanî 'îşq û Wêney Me'suqda* (Duwem ed.). Hewlêr: Rojhelat.
- Elaeddîn, S. (1395). *Mêjûy Edebî Kurdî* (Duwem ed.). Sne: Blawkirdnewey Kurdistan.
- Englis. (2008). *Jin le Komelgada* (Yekem ed.). (M. Mecîyd , Trans.) Slîmanî: Genc.
- Eresto. (2004). *Hunerî şî'rî (şî'ri nasî)*. (G. 'zez, Trans.) Slêmanî: Genc.
- Eta , Q. (2006). *Geran be Duway Manakanî şîrda* (Yekem ed.). Slêmanî: Hemdî.
- 'Ezîz , G. (1972 A). *Rewanbêjî le Edebî Kurdî da* (Vol. I).
- 'Ezîz , G. (1972 B). *Rewanbêjî le Edebî Kurdî da* (Yekem ed., Vol. II). Bxdad: Daralcahzi.
- Fazl , H. (n.d.). *Xoşewîstî Seretay Hemû ştêke û Kotayî Hemû ştêke*.
- Fehmî, K. (2003, Kanunî Yekem). Baba Tahîrî 'uryan Jyanî û Lêkdanewey çend çwarîneyek le şî'rekanî be Pêy Bîrû Ray Aynî Yarsan. *Newşefeq*(9), 27-42.
- Ferhad , P. (2006). *Rêbaze Edebîyekan* (Duwem ed.). Hewlêr: Mnare.
- Ferhad , P. (2009). *Kurd le Dîdî Rojhelatnasekanewe* (Sêyem ed.). Endêşe.
- Ferman , ' . M. (2008). *Xoşewîstî le Nêwan Xopersitî û Xonewîstîda* (Yekem ed.). Hewlêr: Wezaretî Roşnibîrî.
- Foad , H. A. (n.d.). *Afret le Honrawey Kurdîda*. Bxdad: Alcahiz.
- Gîwî , M. (1387). *Dîwanî Mistefa Begî Kurdî* (Yekem ed.).
- Hana , ş. (n.d.). *Le Blawkrawekanî Senterî Ragewandinî Jinan*.
- Hemey, M. (n.d.). *Dîwanî Bêkes*.
- îdrîs , ' . (2004, Tîşrînî Duwem ). (Lêkçuwandin) le Edebî Kurdîda. *Raman*(90), 31-37.
- îdrîs , ' . (2004, Tîşrînî Duwem ). (Lêkçuwandin) le Edebî Kurdîda. *Raman*(90), 31-37.
- îdrîs , ' . (2014). *Edebî Millî û Folklorîy* (Vol. I). Hewlêr: Hacî Haşm.
- îdrîs , ' . M. (2011). *Layane Rewanbêjîyekan le şî'rî Klasîkî Kurdîda le Nmuney Hemdî û Hacî Qadrî Koyî*. Hewlêr: Hacî Haşm.
- îdrîs , ' . M. (2006). *Qonaxî Pêş Romansîzmî şî'rî* (Yekem ed.). Hewlêr: Berêweberayetî çapxaney Roşnibîrî (1851-1921).
- îdward , S. (2006). *Nîşanekanî Roşnibîrî* (Yekem ed.). (R. K. Dawd, Trans.) Hewlêr: Mnare.
- îwsif , H. (2006). *Qurbanyekanî Xoşewîstî* (Yekem ed.). (Lîjneyek, Trans.) Peywend.
- 'îzedîn , M. R. (2010). *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî* (Sêyem ed.). Aras.
- Kamil , H. ' . (1983). *Rexnesazî Mêjû û Peyrewî Kirdn*. Bexdad: Korî Zanyarî 'êraq.

- Kelsum , ' . P. (2011, Azar). *Drewşanewey le Dûbeytîyekanî Baba Tahîrda*. *Ayinde*(95), 80-86.
- Kemal, M. (2003). *Edebyatî Klasîk û Nwêxwazî Kurdî*. Jîn.
- Kerwan , ' . X. (2012). *Beşêk le Dîwanî Salm* (Yekem ed.). çwarçra.
- Klawdîws , C. R. (2012). *Geştnameî Rîç bo Kurdistan* (Yekem ed., Vol. I). (H. Hemed , Trans.) şvan.
- Knîr, `., & `Zîz, H. (n.d.). *pêgey Jin le Komelgey Kurdewarîda*. Tewar.
- Komelê Nuser. (2004). *Xeyal û Roh çend têrwanînêk bo şî'ri Kurdî*. Slêmanî: Serdem.
- Komelêk Nuser. (1990). *Dîwanî Pîremêrd* (Vol. I). Bexda.
- Komelêk Nuser. (1990). *Dîwanî Pîremîrd* (Vol. I). Bexda.
- Kurdistan , M. (1999). *Jinî Kurd be Stem Dewre Drawe* (Yekem ed.). Hewlêr: Wezaretî Roşnibîrî.
- Kwam , M. (2007). *Xemokî bûn*. (E. M. Berzan, Trans.) Helebcey şehîd: Pîremêrd.
- Lêjneyek le Wezaretî Perwerde. (2014). *Zman û Edebî Kurdî Polî Deyemî Amadeyî* (Heştem ed.).
- Leyla , ş. (2011). *Amajekanî Xoşewîstî û Xonzîkirdnewe* (Yekem ed.). (A. Muna , Trans.) Genc.
- 'Alî , M. A. (n.d.). *Jyanî Emîrî Bawerdaran Xelîfey çwarem 'elî Kurî Ebutalîb Xwalêy Razî Bêt*. (T. A. 'umer , Trans.)
- Loranis , P. (2008). *şî'ri çîye* (Yekem ed.). (X. Ebu Bekir , Trans.) Pîremêrd.
- Loranis , P. (2008). *şî'ri çîye* (Yekem ed.). (X. Ebubekir , Trans.) Pîremêrd.
- Luqman , R. (2009). *Bnemakanî Modêrne le şî'rekanî şêrko Bêkesda* (Yekem ed.). Slêmanî: Serdem.
- Luys , W. (2015). *Xemokî* (Yekem ed.). (F. N. Kemal , Trans.) Hewlêr: çwarçra.
- Mamosta Hejar. (2014). *Dîwanî Melay Cezîrî*. Sne: Pexşangay Panîz.
- Marf , X. (2010 C). *Mêjûy Edebî Kurdî* (Duwem ed., Vol. III). Hewlêr: Aras.
- Marf , X. (2010 E). *Mêjûy Edebî Kurdî* (duwem ed., Vol. V). Hewlêr: Aras.
- Marf , X. (2010 F). *Mêjûy Edebî Kurdî* (Duwem ed., Vol. VI). Hewlêr: Aras.
- Marf , X. (1984). *Le Babet Mêjûy Edebî Kurdîyewe*. Bexda: Aluesese Al'raqye Ilid'aye û Altba'e.
- Marf , x. (2010 A). *Mêjûy Edebî Kurdî* (Duwam ed., Vol. I). Hewlêr: Aras.
- Marf , X. (2010 B). *Mêjûy Edebî Kurdî* (Duwem ed., Vol. II). Hewlêr: Aras.

- Marf, X. (2010 D). *Mêjûy Edebî Kurdî* (Duwem ed., Vol. IV). Hewlîr: Aras.
- Mehabad, Q. (2002). *Azad Kirdnî Mêjû* (Yekem ed.). Slêmanî: Serdem.
- Mela 'bdalkirîmî , M. (1386). *Dîwanî Mewlewî* (çwarem ed.). Blawkirdnewey Kurdistan.
- Mela 'bdalkirîmî , M. (1389). *Dîwanî Mehuy* (şeşem ed.). Sne: Blawkirdnewey Kurdistan.
- Mela 'ebdulkerîmî , M. (1391). *Dîwanî Nalî* (Heştam ed.). Sne: Blawkirdnewey Kurdistan.
- Mela 'ebdulkerîmî , M. (1391). *Dîwanî Nalî* (Heştam ed.). Sne: Blawkirdnewey Kurdistan.
- Mela 'ebdulkerîmî , M. (2015 A). *Dîwanî Salm* (Yekem ed.). Slêmanî: Binkey Jîn.
- Mela 'ebdulkerîmî , M. (2015 B). *Dîwanî Salm* (Vol. II ). Slêmanî: Binkey Jîn.
- Mhemd , ' . î. (2012). *Pêkhatay Zmanî şî'rî Leruwangey Rexney Edebîy Nwêwe* (Yekem ed.).  
Hewlêr: Mukiryani.
- Mhemed , H. (1998). *Rawe Gzîng*. Hewlêr: Wezaretî Roşibîrî.
- Mhemed , M. (2010 A). *Dîwanî Kurdî* (Yekem ed., Vol. I). Hewlêr: Aras.
- Mhemed , M. (2010 B). *Dîwanî Kurdî* (Yekem ed.). Hewlêr: Aras.
- Mhemed , M. (2013, Temuz). *Mistefa Begê Kurdî. Rovar*.
- Mhemed , N. ' . (2009). *Ferhengî Dîwanî şa'îran Nalî \_ Salm \_ Kurdî* . Hewlêr: Aras.
- Mhmid , A., & Karduxî. (1392). *Dîwanî Seydî* (Pêncem ed.). Sne: Blawkirdnewey Kurdistan.
- Mhmid , K. (2006). *Geran be Dway şî'ri û Cyawazîda* .
- Mhmid , M. (2009). *Gencîney Folklorî Kurd* (Duwem ed.). Aras.
- Mhmid , R. A. (2012). *Yasay Jin û Mêrdayetî* (Duwem ed.). (H. Hawar, Trans.) Slêmanî:  
Genc.
- Mîr , B. (2009). *Nawdaranî Kurd*. (E. Ebdulxalq , Trans.) Hewlêr: Mnare.
- Muhemmed, S. N. (1390). *Dîwanî Wefayî* (Yekem ed.). Sne: Blawkirdnewey Kurdistan.
- Muhsîn , E. ' . (2008, Nîsan ). Rûnbêjî ; yan Rewanbêjî. *Raman*(131), 158-159.
- Mus'eb, E. (2012, Tîşrînî Yekem). Qutebxane Edebîyekan. *Raman*(185), 105-107.
- Nasr, C. (2004). *Xoşewîstî Qonaxekanî û Perepêdanî* (Yekem ed.). (A. Kemal , Trans.)  
Slêmanî: Genc.
- Naz , E. S. (2013, Tîşrînî Yekem ). Xurbed û Rengdanewey le şî'rekanî (Salm) da. *Rovar*(77),  
46-51.
- Naz , E. S. (2017). *Dengî ((Mistfa Begî Kurdî)) le şî'rî Klasîkî Kurdîda* (Yekem ed.). Genc.
- Naz, E. S. (2014). *Dengî Mistefa Begî Kurdî le şî'rî Klasîkî Kurdîda*. D.Têz, Zankoy Slêmanî,  
Kurdî .



- Nêçîrwan , C. (2016, Kanûnî Duwem ). Nef'î şa'îrêkî Trî Hawserdemî Nalî. *Raman*(224), 69-76.
- Newşîrwan , M. E. (2012). *Be Dem Rêgawe Gulçînîn* (Duwem ed., Vol. I). Bîrut: Aldar Alridye Il'lum Naşrun.
- Pexşan , S. H. (Hewlêr). *Remlîz le şî'rî Hawçerxî Kurdîy Kirmancîy Xwarû Kurdistan 1970-1991*. 2012: Hacî Haşm.
- Qumrî , S. ' . (1990). *Wesf le Berhemî Nalî û Salm û Kurdî da*. M. Têz, Selahedîn, kurdî.
- Razî . (n.d.). *Dîwanî Welî Dêwane*. Sne: Blawkirdnewey Kurdistan.
- Razî. (1979). *çwarînekanî Baba Tahîrî 'uryan* (Duwem ed.). Bexdad: Babil.
- Rêbîn , H. (2006, November). Jin û Çyawazî. *Rehend*(18-19), 105-120.
- Rêbîn , X. Q. (2007, Huzeýran). Bjarkirdnî Zmanî şî'rî Kurdî. *Raman*(121), 54-65.
- Rêbwar , S. (2004). *Le peywendîyewe bo Xoşewîstî* (Yekem ed.). Hewlêr: Wezaretî Perwerde.
- Rehîm , H. (2015, Zistan ). Hîkmetî Lêkolînewe û Werigêranî Nazm Hîkmet. *Awîn*(1), 232-257.
- Rewend , H. (2013, şubat). Berawridêk le Nêwan "Jin û Nîştîman" le Dû Honrawey Hêmin da. *Raman*(189), 90-93.
- Reza, S. (2006). *Qutabxane Edebîyekan* (Yekem ed.). ('. Hme Kerîm , Trans.) Wezaretî Perwerde.
- Runak , ` . (2011, Payz). Nhênayakanî Naxî Jin û Pyaw. *Tewar*(36), 75-83.
- Rûnak , F. (2003, November). Tak le Komelge Kurdîda. *Rehend*(14-15), 377-436.
- şaxewan , F. M. (2011, Eylul). Zmanî şî'rî Peşêw. *Raman*(172), 88-91.
- Sdîq , S. (1375 A). *Mêjuy Wêjey Kurdî* (Yekem ed., Vol. I). Bane: Antişarat Nacî.
- Sdîq , S. (1392). *Dîwanî Bêşaranî* (Duwem ed.). Sne: Blawkirdnewey Kurdistan.
- Sdîq, S. (1375 B). *Mêjuy Wêjey kurdî* (yekem ed., Vol. II). Bane: Antişarat Nacî.
- Sebah , R. (2013). *Sê Ktêb le Barey şî'REWE*. Slêmanî: Bînayî.
- Sebah , X. (1987). Mistefa Begî Kurdî î şa'îr û 'aşq. *Rojî Kurdistan*(50), 47-53.
- Serdar, H. M. (n.d.). *Dîwanî Hacî Qadrî Koyî* (yekem ed.). Sne: Blawkirdnewey Kurdistan.
- Serwer , K. (2005). *Eşq û Xoşewîstî le Nêwan Wehim û Waq`da*. Tewar.
- şêx 'ebdulumînî , M. (2007). *Keşkole şî'rêkî şî'rî Kurdî ((Goranî))* (Duwem ed.). Slêmanî: şvan.
- şêx Mhemedî , X. (2003). *Dîwanî şêx Rezay Talebanî* (Yekem ed.). (F. Kemal , Ed.) Slêmanî.

- Seyd Mistefa, M. Z. (1382). *Feqê û Feqêyetê Le Kurdistan* (Yekem ed.). Taran: Meharet.
- Seyîd Necmedîn, E. (2012). *Dîwanî Herîq*. Slêmanî: Bînayî.
- Sozan , M. (2002). *Jin û Geran be Dway Nasnameda*. Raz.
- Sozan, C. (n.d.). *Jin le Berdem Qeranekanda*. Serdem.
- Tarq , K., & Aln`îmî . (2013). *Saykolojyay Jin û Pyaw* (Duwem ed.). (H. Silman , Trans.)  
Nawendî Roşnibîr.
- Tel'et , T. (2011). *çune Naw Sûrî Mana*. Slêmanî: Dîlan.
- Umêd , K. (1990). *Dîwanî Selam* (Duwem ed.). Bexdad: Alhwadis.
- Umêd , X. (2001). *Eşkî Bawan* (Yekem ed.). Hewlêr: Aras.
- 'Umer , ' . m. (n.d.). *Miştêle Bêjey 'arfî û Kirdey 'îrfanî Mehuy Xwanas û Mutesewîf Le  
Gwlşenî Terîqet û Gulbenî şerî'etda* (Yekem ed.). Slêmanî: Ezmir.
- 'Umer, M. (2013, Ab ). Dewrîjin le çend Deqêkî Edebî Zarekî û Nuysarîda. *Raman*(195),  
8286.
- 'Usman , ' . N. (2010). *Dîwanî Narî*. Slêmanî: Baban.
- 'Usman , D. (2009). *şî'rî Nawçey Mukiryay*. Slêmanî: Renc.
- Vladîmîr , M. (2002). *Mînorîskî û Kurd*. (S. Enwer , Trans.) Hewlêr: Wezaretî Perwerde.
- Zekerya , î. (2013). *Kêşey Xoşewîstî* (Yekem ed.). (T. Mhemed , Trans.) şvan.